

# the journal of mesopotamian studies



Periodical Journal for Kurdish, Arabic and Syriac Studies  
Vol. 2/1 Winter 2017

ISSN: 2147-6659



MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü



The Journal of  
**Mesopotamian Studies**

Periodical Journal for Kurdish, Arabic and Syriac Studies  
Vol. 2/1 Winter 2017

ISSN: 2147-6659

Mardin Artuklu Üniversitesi Adına:  
Owner on Behalf of Mardin Artuklu University:

Prof. Dr. Ahmet AĞIRAKÇA  
(Rektör)

Editör | Editor in Chief  
Doç. Dr. M. Nesim DORU (Enstitü Müdürü)

Sayı Editörü | Issue Editor  
Dr. Necat KESKİN

Editör Yardımcısı | Assistant Editor  
Ass. Mesut ARSLAN

Yazı İşleri Müdürü | Managing Editor  
Ali DEMİR (Enstitü Sekreteri)

Teknik Destek | Technical Support  
Uzm. Ferhat DEMİRALP

Yayım Kurulu | Editorial Board

Prof. Dr. Farouk İSMAİL, Doç. Dr. Rafik SULEIMAN, Dr. Kutlu AKALIN, Dr. Mustafa ASLAN, Dr. Shahab VALI, Dr. Necat KESKİN, Dr. Yılmaz ÖZDİL, Öğr. Gör. ZÜLKÜF ERGÜN, Öğr. Gör. İbrahim BİNGÖL, Öğr. Gör. Mehmet Tayfun

Danışma Kurulu | Advisory Board

Prof. Dr. Ahmet AĞIRAKÇA - Mardin Artuklu Ünv., Prof. Dr. Abdülhalim AYDIN - Fırat Ünv., Prof. Dr. Carina JAHANI Uppsala Ünv (İsviç), Prof. Dr. Gülsat AYGEN - Illinois Ünv. (ABD), Prof. Dr. İbrahim ÖZCOŞAR - Mardin Artuklu Ünv., Prof. Dr. Mesut ERGİN - Dicle Ünv., Prof. Dr. M. Faruk TOPRAK - Ankara Ünv., Prof. Dr. Vahab VALI (İran), Doç. Dr. Abdulwahab K. MOUSA - Zaho Ünv. (Irak), Doç. Dr. Abdurrahman ADAK - Mardin Artuklu Ünv., Doç. Dr. Hazem Said MONTASIR - El-Ezher Ünv. (Misir), Doç. Dr. Jean François PEROUSE - İst. Anad. Arş. Enst., Doç. Dr. M. Nesim DORU - Mardin Artuklu Ünv., Doç. Dr. M. Sait TOPRAK - Mardin Artuklu Ünv., Doç. Dr. Vahap ÖZPOLAT - Mardin Artuklu Ünv., Dr. Amr TAHER - Harvard Ünv. (ABD), Dr. Barzoo ELIASI - Oxford Ünv. (İngiltere), Dr. Kaveh DASTOOREH - Koye Ünv. (Irak), Dr. Khaled KHAYATI - London Ünv. (İngiltere), Dr. M. Zahir ERTEKİN - Bingöl Ünv., Dr. Nesim SÖNMEZ - Van Yüzüncü Yıl Ünv., Dr. Osman ASLANOĞLU - Dicle Ünv., Dr. Yavuz AYKAN - Boğaziçi Ünv., Dr. Michael CHYET - Washington Library (ABD). Dr. Hayrullah ACAR - Mardin Artuklu Ünv., Dr. Mustafa ÖZTÜRK - Mardin Artuklu Ünv.

Bu Sayının Hakemleri | Reviewers of This Issue

Prof. Dr. Farouk İSMAİL, Doç. Dr. Rafik SULEIMAN, Doç. Dr. Tahirhan AYDIN, Doç. Dr. M. Sait TOPRAK, Dr. Ahmet ABDÜLHADİOĞLU, Dr. Abdurrahim ÖZMEN, Dr. Ahmet GEMİ, Dr. Hayreddin KIZIL, Dr. M. Zahir ERTEKİN, Dr. Ayşe YILDIRIM, Dr. Canser KARDAŞ, Dr. Mesut KESKİN, Dr. Mustafa ÖZTÜRK, Dr. Necat KESKİN, Dr. Nurettin BELTEKİN, Dr. Kutlu AKALIN, Öğr. Gör. Hikmettin ATTI, Öğr. Gör. Ramazan PERTEV, Öğr. Gör. ZÜLKÜF ERGÜN, Öğr. Gör. İbrahim BİNGÖL, Öğr. Gör. Mehmet TAYFUN

Yönetim Yeri | Head Office

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Rektörlük Ek Binası Yerleşkesi Artuklu/Mardin  
Tlf: +90 482 212 98 84 20 Fax: +90 482 212 98 85. e-mail: [jms@artuklu.edu.tr](mailto:jms@artuklu.edu.tr) /mesopotamianstudies@gmail.com  
web: <http://dergipark.gov.tr/jms>

Baskı | Printing  
Dizgi ve Tasarım: Abdulsemet ÖZER  
Baskı: Zekisan Matbaa Kırkıtye

Baskı Yeri ve Tarihi | Publication Place and Date

Mehmet Akif Ersoy Cad. Et Balık Kurumu Yani Kaya-3 Apt. Altı Yenişehir - Diyarbakır  
Tel&Fax: 0412 226 71 79 - 228 38 20 - 228 38 21 - Şubat 2017

© Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bilimsel bir yayım organı olan Mesopotamian Studies Dergisi, uluslararası hakemli bir dergi olup altı ayda bir (Ağustos-Şubat) ve yılda iki sayı olarak yayımlanacaktır. Dergide Kürt, Arap ve Süryani kültürü, dili ve edebiyatı alanlarında akademik nitelik taşıyan ve Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanice dillerinde yazılacak olan bilimsel çalışmalara yer verilecektir. | The Journal of Mesopotamian Studies is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The Journal Mesopotamian Studies is a international peer-reviewed journal and will be published semi-anually (August - February). The scientific research on Kurdish, Arabic and Syriac culture, language and literature which written in Turkish, Kurdish, Arabic and Syriac languages will be published in The Journal of Mesopotamian Studies.

## İçindekiler | Contents

Editör'den	IV-VII	Editorial
<b>Makaleler   Articles</b>		
Necat KESKİN Pirsgirêkên Giştî yên Xebatê Folklorâ Kurdî û Çend Pêşniyaz	01-15	Necat KESKİN General Problems of Kurdish Folklore Studies and Some Suggestions
Ramazan PERTEV Celadet Alî Bedir-Xan: Danerê Termînolojiya (Zaravenasiya) Folklorâ Kurdî	17-31	Ramazan PERTEV Celadet Ali Bedir-Khan: The Founder of Kurdish Terminology of Folklor
Avdo KARATAŞ Folklor û Afirandina Çanda Nivîskî	33-52	Avdo KARATAŞ Folklore and Producing of Written Culture
Bünyamin DEMİR Motîfîn Sereke di Çîrokêñ Mîrzî Mihemed de	53-68	Bünyamin DEMİR Main Motifs in the Mirze Mihemed's Folktales
M. Şirin FİLİZ Xwendineke Berawirdî ya Problema Xerabiyê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Othelloya Shakespeare de	69-87	M. Şirin FİLİZ A Comparative Study on the Problem of Evil in Ehmedê Xanî's <i>Mem û Zîn</i> and Shakespeare's <i>Othello</i>
Mikail BÜLBÜL Peyvrêzî di Frazêñ Navdêrî de (Devoka Mêrdinê)	89-117	Mikail BÜLBÜL Word Order in Noun Phrases (Mardin's Accent)
Yakup AYKAÇ Bîbliyografyaya Tezêñ Beşêñ Kurdolojiyê yên li Tîrikyeyê (2011-2016)	119-132	Yakup AYKAÇ The Bibliography of the Theses in the Departments of Kurdology in Turkey (2011-2016)
Zafer DUYGU Doğu Kilisesi: Erken Yüzyılları Özeline Bir Değerlendirme	133-155	Zafer DUYGU A Survey in the Context of Its Early Centuries
Abdurrahim ÖZMEN Farklılıklar “Anlamak”	157-166	Abdurrahim ÖZMEN “Understanding” the Differences
نوبار رمضان محمد الشيخ أحمد بن الشيخ صالح وفكرة من خلال كتاب حلقة التناحر	167-180	Nûbar Remdan Mehemed Glimpse into Sheikh Ahmad bin Sheikh Saleh's Life and His Book “Illet Al-Tenahur”
<b>Çeviri   Translation</b>		
Pierre LECOQ Gramera Dîrokî ya Zimanê Kurdi Wer. Yılmaz ÖZDİL	183-190	Pierre LECOQ The Historical Grammer of Kurdish Language Trs. Yılmaz ÖZDİL
<b>Kitap Değerlendirmesi   Book Review</b>		
Seyid Qedrî Haşimî Dîwana Irfan Danasîn: Zülküf Ergün	193-197	Seyid Qedrî Haşimî Dîwana Irfan Review: Zülküf Ergün
Zülküf ERGÜN Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan Danasîn: Kenan Subaşı	198-201	Zülküf ERGÜN Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan Review: Kenan Subaşı

## Editör'den

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bünyesinde çıkan *The Journal Of Mesopotamian Studies* dergimizin 2. Sayısını sizinle paylaşmaktan büyük mutluluk duymaktayız. Olağanüstü hallerin yaşadığı günümüz ortamında, dil ve kültür alanında akademik çalışmaları sürdürmek, bu çalışmaları çok dilli-hakemli-akademik bir dergi kapsamında bir araya getirmek ayrıca memnuniyet vericidir.

Dergimizin ilk sayısı bizi gururlandıran bir ilgiye mazhar oldu. Umuyoruz ki bu sayımız da akademik çevrelerden, Kürdoloji, Süryaniyat ve Arap Dili ve Kültürü alanındaki çalışmalarla ilgilenen akademik çevrelerden, araştırmacılardan ve okuyuculardan yine aynı şekilde ilgi görür.

Enstitümüz bünyesinde Kürt Dili ve Kültürü, Arap Dili ve Kültürü ve Süryani Dili ve Kültürü Anabilim dalları yer almaktadır. En büyük çabamız ve temennimiz bu çeşitliliği dergi sayfalarında da gösterebilmek, görebilmektir.

Kuşkusuz bu durum farklı dil ve lehçelerden gelen makale sayısına da doğrudan bağlıdır. Bu konuda da gerek enstitü ve bölümlerin görece yeni oluşları, gerek bu dillerde yayınlanan akademik dergilerin azlığı ve gerekse söz konusu dillerde akademik makale yazımının Türkçeye nazaran görece yeni ve az olması başlıca sorunlar olarak ön plana çıkmaktadır.

Diğer yandan akademik bir dergiye makale gönderilmesi de birçok değişkene bağlı görünmektedir. Doçentlik için puanlamaya dahil olup olmadığı, indekslerde taranıp taranmadığı ya da hangi indekslerde tarandığı, akademik teşvik içine dahil olup olmadığı gibi sorular araştırmacının çalışmasını hangi dergiye göndereceği tercihini doğrudan etkilemektedir. Bu durum yayın hayatına yeni başlayan Kürtçe, Süryanice, Arapça gibi dillerde makale kabul eden akademik dergiler için ciddi bir sorun teşkil etmektedir.

Tüm bu olumsuzluklara karşılık dergimizin birinci sayısı büyük bir ilgiyle karşılaştı. Benzer ilgiyi makale gönderiminde de görmek bizi memnun etmektedir. İlk sayıda olduğu gibi bu sayıda da Kürtçenin Kurmancî lehçesi ile kaleme alınan makaleler çoğunlukta. Önümüzdeki sayılarda hem Kürtçenin diğer lehçeleri, hem Arapça ve hem Süryanice kaleme alınan bilimsel çalışmaları görmeyi umuyoruz.

Kürt folklor çalışmaları alanıyla ilgili makalelerin çoğunluk arz ettiği dergimizin bu sayısında on makale, bir çeviri ve iki kitap tanıtımı yer almaktadır. Makalelerden iki tanesi Türkçe, yedi tanesi Kürtçenin Kurmancî lehçesi, bir tanesi de Arapça ile kaleme alınmıştır.

Necat Keskin'in *Pirsgirêkên Giştî yên Xebatê Folklorâ Kurdî û Çend Pêşniyaz* isimli çalışması Kürt Folklor çalışmalarındaki genel sorunları ve bu sorumlara yönelik çözüm önerilerini ele almaktadır.

Ramazan Pertev'in *Celadet Ali Bedir-Xan: Danerê Termînolojiya (Zaravenasiya) Folklorâ Kurdî* isimli çalışması bugün kullanılan Kürtçe latin alfabetesi ve gramerinin mimarı Celadet Ali Bedirxan'ın Kürt Folkloru ile ilgili çalışmaları üzerinde durmaktadır.

Avdo Karataş'ın *Folklor û Afîrandîna Çanda Nivîskî* başlıklı çalışması ise Folklor ve Yazılı Kültür ilişkisini ele almaktadır. Folklorun yazılı kültürün yaratılmasındaki rolünü ele alan yazar, Kurt folklor çalışmalarının da Kurtler arasında bir yazılı kültürün oluşmasında önemli olabileceğini tartışmaktadır.

Bünyamin Demir'in *Motîfîn Sereke di Çîrokêñ Mîhemed* de başlığını taşıyan çalışması Mirze Mihemed'in ana karakter olduğu Kurt masallarını motif açısından analiz etmektedir.

M. Şirin Filiz'in *Xwendineke Berawirdî ya Problema Xerabiyê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Othelloya Shakespeare* de başlıklı çalışması, kaynağını folklor ve halk edebiyatından alan iki önemli eseri "kötülük" problemi üzerinden karşılaştırmaktadır. Mikail Bülbül'ün *Peyvrêzî di Frazêñ Navdêrî de (Devoka Mêrdînê)* isimli çalışması ise dil çalışmaları alanında olup, Kurtçenin Mardin ağzındaki kelime ve cümle oluşumları üzerine yoğunlaşmaktadır.

Yakup Aykaç *Bîbliyografyaya Tezêñ Beşêñ Kurdołojîyê yên li Tirkîyeyê (2011-2016)* başlıklı çalışmasında Türkiye'nin Mardin Artuklu, Bingöl, Muş Alpaslan, Dicle ve Van Yüzüncü Yıl üniversitelerinin Yaşayan Diller Enstitülerinde yapılmış olan yüksek lisans çalışmalarının bir bibliyografyasını sunmaktadır.

Zafer Duygu *Doğu Kilisesi: Erken Yüzyılları Özeline Bir Değerlendirme* isimli çalışmasında Doğu (Süryânî) Kilisesi'nin geçmişini erken yüzyıllar açısından ana hatlarıyla tasvir etmektedir.

Abdurrahim Özmen, Farklılıklar "Anlamak" başlıklı makalesi ile genel olarak Anadolu ve Mezopotamya'da özel olarak da Mardin ve Tur Abdin bölgesindeki kültürel çeşitliliği anlama üzerine kavramsal bir giriş sunmaktadır.

نُبَار رِمْدَان مِهِمَد - شَيْحُ أَحْمَدُ بْنُ الشَّيْخِ صَالِحٍ وَفَرِهٌ مِنْ خَلَالِ كِتَابِ عَلَةِ التَّنَاهِرِ - *Seyh Ahmed Bin Şeyh Salih ve İllet Et-Tenâhur Adlı Eseri* isimli çalışmasında Suriyeli Kurt Müzisyen Mihemed Şêxo'nun da birçok şiirini bestelemiş olduğu Şeyh Ahmed ve onun *İllet Et-Tenahür* isimli eseri üzerinde durmaktadır.

Dergimizin bu sayısında yer verdigimiz çeviri eser, Pierre Lecoq'un Kurtçenin tarihsel gramerini konu alan *La grammaire historique du kurde* adlı çalışmasının çevirisisidir. Makaleyi Fransızcadan Kurtçeye Yılmaz Özdiç çevirdi. Dergimizin bu sayısında, enstitümüz bünyesindeki öğretim elemanlarımıza ait iki kitap değerlendirmesi bulunmaktadır.

Son olarak, Enstitümüzün bütün çalışanlarının katkılarıyla hazırlanmış kollektif bir ürün olan *The Journal of Mesopotamian Studies* dergisinin kendi alanında ortaya çıkardığı heyecanı önumüzdeki dönemde de sürdüreceğini umuyor ve akademi dünyasının her türlü öneri ve eleştirilerine açık olduğumuzu, bu eleştiri ve önerilerini bizimle paylaşmalarından memnuniyet duyacağımızı bir kez daha belirtmek istiyoruz. Önümüzdeki sayıda buluşmak dileğimle.

Dr. Necat KESKİN  
Editör

## Editorial

We are pleased to present the 2<sup>nd</sup> issue of The Journal of Mesopotamian Studies which is published within the body of Mardin Artuklu University, The Institute of Living Languages in Turkey. It is also pleasing to continue academic studies in the field of language and culture in the setting of today's extraordinary situations and to bring these studies together in a multilingual peer-reviewed academic journal.

The first issue of our journal was so welcomed with great interest which make us proud. We hope that this issue will be equally appealed by academia, researchers, and readers alike who are interested in Kurdish Studies, Syriac Studies and Arabic Language and Culture.

Kurdish Language and Culture, Arabic Language and Culture and Assyrian Language and Culture branches are included within the body of our Institute. Our greatest effort and hope are to be able to show and see this diversity on the pages of our journal.

Undoubtedly, this situation is directly related to the number of articles from different languages and dialects. In this regard, both the newness of the institute and departments as well as scarcity of academic journals published in these languages and also the relatively newness and insufficiency of academic articles in these languages in comparison with Turkish are the main problems.

On the other hand, sending articles to an academic journal seems to depend on many variables. Whether it is included in the scorecard for associate professorship, whether it is scanned by the indexes or by which indexes it is scanned, whether it is included in the academic encouragement or not directly influences the choice of the researchers to send their works. This situation poses a serious problem for academic journals accepting articles in languages such as Kurdish, Syriac and Arabic, which have just started in the publication life.

In spite of all these negativities, the first issue of our journal was welcomed with great interest. We are pleased to see similar interest in article submission as well. As it was in the first issue, in this issue the majority of the articles are also written in Kurmanji dialect of Kurdish. We hope to see studies written both in other dialects of Kurdish and also in Arabic and Syriac.

In this issue of our journal, which includes a majority of articles on Kurdish folklore studies, there are ten articles, one translation and two book reviews. Two of the articles are in Turkish, seven are in Kurmanji dialect of Kurdish and one is in Arabic.

Necat Keskin's article titled *Pirsgirêkên Giştî yên Xebatê Folklora Kurdi û Çend Pêşniyaz* (General Problems of Kurdish Folklore Studies and Some Suggestions) deals with the general problems of Kurdish Folklore studies and suggests solutions to these problems.

Ramazan Pertev's work entitled *Celadet Ali Bedir-Xan: Danerê Termînolojiya (Zaravenasiya) Folklora Kurdi* (Celadet Ali Bedir-Khan: The Founder of Kurdish Terminology of Folklore) deals with Celadet Ali Bedir-Khan's studies of Kurdish Folklore who is the founder of modern Latin Kurdish alphabet and Kurdish Grammar.

Avdo Karataş's work entitled *Folklor û Afirandina Çanda Nivîskî* (Folklore and Producing Written Culture) deals with the relation of Folklore and Written Culture.

The researcher who handles the role of folklore in creating written culture, discusses that Kurdish Folklore studies might be important in forming a written culture among Kurds.

Bünyamin Demir's work entitled *Motifîn Sereke di Çirokêñ Mirze Mihemed de* (Main Motifs in the Mirze Mihemed's Folktales) analyzes Kurdish folktales in which Mirze Mihemed is the main character in terms of motifs.

M. Şirin Filiz in his work entitled *Xwendineke Berawirdî ya Problema Xerabiyê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Othelloya Shakespeare de* (A Comparative Study on The Problem of Evil in Ehmedê Xanî's Mem û Zîn and Shakespeare's Othello) compares two significant works which have sources in folklore and folk literature in terms of the problem of 'evil'.

Mikail Bülbül's work entitled *Peyvrêzî di Frazêñ Navdêrî de (Devoka Mêrdînê)* (Word Order in Noun Phrases (Mardin's Accent)) is a linguistic topic and deals with vocabulary and syntax of the Mardin accent of Kurdish.

Yakup Aykaç presents a bibliography of master theses (MA) which are written in the Living Language Institutes of Mardin Artuklu, Bingöl, Muş Alpaslan, Dicle and Van Yüzüncü Yıl Universities in his work entitled *Bibliyografyaya Tezén Beşen Kurdolojiyê yên li Tirkiyeyê (2011-2016)* (The Bibliography of the Theses in the Departments of Kurdology in Turkey (2011-2016)).

In his work entitled *Doğu Kilisesi: Erken Yüzyılları Özelinde Bir Değerlendirme* (The Church of the East: A Survey in the Context of Its Early Centuries), Zafer Duygu describes main aspects of East (Assyrian) Church in terms of early centuries.

In his article, titled *Farklılıklar “Anlamak”* (“Understanding” the Differences), Abdurrahim Özmen presents a conceptual introduction to understand cultural diversity in Anatolia and Mesopotamia in general, and Mardin and Tur Abdin region in particular.

In the work entitled -الشيخ أحمد بن الشيخ صالح وفkerه من خلal كتاب علة التناحر - (*Glimpse into Sheikh Ahmad bin Sheikh Saleh's Life and His Book “Illet Al-Tenahur*), Nûbar Remdan Mehemed deals with Sheikh Ahmad and his book entitled Illet Al-Tenahur whose many poems were also composed by Syrian Kurdish musician Mihemed Şêxo.

In this issue of our journal we present the translation of Pierre Lecoq's work entitled *La grammaire historique du kurde* which deals with historical grammar of Kurdish language. This article was translated from French to Kurdish by Yılmaz Özdil. There are also reviews of two books of lecturers of our institute.

Finally, we hope that the excitement that has been created by The Journal of Mesopotamian Studies, which is a collective product prepared by the contributions of all the staff of our Institute, will continue in the coming period and we want to specify once again that we are open to all kinds of suggestions and criticisms of the academia and that we would be pleased if they share their criticisms and suggestions with us.

Hope to see you in the coming issue.

Dr. Necat KESKİN  
Editor





Makaleler | Articles







## PIRGIRÊKÎN GIŞTÎ YÊN XEBATÊN FOLKLORA KURDÎ Û ÇEND PÊŞNIYAZ

Necat KESKİN \*

### KURTE

Xebatê folklorê xwedî dîrokeke dirêj in, lê "folk-lore" wek têgeh cara pêşî di sala 1846an de hat bikaranîn û di demeke kin de ji hêla civaka zanîstî hat pejirandin. Di demeke kin de ji bi rê û rîbaz û mijarêne xwe weke disiplineke serbixwe hat qebûlkirin. Ji ber têkiliya berbiçav bi pêvajoya netewbûnê re ji xebatê folklorê pêşî li Ewropayê û piştre ji li derveyî Ewropayê belav bûn. Ji bo birêvebirîna van xebatan komele û sazî hatin avakirin, kovar hatin weşandin. Di çarîka pêşî ya sedsala 20min de rewşenbirêne kurdan ji bal kişandin ser xebatê folklorê. Her çiqası wek têgeh bi nav nekiribin ji di kovar û nivîsene xwe de cih dan van xebatan. Ligel ku di ser mînakên pêşî de sed sal derbas bûye, iro hê ji xebatê folklorâ kurdi xwedî pirsgirêkên bingehîn in. Ev pirsgirêkên bingehîn wek "êñ dezgehî" û "êñ têgehî" dikarin werin binavkirin. Di vê gotarê de ev pirsgirêkên bingehîn û herweha hinek pêşniyaz ji bo çareseriya wan dê werin gotûbêjkirin.

**Bêjeyên sereke:** Folklor, xebatê folklorâ kurdi, pirsgirêk, pêşniyaz

### ABSTRACT

#### *"General Problems of Kurdish Folklore Studies and Some Suggestions"*

Folklore studies has a long history, but folk-lore as a term was first used in 1846 and shortly after it was used it got adopted by the scientific community. Then with its subjects and methods it was also accepted an independent discipline. Because of its clear relation with nation building, the folklore studies were spread first in Europe and then in the outside of the Europe. Associations, and institutions were found, journals were published and for organizing those studies. Kurdish intellectuals also drew attention to the folklore studies in the first quarter of the 20th century. Even though they did not name the term, they gave a wide coverage to those works in their writings. Although a hundred years had passed over the first examples of those works, Kurdish folklore studies still have basic problems which can be described as "institutional" and "conceptual" ones. In this article, those problems and also some suggestions for their solutions will be discussed.

**Key Words:** Folklore, Kurdish Folklore Studies, Problems, Suggestions

\* Alk. Doç., Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstituya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdi, [necatkeskin@gmail.com](mailto:necatkeskin@gmail.com)

## DESTPÊK

Derbarê xebatê folklorâ kurdî de eleqeyeke akademîk her ku diçe zêdetir dibe ku ev yek ji bo dahatûya vê qadê cihê kêfxweşiyê ye. Lê dîsa belkî ji hemû qadê din bêhtir ev qad xwedî pisgirêkên nebilêvkirî ye. Ji bo pêşdeçûna vê qadê divê pirsgirêkên sereke bi giştî werin diyarkirin da ku rê li ber xebatê dahatûyê veke. Di vê gotarê de jî armanca sereke, nîşankirina hinek ji van pirsgirêkên sereke ye. Berî ku em derbasî pirsgirêkan bibin, em ê bi kurtasî li ser folklor, destpêka xebatê folklorê rawestin û dûv re jî em ê pirsgirêkên qadê nîşan bidin. Di dawayî de jî li gor van pirsgirêkan dê amaje bi hinek pêşniyaz were kirin.

### 1. Folklor

Folklor zanîstek e ku bi rîbaz û teknîkên zanistî li ser çanda gelekî an jî heremekê lêkolînan dike, hêmanen çandê berhev dike, polîn dike, wan bi yên din re berawird dike, li ser wan şiroveyan pêşkêş dike û di dawî de jî digihije sentezekê (Örnek 2002: 15). Ji du peyvîn ji zimanê anglo-saksonî ku folk=gel û lore=zanîn pêk te. Li gor vê yekê ev term tê wateya ‘zanîna gel’ an jî ‘zanista gel’. Yanî tiştênu di nav gel de têz zanîn, ango pêzanîna ‘gel’, an jî “gelnasî”.

Her wekî tê zanîn dîroka peyva folklorê ber bi sedsala 18mîn ve diçe. Li gor gelek folklorناسان ev peyv cara yekemîn di sala 1846an de ji aliyê William John Thoms ve di kowara Athenaum de hatiye bikaranîn (Dorson 1972: 1). Thoms, di nivîsa xwe de peyva folklorê ji dêvla peyvîn ‘antîkîteye populer’, ‘wêjeya populer’ bi kar tîne. Lê berê ku Thoms vê peyvê wiha binav bike, di zimanê elmanî de peyva bi hêman wateyê ‘wolkskunde’ dihat bikaranîn. Loma, îdîayeke wiha jî heye ku Thoms dibe ku ev peyv ji zimanê Elmanî girtibe û dûre wergerandibe zimanê Ingilîzî û ji wir jî ketibe zimanê anglo-saksoniyan tevde (Gözaydin 1992: 1018-1021). Her du têgeh jî heta salê 1960î-1970yî di wateya lêgerîn û lêkolînen li ser edebiyata gelerî û tiştênu bi derdora wê ve girêdayî de dihat bikaranîn (Le Utley 2005).

Pêşketinê teknîkî û guhertinê di civakê de wek her tiştî bandora xwe li ser zanîstê û herweha li ser folklorê jî kiriye. Êdî folklor ne ew qad e ku tenê bi "edebiyata gelêrî" ve eleqedar dibe. Di vê navberê de nêrînên li ser "tradisyonâ devkî" jî têz guhertin. Mînak êdî "çîrokên modern" jî dikevin nava mijarênen vê qada berfireh (bnr. Arzu Öztürkmen 1998).

Lê careke din divê were bibîranîn ku folklor û xebatê folklorê ji destpêkê ve bêhtir li ser çîrok, destanan sekinîne ku mijarênen edebiyata gelerî ne. Ev yek wek ku gelekî hatiye gotin û nivîsandin bi rewşa civakî ya wê demê, hişmendiya netewetî û avakirina netewê ve girêdayî ye ku bingeha xwe ji ‘romantîzma elman’ digire.

Bingeħa avakirina folklorê jî wek zanistê̄n sosyolojî, antropolojî di sedsala 18mîn û 19mîn de hatiye danîn û ev yek jî bi serdema ‘ronakbûn’ê ve girêdayî ye. Herweha peywendiya wê bi Şoreşa Fransî jî heye ku hişmendiya netewebûnê li seranserê cîhanê belav dike. Bi vê pêvajoyê ve êdî entellektuel û rewşenbîrên ‘netewe’yêñ cuda ji bo avakirina ‘netewe’ya xwe li ‘ruh’ê veşartî ku bi piranî li gor wan dikare di nav ‘gel’ de were ditîn digerin. Ev ‘volkgeist’ (ruhê gel) a ku Herder behsa wê dike bi xwe ye.<sup>3</sup>

Ji aliyê din ve, xebatê̄n folklorê yêñ pêşî bi hişmendiya zanistî ya dema xwe ya sereke ku peresenparêzî (evolutionarism) an jî tekamûl tê gotin ve jî girêdayi ne. li gor vê yekê ku serkeşê wê James G. Frazer e, folklor jî tiştêñ kevnar ku di nav ‘gel’ de bi awayekî mane pêk te. Wan koka gelek orf, adet, bîr û bawerî yêñ di nav gel de dijîn di nav bîr û baweriyêñ ‘civakêñ hoveber’ de dişopandin. Ev yek herweha bi pêvajoya mêtinkariyê ve jî girêdayî xuya dike. Ji ber ku gava di vê serdeme de “civakêñ modern” rastî “yêñ din” hatin bi wan re ew hişmendî çêbû ku ew “civakêñ hoveber” halê yêñ “modern” ê kevintir e.

Herweha wek li jor jî hat gotin ev yek di heman demê de dibe bingeha fikra ku dibêje ‘ruh’ê netewe di nav gel de dikare were şopandin jî. Ev ‘ruh’ê ku di nav gel de jî bêhtir di mît, efsane, çîrok û cureyêñ din ên edebiyata gelerî de dihate dîtin, loma xebatêñ destpêkê ên folklorê hemû li ser cureyêñ edebiyata gelêri rawestiyane. Bi gotineke din ew ‘ruh’ê veşartî ên netewê di nav van keresteyen gelerî an jî edebiyata gelerî de ne. Serkêşê van xebatan jî her du birayêñ elman, Jacob û Wilhelm Grimm in ku di heman demê de di nav “romantîkêñ elman” an de têñ dîtin (Banarlı, 2007:19-20).

Nêrîna *romantîzma elman* bandoreke mezin li ser hemû xebatêñ folklorê yêñ destpêkê kiriye. Mînakêñ bi vî awayî gelek in. Ya herî ber çav û nêzîk jî xebatêñ folklorê li Tirkiyeyê ne. Di destpêkê da wekî elmanan entellektûlêñ tirk ên wekî Ziya Gökpalp, Fuad Köprülü û Rıza Tevfik ji bo avakirina neteweyekê bal kişandine ser xebatêñ folklorê û ev sahe bi tirkî wek *halkiyat* jî bi nav kirine (Örnek 2000). Ev ji bo xebatêñ folklorê û saheya folklorê li Tirkiyeyê û ji bo avakirina neteweya ‘tirk’ bûye bingehek (Öztürkmen 1998).<sup>4</sup>

## 2. Kurte-nêrînek li ser xebatêñ folklorâ kurdî

Destpêka xebatêñ folklorê yêñ kurdî jî ne dûrî heman raman û pêvajoyê ne. Her wekî ku hişmendiya netewebûnê belav bû û gelen di nav Dewleta Osmanî de wek yewanî û sirban serxwebûna xwe bi dest xistin û herweha gelên wek ereb û tirkân jî li ser nasnameyek ‘netewî’ rawestiyân, di nav kurdan de jî hişmendiyek ‘netewî’

<sup>3</sup> Ji bo kurte-nêrîneke ‘volkgeist’ a Herder bnr. Andrew Hamilton (2011). “Herder’s Theory of the Volksgeist”, <http://www.counter-currents.com/2011/05/herders-theory-of-the-volksgeist> 09.10.2015.

<sup>4</sup> Ji bo têkiliya neteweti û folklorê bnr. Arzu Öztürkmen (1998); ji bo ramontîzma Elman, neteweti û folklor jî bnr; William Wilson “Herder, Folklore, and Romantic Nationalism”; Lael Weisman “Herder, Folklore, and Modern Humanism”.

an jî wek ku Özoğlu (2009: 33) dibeje "xwehişyariyek kurdbûnê" hêdî hêdî derket holê. Her çiqasî, bêhtir jî ji ber bandora olî, ev hişmendî negihajtibe asteke ku welatekî serbixwe bixwazin jî dîsa di nav entelletkûlêñ kurdan de ev hişmendî wek nasnameyek, wek 'netewe'yeke cuda di nav 'ummet'a misilmanan de hat pêjirandin.

Ji bo derbirîna vê "nasname"yê jî xebatêñdez gehî hatin kirin. Avakirina komeleyan, çapkirina rojname û kovaran vê yeke nîşan dide. Xebatêñfolklorê jî beşeke girîng a van hewldanan bû. Her çiqasî xebatêñ Mela Mehmûdê Bazîdî wek destpêka xebatêñfolklorê were nîşankirin jî bi vê hişmendiya 'netewî' û damezrandina komeleyan û weşandina rojname û kovaran mijar û xebatêñtêkildarî 'folklor'ê zêdetir dibin (Yıldırım û yên din 2013). Dîsa jî xebatêñ Mela Mehmûdê Bazîdî ji hela naveroka xwe ve ji yên pişî xwe bêhtir 'folklor' ne. Ji ber ku wî ne tene di warê edebiyata gelêri de, lê di warê orf, adet û kevneşopiyen de jî hinek berhevkarî kirine. Wî ev karêñ xwe bi hevkarî û alikariya konsolosê Rusyayê yên Erziromê Alexandere Jaba (1803-1894) kiri ye, ji ber ku yek ji wezifeyen Alexandere Jaba jî ew bû ku derheqê çand û nasname ya kurdan de agahiyan berhev bike. Jaba, bi vî awayî gelek mela û seydayêñ kurd li dora xwe dane hevûdu, ji wan kurdî jî hîn bûye. Mela Mehmûdê Bazîdî di nav wan de bi xebat û zanîna xwe derketiye pêş. Jaba bi alikariya wan mela û zana, nemaze bi Mela Mehmûdê Bazîdî re gelek karê berhevkirinê dike. Wek ku yek ji wezifeya wî, bidestxistina agahî di derbarê kurdan, nasname û çanda wan û berhevkirina keresteyen çanda kurdan bû, wî keresteyen ku hatine berhevkirin ku di nav wan de destnivîs jî hene ji Akademiya Zanistî ya Petersburgê re şiyandise (Avcı 2010).<sup>5</sup>

Ji aliyê din ve dikare were gotin ku berbelavbûna xebatêñfolklorî bi hişmendiyeke 'netewî' bi damezrandina komele û weşandina kovar û rojnameyên kurdî re di destpêka sedsala 20min de dest pê dike. Êdî entelijensiyaya kurdan jî wekî hemdemêñ xwe, ji bo nasnameya xwe dixwest 'li gelê xwe vegeerin'. Ji ber ku wekî entelijensiyaya elman û tirkan wan jî êdî bawer dikir ku 'ruh'ê netewe 'di nav gel' bi xwe de ye û ji bo bidestxistina vî 'ruh'î diviyabû xebatan bikin. Dîsa wek mînakîn hemdemêñ xwe wan jî di vî warî de bêhtir xebatêñ xwe li ser berhevkirina çîrok, gotinêñ pêşîyan, destanêñ kurdan kirin ku heta wî wextî di nav gel de bi devkî hatîbûn veguhaztin. Bi vî awayî jî di warê folklorâ kurdî de, bêhtir jî edebiyata gelêri, gelek xebat hatin kirin ku îro jî mirov dikare ji wan sûd bigire. Lî, ligel van xebatêñgirîng li ser çanda kurdî, gava bi yên gelen din re tê berawirdkirin, îro tê dîtin ku hîna jî wek zanist 'folklor', û xebatêñfolklorî yên kurdî li gorî yên gelen din pêş neketiye. Her çiqasî demêñ dawî hewldanek hebe jî mirov dikare bibeje ku di nav kurdan de folklor û xebatêñfolklorî negihiştine asta

<sup>5</sup> Ji bo agahiyan berfireh derbarê Mela Mahmudê Bazîdî, têkiliya wî bi Alexandere Jaba re bnr: Ziya Avcı (2010), "Mela Mahmudê Bazîdî- (1797-1867)" di nav Mela Mahmudê Bazîdî, Adat û Rusûmatnameya Ekradiye (Amd. Ziya Avcı), Diyarbakır: Lîs, r. 11-42.

ku tê xwestin. An jî gava mirov van xebata bi yên dinyayê re berawird dike, li gor wana hîna di asta 'destpêk'ê de xuya dikin.

Sedema vê yekê ya sereke dikare wek "rewşa siyasî" ya kurdan û bêstatûbûna wan were nişankirin ku rê li ber gelek tiştên din jî digire. Kurd bi piranî di nav çar dewletên "netewe-dewlet" de di bin pergâlên wan ên çandî, aborî, civakî û siyasî de jiyana xwe didomînin. Tevî vê yekê înkarkirin, qedexekirin û zextên li ser çand û zimanê kurdî jî bandora xwe li "zanist" û xebatêñ kurdî û her weha xebatêñ folklorâ kurdî jî kiriye. Ji aliyê din ve di nav vê rewşa sedsalî de kurd ji aliyê çandî, civakî, siyasî hinekî ji hev dûr jî ketine ku ev "jihevdûrketin" bandorê li xebatêñ folklorê jî kiriye û ev yek hîn berdewam e.

Lê belê dîsa jî mirov dikare bibêje ku kurdan xebatêñ li ser "folklor'a xwe bi awayekî meşandine. Ji bilî kurdêñ li ser axa xwe yên di nav çar "netewe-dewlet" an de dijîn, kurdêñ Ermenîstanê jî, nemaze ji aliyê xebatêñ zanyarî ve, hejayî behskirinê ne. Her çiqasî hejmaran wan kêm be jî ji aliyê xebatêñ zanistî yên folklorê ve cihekî sereke digirin. Di vê pêşketinê de bandora kurdolojiya rusî jî mirov divê bilêv bike.<sup>6</sup>

Eger bi kurtasî û bi gelempêri mirov bibêje sedema sereke ya pêşneketina xebatêñ folklorê yên kurdî wek li jor jî hat gotin rewşa siyasî ya kurdan, bêstatûbûn û jihevdûrbûna wan e. Lê her çiqasî sedemeke sereke jî be ji bo pirsgirêkên xebatêñ folklorâ kurdî bi serê xwe nabe ravekar. Ji ber ku ligel vê bêstatûbûnê û astengêñ ku derdixê pêsiya lêkolînê di vî warî de, berdewamiyeke nisbî (rêjeyî-relative) ku bi riya sazî û dezgehê li ser çanda kurdan dixebeitin jî hebû/heye.<sup>7</sup>

Wek ku li jor jî hate gotin ji salêñ 1930î û vir de kurdêñ Ermenîstanê bi giştî li ser çandê û bi taybetî jî li ser folklorê xebat meşandine. Wek ku Omarkhali (2014:148) dibêje; "*Ermenîstan ji bo sehaya folklor û zimannasiya tetbiqî ji bo gelek projeyêñ lêkolînê bu navend*". Ji aliyê din ve li Tirkîyê piştî ew qas ïnakar, asîmîlasyon û zextên li ser kurdî, iro -her çiqasî armanca damezrandina wan, navê wan were niqaşkirin jî û hîna di destpêkê de bê jî- enstîtuyêñ fermî yên "zimanê zindî" ku li ser çand û zimanê kurdî dixebeitin û girêdayî dewletê hene. Ji bilî van, enstîtuyêñ ne girêdayî dewletê jî -wek Enstîtuya Kurdi ya Stenbol û Amedê- hene û dîsa li van deran xebatêñ li ser çand, ziman û folklorê jî tên kirin. Loma iro her çiqasî bêstatûbûn û "rewşa siyasî" ya kurdan ji bo "qelsbûn'a xebatêñ folklorâ kurdî sedema sereke be jî, ew pirsgirêkên xebatêñ folklorâ kurdî bi serê xwe rave nake û ji aliyêñ din ve ligel vê sedema sereke jî pirsgirêk dikarin werin çareserkirin.

<sup>6</sup> Ji bo diroka kurdolojiya rusî û cihê wê li nav xebatêñ kurdolojiyê de bnr. K. Omarkhali & N. Mossaki (2014). "A History of Russian Kurdishology".

<sup>7</sup> Ji bo kurte-diroka xebatêñ folklorâ kurdi û xebatêñ hatine kirin bnr. K. Yıldırım, M. Aslan, R. Pertev (2013). Ji Destpêkê Heta Niha Folklorâ Kurdi, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi yayınları.

## 2.1. Xebatên folklorâ kurdî û pirsgirêkên wê

Xebat û sehaya folklorâ kurdî gihajtiye wê asta ku êdî li ser "pirsgirêkên xwe" raweste û ji bo çareseriya wan gavan biavêje. Ji bo vê yekê jî berî her tişti divê bersivê van pirsan werin dayîn: pirsgirêkên xebat û sehaya folklorâ kurdî ci ne? û iro çawa dikarin werin çareserkirin? Ev pirsgirêk bi giştî wek 1) Pirsgirêkên teorîk û têgehî, 2) Pirsgirêkên dezgehî dikare were nişankirin.

### 2.1.1. Pirsgirêkên teorîk û têgehî

Di nav pirsgirêkên teorîk û têgehî de binavkirin û pênamekirina qadê, gengeşıya li ser "cure"yan û nedîyarbûna naverokê, "kategorîzasyon" an jî diyarkirina mijarêne sereke yên qadê, derbarê şert û mercen nû de tûnebûna têgeh û nêrînên nû, dikare were nişankirin. Ekici (2013: 42) ji bo xebatên folklorâ tirkî vê yekê weke "pirsgirêkên têgehî" bi nav dike û weha dibêje;

"Yek ji pirsgirêkên bingehîn ku lêkolînerên zanistiya gel [halk bilimi] a tirkî ji serî de rûbirûyê wê mane, pênamekirina vê qadê û bisînorbûna hilberîna pênameyên nû ne ku li gorî şert û mercen cihan û welat ku diguherin û pêş dikevin".

Heman gotin ji bo yên kurdî jî bi hesanî dikare were bilêvkirin. Berî her tişti pirsgirêka sereke, li gorî me, di binavkirinê de derdikeye meydanê. Ev yek herweha rewşa pênamekirin û naverokê jî bi xwe re tîne. Binavkirin, bi ser de pênamekirin ji bo sehayekе zanistî gelekî girîng e û ev yek bi xwe re naveroka xebatan jî diyar dike. Li gor pênameyê naverok û mijara sahê jî tê guhertin. İro jî gava mirov li xebatên folklorê yên di nav kurdan de dinere, tişta herî sereke ku mirov dibîne cudayıya pênamekirin û bikaranîna peyva 'folklor' û naveroka wê ye. Ev nayê wê wateyê ku haya rewşenbîrên kurdan ji 'folklore' tune ye, an jî folkornas û xebatên wan li ser folklorê tune ne, yan jî ev têgeh ji aliyêwan ve nehatiye bikaranîn. Wek li jor hate gotin xebatên folklorî ji zû de dest pê kirine û wek têgeh jî "folklor" hatiye bikaranîn, lê mesele ew e ku "konsensûs"ek li ser van xebatan, nemaze li ser binavkirina wan xuya naked. Hê di salên 1930î û 1940î de têgeha "folklor"ê ji hêla kurdan ve hatiye bikaranîn. Kurdên Qefqasê û nemaze jî ên li Ermenîstanê ev têgeh bikar anîne û di sala 1941ê de jî Celadet Bedirxan pênameya wê di "ferhengok" a kovara Hawarê de weha kiri ye;

"Folklor zanîn an zanistiya xelkê ye. Ev beje bi eslê xwe ingilîzî ye. Lî iro ketiye hemû zimanê dinyayê. Ji lewre me jî ew xistiye zimanê xwe. Ji xwe kurdên Qefqasê beriya me ev bêje xistine zimanê xwe û kitebek bi navê *Folklorâ Kurdmancî* belav kirine" (Bedirxan 1941/1998: 759).

Pirtûka ku Celadet Bedirxan behs dike "Folklorâ Kurmanca" ya ku Heciyê Cindî û Emînê Evdal bi hev re amade kirine û di 1936an de li Erîvanê weşandin e. Lî tê xuyakirin ku hem ev pirtûk û hem yên dûv vê re ku li Ermenîstan hatine weşandin

tenê li ser aliyekî folklorê dirawestin ku ew jî "edebiyata gelêri" ye û tenê beşek wek ji xebatê folklorê tê dîtin.

Ligel vê yekê iro hîn jî di binavkirinê de lihevhatinek tuneye. Xebatê li Ermenîstanê carinan wek "folklor", carinan jî wek "zargotin" (Celîl 2013) tê bikaranîn. Li Herêma Kurdistanê gelek caran ev xebat di bin navê "edebî folklorî" de an jî "edebiyata gelêri" de tê kirin.<sup>8</sup> Wekî din dîsa li Herêma Kurdistan têgeha "kelepor" jî tê bikaranîn ku ew jî di nav xwe de xebatê "folklor"ê dihewîne.<sup>9</sup> Li nav kurdê Tirkîyeyê têgeha folklorê, bi bandora zanîngehê Tirkîyeyê, tê bikaranîn, lê careke din naverok wek "edebiyata gelêri" ye. Herweha di besen kurdi yên enstituyê zindî de jî her çiqas hewldaneke bikaranîna têgeha "folklor"ê hebe jî dîsa bêhtir "edebiyata gelêri" tê bikaranîn.<sup>10</sup> An jî "folklor" ne wek "beş"eke serbixwe lê binbeşeke "edebiyata gelêri" tê dîtin.

Nebûna "konsensûs" a binavkirin û pênamekirinê bandorê li xebatê di warê folklorê de jî dike ku mirov dikare wek pirsgirêkeke din nîşan bike. Wek mînak eger folklor tenê wek "edebiyata gelêri" an jî "edebiyata devkî" were dîtin, ku iro jî bi piranî rewş weha ye, wî wextî ew besen din ên folklorê dê werin paşguhkirin. Ev yek hinekî bi "belavbûn" a zanyarê kurdan û herweha parçebûna kurdan, rewşa ziman ve jî girêdayî xuya dike.

Kurdê li "welatê cuda" dijîn û di nav disiplinê wan welatan de kar dikin an jî di nav pergala perwerdeya wan de digihjin bi awayê cuda folklorê bi nav dikin. Di vir de mînaka herî sereke careke din ya kurdê Ermenîstanê ye. Folklorenasên kurd ên Ermenîstanê ji ber ku di bin pergala zanista Sowyetê de bûn, û li Yekîtiya Sowyet jî folklor bêhtir wek "çanda devkî" dihat dîtin (bnr. Propp 1998) wan jî di nav vê pergâlê de "folklor" wek "edebiyata gelêri" bi nav kirin û xebatê xwe bi vî awayî meşandin.

Ev nêrîn li gorî wextê xwe dibê ku "rast" an jî "nêrîneke" derbasdar be, lê xuya ye ku careke din folklorenasên kurd ji "guherînê di civaka zanistî" de "bêxeber" tevdigeri(ya)n. Ji ber ku piranî piştî salê 1960î û 1970î nêrîna derbarê folklorê hat guhertin û êdî folklor ne tenê bi "edebiyata devkî" an jî "gelêri" mijûl dibû, lê mijarê din jî tevlî van xebatan dibûn. Di vî warî de nêrîna Richard M. Dorson (1972) ya ku folklorê û "folk-life-jiyana gelêri" di bin çar binbesen sereke dabeş dike wek mînak dikarê were dayîn. Ev binbesen ku Dorson (1972: 2-5) bi nav dike bi kurtasi ev in;

1- Edebiyata devkî/gelêri (Oral Literature)

2- Çanda madî

<sup>8</sup> Wek mînak navê xebata Şukriye Resul Ibrahim (1986), "Edebî Folklorî Kurdî" ye.

<sup>9</sup> Bnr. Enstituya Keleporî Kurdi /Kurdish Heritage Institute. <http://www.khi03.com/>

<sup>10</sup> Bnr. R. Pertev (edit.) (2015). Edebiyata Kurdi ya Gelêri, Stembol: Avesta. Di vir de "edebiyata gelêri" bi mebesta "folklor"ê hatiye bikaranîn. Heman rewş ji bo dersen lisans û lisansa bilind, nemaze ya bêtez, ji derbasdar e. Di bin navê dersa "edebiyata gelêri" de, folklor, dîrok û teoriyên folklorê jî tê dayîn. Ev yek jî xuya divê ku ji tradisyonâ tirkî were. Lê di dersen lisansa bilind ya bitez de bi navê "folklor"ê bi xwe ders hene ku héviya avakirina tradisyonike nû dide.

### 3- Adetên gel ên civakî

### 4- Bicihanîna hunerên gelêrî (performing folk art)

Lê xebatê folklorâ kurdî, ci bi navê "folklor",<sup>11</sup> ci bi navê "zargotin" an jî bi navê "edebiyata gelêrî" bin, bêhtir li ser mijarê "edebiyata gelêrî" disekinin ku tenê "beş"ek ji xebatê folklorê ye. Piraniyêne xebatan li ser çîrok, destan, hikaye, gotinêne peşîyan hwd. ku mijarêne edebiyata gelêrî ne.

Li vir divê were gotin ku li ser mijarêne edebiyata gelêrî bi xwe jî lihevhatinek tuneye. Binavkirin, pênamekirin û tesnîfa van mijaran jî ne birêkûpêk e. Wek mînak, destan ci ye? Çîrok ci ye? Çîrokêne gelêrî ci ne? Cudahî û hevmanendiyêne wan ci ne? Mît û efsane li ku disekinin? Bersiva van pîrsan tevde ne eşkere ye û li gor kesan dikare were guhertin. Yanî bi awayekî din dikare were gotin ku pîrsa "cure" (genre) jî di xebatê kurdî de zêde nehatiye niqaşkirin.<sup>12</sup>

Heman tişt tevî yên din ji bo xebatê folklorâ kurdî jî derbasdar e û bi xebatê teorîk ve jî girêdayî ne. Ji ber ku li ser van mijaran niqaşen berfereh nehatine kirin, mijarêne li ser têgehêne bingehîn ên folklorê, li ser teorî û dîroka wê jî derneketine meydanê. Ev yek jî ji bo geşedana xebatê folklorê yên kurdî û herweha weke sehayake zanistî ji bo geşedena "folklor"ê pirsgirêkeke girîng e.<sup>13</sup> Eger ev xebat nebin, niqaşen li ser têgehan, li ser "cure"yan, li ser guherîn û mijarêne nû ku derdikevin meydanê de jî nayêne kirin. Wek mînak, hîn di salêne 1960î de li ser pênameye "gel"(folk) ya di folklorê de niqaşen teorîk dihatin kirin.<sup>14</sup> Îro ligel van niqaşan, niqaşen derbarê teknolojî û folklorê de jî tên kirin ku bi serê xwe mijarêne nû yên folklorê ne.

8

Pirsgirêkeke din ya xebatê folklorâ kurdî ku dîsa bi van xebatê li jor hatine behskirin ve girêdayî ye, nediyarkirin an jî tûnebûna xebatê berfireh li ser binbes an jî mijarêne sereke yên folklorê ye. Li vir tiştâ ku em dixwazin bibêjin ji aliyekevi ve "kategorizasyon"a xebatê folklorê ye ku bi ingilîzî carinan wek "genre" (cure) an jî wek "category" (kategorî) û bi tirkî jî wek "kadro" (kom) tên binavkirin. Ev "kategorî" wek kom an jî beşen berfereh in ku gelek bendêne têkildarî hev di nav xwe de dihewînin (Kalayci 2016).

Ji bilî "kategorizekirin" a Dorson ku li jor hate behskirin, di çavkaniyeke din de jî "genre" (cure) yên folklorê bi vî awayî tê tesnîfkirin;

<sup>11</sup> Li gor fikrê me, peyva 'folklor' her çîqasî dikare wekî 'zanîna gel' an jî 'gelnasi' were wergerandin jî, ji ber ku ev peyv di akademî û weşanêne akademîk ku di bin serdestiya zimanê ingilizi de ne bi vî halfi yanî wek 'folklor' tê nasîn, kurd jî dikarin bi vî rengî bikarbînin.

<sup>12</sup> Li vir di xebat héjayı behskirinê ne. Yek jê teza doktora ya Michael L. Chyet (1991: 64-102) ya li ser "Mem û zîn" e û ya din jî ya Christin Allison (2007:103-152) e. Di her du xebatan de jî ji bo "cure" beşek serbixwe heye.

<sup>13</sup> Dikare were gotin ku ev yek ne tenê ji bo xebatê folklorê lê ji bo xebatê kurdî tev de derbasdar e û bi rewşa zimanê kurdi ve gelekî girêdayî ye. Xebatê têkildarî sehaba kurdolojî divê li ser vê mijarê jî rawestin.

<sup>14</sup> Alan Dundes (1965). The Study of Folklore, London: Prentice-Hall r. 1-3.; Di heman mijarê de gotara Richard M. Dorson (1970) ya bi navê 'Is There Folk in the City?' jî balkêş e. Her du gotar jî li ser wateya 'gel' di saheya zanista folklorê de dirawestin. Lê belê li vir mirov divê bibêje ku niqaşen li ser têgeh û naveroka folklorê hîna jî didomi; û ev jî li gor pêşketinê civakî, çandî, aborî û siyasi asayı ne. Lê disa jî wek sahe, beş, navê sahê 'konsensûs'ek he ye. Nebê di nav folklorasen de.

1-Çanda madî:

2-Muzîk

3-Vegotin

4-Hûnera devkî

5-Bawerî û Ol

6-Xwarin-vexwarin.<sup>15</sup>

Kalayci (2016)<sup>16</sup> behsa "kategorizekirin" a frensî û ingilîzan jî dike û herweha lîsteya dirêj ya folkornas û etnologê tirk Sedat Veyis Örnek jî dide.<sup>17</sup> Ji bilî ya Örnek, hinek tesnîfîn din yên folkora tirkî ji hêla Zanineha Stenbolê, lêkolîner Nail Tan, û hineke din jî hatibû kirin.<sup>18</sup>

Derbarê xebatêñ folklorâ kurdî, tesnîfa dîrokî û mijarêñ wê kêm tişt hatine gotin ku ew jî di xebata bi navê "Ji Destpêkê Heta Niha Folklorâ Kurdî" (Yıldırım, Pertev, Aslan 2013) de cih digirin. Di vê pirtûkê de xebatêñ folklorâ kurdî bi giştî wek "serdema klasîk" û "serdema modern" (r. 52) tê tesnîfîrin û mijarêñ sereke (kategorî) jî bi awayekî giştî weke ya Dorson di bin çar binbeşan de hatiye tesnîfîrin;

1) Edebiyata Gelêrî

2) Adet û Tore

3) Bîr û Baweriyêñ Gelêrî

4) Zanyariyêñ Gelêrî (r.143-144).

Bêguman ev xebat jî bo destpêkê ceribandineke baş e, lê pêwîstiya wê bi berfirehkîrinê re heye. Ew jî me ber bi pirsgirêkeke din ya xebatêñ folklorâ kurdî ve dibe ku ew jî wek "arşîvkîrin" dikare were binavkîrin. Di vir de jî em rastî pirsgirêkên "dezgehî" dibin.

9

### 2.1.2. Pirsgirêkên dezgehî

Di nav xebatêñ folklorâ kurdî de tişta wek pirsgirêk derdikeve pêsiya mirov ew e ku şopandina keresteyêñ folklorîk di nav dîrokê de (diakronîk) hinekî zehmet e. Ew jî bi arşîvan ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê berî van pirsgirêkan tevan belkî mirov behsa tûnebûna arşîvan bike baştı e. Ji ber ku ev pirsgirêka herî sereke ne tenê ya xebatêñ folklorê lê hemû xebatêñ têkildarî kurdî, kurdolojî yê. Ya rastî bi gelempêri dikare were gotin ku kurd ji aliye "arşîvkîrin"ê ve ne serkeftî ne ku raste rast girêdayî "hafizeya kolektîf"e. Di vir de divê mirov bîne ziman ku arşîv ji aliye kî

<sup>15</sup><http://www.library.illinois.edu/sshel/specialcollections/folklore/definition.html> 05.08.2016.

<sup>16</sup><http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/26.php> 05.08.2016.

<sup>17</sup> Sedat Veyis Örnek vê tesnîf a jî "kategorizekirin"ê di pirtûka xwe ya bi navê "Türk Halk Bilimi" de bi berferehî nişan dike. Bnr. Sedat Veyis Örnek (2002). Türk Halk Bilimi, Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı yayınları.

<sup>18</sup> Herweha di van pirtûkan de jî derbarê tesnîfa mijarêñ (kadro-genre-category) folklorâ tirkî hinek ceribandîn û mînak hene; Nail Tan (1985). Folklor (Halkbilim)-Genel Bilgiler-, İstanbul: Halk Kültürü yayınları; Folklor ve Etnografya Klavuzu (1949), İstanbul Üniversitesi İktisat Fakültesi İktisat Müze ve Arşivi, İstanbul: Berksoy matbaası; Sait Evliyacıoğlu & Şerif Baykurt (1988). Türk Halkbilimi, (2.bsk), Ankara.

weke Pierre Nora (2006: 9) tîne ziman yek ji "mekanên hafize"yê ye. Hafizeya gelekî, çandekî ji bo nifşen dahatû dipareze û bi vî awayî ji wê hafizeya kolektif her tim hişyar dihele.

Ji aliyên din ve arşîv ji bo xebatêñ zanistî ji her weha gelekî girîng in, nemaze arşîvên folklorê ku bi heman awayî li ser kevneşopiyêñ bi devkî ji nifşekê bo nifşen dahatû hatine veguhastin. Di vî warî de mînaka nêzîk ya xebatêñ folklorâ tirkî ne. Îro ji navendeke bi navê "Halk Kültürü Bilgi ve Belge Merkezi" (Navenda Belge û Zanînê Çanda Gel) di bin banê Wezareta Çandê de xebatêñ xwe didomîne. Bi hezaran qeydêñ ji her aliyên Anatolyayê di vê navêndê de cih digirin û li benda lêkolînan in. Ev ji aliyekî ve hafizeya xebatêñ folklorâ Anatolyayê ye.<sup>19</sup>

Çanda gel li ser kevneşopiyêñ bi devkî ye û bi vî awayî di nav nifşan de tê veguhestin û ji ber vê yekê ji her ku diçe winda dibe an ji diguhere. Eger mirov bixwaze berawirdinekê bike an ji guherînê fam bike divê li paşerojê, jiyana paşerojê ji binere. Ev yek ji bo folklorâ kurdî mijareke girîngtir e. Ji ber ku şer, pevçûn, pirsgirêkên siyasi gelek caran derî li ber karêñ bi vî rengî, yanî berhevkarî û arşîvkirin, digire, û di dawiyê de ji gelek tişt têñ ji bîrkirin an ji winda dibin. Şer, sirgûn, koçberî her tişti li pey xwe dihêle û rê nade careke din mirov lê vegere. Tenê li Tirkîyeyê di nav van cil salêñ dawî de kurd rûbirûyê şewitandina gundan, koçberiya bi girseyî bûn û di nava vê hengamê de gelek hêmanên folklorîk bêyî ku werin berhevkirin winda bûn an ji bîr bûn. Dikare were gotin ku kurdan ji aliye "naskirin"ê de gelek destkeftî bidest xistine, lê ji aliye "çand" a xwe ve ji gelek tiş winda kirine. Lê dîsa ji folklorasen kurd di vî warî de divê bi hişmendiya "sibe ji iro derengtir e" tev bigerin.

Bêguman, bi taybetî li Rusya û Ermenîstanê di warê xebatêñ kurdolojî û folkloa kurdî de arşîvên giranbiha hene ku yek ji wan ya Alexander Jaba bû û niha kopyayeke wê li Zanineha Mardin Artukluyê Enstituya Zimanê Zindî ye. Arşîva Berlînê ji hêjayî behskirinê ye. Herweha li Herêma Kurdistanê ji bi navê "Enstituya Keleporî" enstituyek heye û arşîva wê ji heye. Lê dîsa ji ev gelekî hindik in û hemû lêkolîner nikarin xwe bigihîjinin wan. Herweha arşîvên şexsî an ji malbatî ji, weke malbata Celîlan, hene ku ev ji bi awayekî divê têkevin nava civaka akademîk ku berê me dide pirsgirêkeke din.

Di qada xebatêñ folklorâ kurdî de pirsgirêkeke din dikare wek "kêmbûna saziyan" were binavkirin. Ev yek bi giştî wek "pirsgirêkên dezgehî" ji dikare were binavkirin. Her çiqasî navêndê çandê, enstitû û beşen, kurdolojî hebin ji navend, komele û saziyên raste rast bi berfirehî bi folklorê ve eleqedar in tunene, an ji kêm in. Di vî warî de hinek pêşniyaz hebin ji ev pêşniyaz hîna nehatine pêjiarandin, an ji bi ser neketine.<sup>20</sup> Folklor, weke gelek qadêñ zanistî yên civakî, qadeke weha ye ku

<sup>19</sup> Derbarê navendê, dîrok û geşedena wê bnr. Erol Evcin (2013). "Türk Halk Kültürü Araştırmaları İçin Önemli Bir Merkez: Halk Kültürü Bilgi ve Belge Merkezi", *Millî Folklor*, yıl.25, sayı.100, ss. 225-242. Herweha derbarê vê navendê bnr. [http://aregem.kulturturizm.gov.tr/TR\\_12689/halk-kulturubilgi-ve-belge-merkezi.html](http://aregem.kulturturizm.gov.tr/TR_12689/halk-kulturubilgi-ve-belge-merkezi.html) 03.08.2016.

<sup>20</sup> Ji bo mînakeke pêşniyare bnr. Necat Keskin (2015). "Navenda Lêkolînen Folklorâ Kurdan",

encax bi riya navend, komele, enstîtu û saziyan dikare pêş bikeve. Berhevkirin, arşîvkirin, tesnîfkirina hêmanê folklorik û di qada akademîk de bi riya weşandinê belavkirina wan bêyî "dezgeh"an gelekî zehmet e. Di vî warî de Komeleya Folklorâ Emerîkî (American Folklore Society) mînakeke girîng e. Di sala 1888an de ev komele ava dibe û di heman salê de jî kovara Folklorâ Emerîkî (Journal of American Folklore) dest bi weşanê dike ku îro di qada xwe de ya herî navdar û bibandor e.<sup>21</sup>

Îro ji bo qada xebatêñ folklorâ kurdi dikare were gotin ku nebûna kovarêñ akademîk ên folklorê û kêmbûna folklorasêñ perwerdekirî dîsa bi bêsazîbûn, an jî nebûna saziyêñ xweser ên folklorê ve gelêkî girêdayî ne.

### ENCAM

Di vê gotarê de li ser çend pirsgirekên xebatêñ folklorâ kurdi hate rawestin. Pirsgirêkên ne tenê xebatêñ folklorê, lê yên kurdolojî tevde bêguman bi "rewşa" siyasî ya kurdan û rewşa zimanê kurdi ve jî girêdayî ye. Lê dîsa jî, wek her qadeke serbixwe qada folklorâ kurdi jî xwedî pirsgirêkên xwemalî ye. Ev pirsgirêk di vê gotarê de wek sernav bi vî awayî hatin tesnîfkirin:

1-Pirsgirêkên teorîk û têgehî: Binavkirin û pênamekirina qadê û herweha naveroka xebatan, kategorizekirina mijarêñ sereke yên folklorê. Wekî din niqaşen li ser têgeh û nêrînêñ nû yên li ser rewşa civakî ku her daîm di nav guherînê de ye jî di nav pirsgirêkên teorîk de dikare were nirxandin. Ji aliyê din ve civak û çand di nav guherîneke berdewam de ye û li gorî şert û mercêñ civakî û çandî mijarêñ nû, pirsêñ nû û li ser çareseriya van pirsan û mijaran nêrînêñ nû, nêzikayiyêñ nû derdikevin meydanê. Weke qadeke zanistî, pêwîstiya folklorê jî bi nêrîn, nêzikayî û têgehîn nû heye ku li gorî rewşen derdikevin. Ev di nav pirsgirêkên "teorîk û têgehî" de dikarin werin gotin.

2- Pirsgirêkên dezgehî (institutional): Ev bi giştî pirsgirêkên têkildarî saziyan û sazkinî ye. Kêmbûna navend, enstîtu, saziyêñ xweser ku têkildarî xebatêñ folklorê ne. Bi riya navend, komele û saziyan civînêñ akademîk wek komxebat, sempozyûm û kongre dikarin werin lidarxistin û xebatêñ akademîk dikarin werin weşandin.

Ev her du xalêñ pirsgirêkan bi hevdu ve girêdayî ne û pêşketina di xalekê de dê derî li ber ya din jî veke. Niqaşen teorîk û li ser têgehan dê rê li ser niqaşen avakirina sazî û komeleyan vebike û herweha ew jî dê niqaşen pêşî berfirehtir bike.

Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan jî wek destpêk ev pêşniyaz dikarin werin kirin.

Ji aliyê dezgehî ve;

<http://necatkeskin.blogspot.com.tr/2015/05/navenda-lekolinen-folklorâ-kurdan.html> Nérîna Dawî: 06.08.2016  
<sup>21</sup> Ji bo agahiyêñ zêdetir derbarê komele û kovarê de bnr. <http://www.afsnet.org/?page=AboutAFS> ; <http://www.afsnet.org/?page=JAF> 06.08.2016

-Navendeke serbixwe ya xebatê folklorâ kurdî/Kurdistan divê were vekirin. Bêguman bi piştgiriya şaredariyan, zaningehan, an jî Herêma Kurdistanê ev yek dikare were kirin. Îro derfetêne kurdan ji bo vê yekê heye. Şaredarî dikarin bi hesanî "navendêne lêkolinan" vekin û di wan de kesen perwerdeya vê qadê dîtibin bi cih bikin. Wek mînak, Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê îro bi navê "Folklorâ Kûrdan" kovarekê derdixe û piştgiriye dide van xebatan.<sup>22</sup> Lê kemasiya sereke ew e ku bêhtir ev kar bi awayekî amator dimeşin. Sedema wê jî têkiliyên lawaz ên di navbera sazî û akademisyan de ye. Divê ev têkilî xurttir û baştır bibin. Ji aliyê din ve, kurdêne di nav akademijyan bixwe jî dikarin komele an jî navendêne bi vî rengî vekin.

-Beşen serbixwe bi navê "folklor" an jî "folklor û etnografya" (ji bo ku berfirehtir be) divê werin vekirin ku ew yek niha tenê li zanîngehêne Herêma Kurdistanê dikarin werin vekirin. Akademisyenêne kurd ên derveyî Herêmê divê vê yekê teşwîq bikin.

-Dîsa enstîtuyêne xweser ên "xebatê folklor"ê an "folklor û etnografya" û an jî bi giştî "xebatê çandî" werin vekirin; Qet nebe di bin enstîtuyêne heyî de ev beş, lê dîsa bi têkiliyên akademisyan re, divê werin vekirin.

- Rojek berî rojekê projeyêne berfireh ên "berhevkirin"ê divê werin birêvebirin. Kesen ku di van projeyan de bixebeitin divê perwerdekirî bin.

-Di nava van saziyan de, bi taybetî jî li Herêma Kurdistanê, divê navêndêne arşivê werin vekirin û keresteyêne ku hatine berhevkirin di van arşîvan de werin tomarkirin. Dijitalizekirina van keresteyan dê derfetêne xebatêne berfirehtir bide folklorenasene kurdan.

-Eger derfet hebe ev xebat tevî hemû diyalektêne kurdî û tevî ingilîziya wan werin weşandin dê rî hem li ber naskirina xebatêne folklorâ kurdî veke û hem jî xebatêne derfetêne xebatêne berawirdî zêdetir bike.

- Kovarêne akademik ên folklorê divê bi kurdî werin çapkiran. Ev yek dê bibe derfeteke baş ji bo kesen ku dixwazin gotarêne xwe bi awayekî akademik biweşînin. Ji aliyê teorîk û têgehî ve;

-Pêşniyaza pêşî dê li ser binavkirin, pênasekirin û naverokê be. Her çiqasî di kurdi de "zargotin", "kelepor", "edebî folklor" tê bikaranîn; an jî wek têgeh bo kurdi "zanîna gel", "zanista gel", "gelnasi" dikare were wergerandin jî, ji ber ku li civaka akademiya cihanê wek "folklor" tê zanîn û konsensûsek li ser heye, di kurdi de jî ev têgeh dikare were bikaranîn. Ev têgeh divê di wateyeke berfireh de were bikaranîn ku amaje bi hemû aliyêne "çanda gelêri" bike. We gave dê naverok jî berfirehtir bibe.

<sup>22</sup> Wexta nivîsandina vê gotarê rewşa siyasî wek iro ne tevlîhev bû, ji ber vê yekê wek sazî ev mînak hatiye dayin. Lê iro rewşa siyasi hinekî guheriye û ew derfetêne şaredariyan iro ne wek berê ne. Ji dêvla wan saziyên din an jî komeleyêne serbixwe dikarin van karan bikin.

- Ji bo binavkirin, pênase û naverokê xebatêñ herî alîkar dê xebatêñ biyaniya bin û ji ber vê yekê jî divê xebatêñ sereke yêñ folklorê ji zimanêñ din bo kurdî werin wergerandin. Bi vî awayî ji aliyekî ve dê xwendekarêñ kurdî dîrok, teorî, nêrîn û têgehêñ sereke yêñ folklorê nas bikin û ji aliyê din ve jî wergerêñ bi vî awayî dê ziman jî pêş bixin.

- Dîsa bi alikariya xebatêñ folklorê yêñ cîhanê, derbarê mijarêñ sereke (kategorî-kadro-genre) yêñ folkora kurdî de niqaş û xebatêñ berfirehtir, divê werin kirin. Ji bo vê yekê kongre, sempozyûm û komxebat dikarin werin lidarxistin. Di destpêkê lidarxistina komxebatekê dê rî li ber gelek çalakiyêñ din ên akademîk veke.<sup>23</sup>

- Li gor şert û mercêñ ku di nav guherînê de ne, nêrîn, nêzikayî û têgehêñ nû divê werin naskirin û li rewşa kurdan werin tetbiqkirin.

Dibe ku hinek pirsgirêk û pêşniyazêñ din jî hebin. Lewra bi saya tespîtkirina pirsgirêkan û pêşniyazêñ çareseriyê dê ev qad bi pêş keve. Lê wek encam dikare were gotin ku ligel pirsgirêkêñ xebatêñ folkora kurdî, eger ev pêşniyazêñ ku hatine kirin werin pejirandin dê ji aliyekî ve ji bo destpêkê "zimanekî" hevpar ê akademîk were avakirin, hem kar û xebatêñ hevpar dê werin kirin û hem jî rî li ber akademîsyenêñ vê qadê were vekirin.

## ÇAVKANÎ

- Allison, Christine (2007). *Yezidi Sözlü Kültürü*, (wer. F. Adsay), İstanbul: Avesta.
- Avcı, Ziya (2010). "Mela Mahmudê Bazidî- (1797-1867)", di nav Mela Mahmudê Bazidî, Adat û Rusûmatnameya Ekradiye (amd. Ziya Avcı), Diyarbakır: Lîs, r. 11-42.
- Banarlı, Nihad Sami (2007). *Edebiyat Sohbetleri*, (4. baskı), İstanbul: Kubbealtı
- Bedirxan, Celadet (1941). "Ferhengok", Hawar sal.9, hj.30, r. 14 [Hawar (1998) Cild 2 Hejmar 24 -57 (1934-1943), Stockholm: Nûdem, r.759]
- Celîl, Ordîxanê & Celîl, Celîlê (2013). *Zargotina Kurda I-II*, (çap. 3mîn), Amed: Aram.
- Chyet, Michael L. (1991). "And a thombush sprang up between them": Studies on "Mem û Zin", a Kurdish romance. (Volumes I and II) (Teza Doktora ya neçapkirî), University of California, Berkeley.
- Evcin, Erol (2013). "Türk Halk Kültürü Araştırmaları İçin Önemli Bir Merkez: Halk Kültürü Bilgi ve Belge Merkezi", *Millî Folklor*, yıl.25, sayı.100, ss. 225-242.
- Dorson, Richard M. (1970). "Is There a Folk in the City?", *The Journal of American Folklore*, Vol. 83, No. 328, The Urban Experience and Folk Tradition (Apr. - Jun., 1970), pp. 185-216.

<sup>23</sup> Di 3-4ê meha berfanbarê ya 2016an, li Amedê ji hêla Weqfa Mezopotamya "komxebata folklorê" hat lidarxistin. Hinek ji pirsgirêkêñ di vê gotarê de hatine alikar di wê komxebatê de hatin niqaskirin. Lê ji bo encamêñ ji komxebatê derkevin û bêñ nirxandin hinek wext divê. Hêvî ew e ku ev gotar jî bibe alikarê van niqaşan, nêrîneke din bide wan.

- Dorson, Richard M. (1972). "Introduction", Folklore and Folklife- An Introduction (edt. Richard M. Dorson), Chicago & London: The University of Chicago Press, r. 1-50.
- Dundes, Alan (1965). The Study of Folklore, London: Prentice-Hall
- Ekici, Metin (2013). "100. yılında Türk Halk Bilimi ve Türkiye Kültür Politikalarına Eleştirel Bir Bakış", Milli Folklor Dergisi, S.99, ss. 41-50.
- Folklor ve Etnografa Klavuzu (1949), İstanbul Üniversitesi İktisat Fakültesi İktisat Müze ve Arşivi, İstanbul: Berksoy matbaası
- Gözaydin, Nevzat (1992). "Yine Folklor Üzerine", Türk Dili, S.: 486, Haziran, s. 1018-1021.
- Hamilton, Andrew (2011). "Herder's Theory of the Volksgeist",  
[http://www.counter-currents.com/2011/05/herders-theory-of-the-volksgeist  
09.10.2015](http://www.counter-currents.com/2011/05/herders-theory-of-the-volksgeist-09.10.2015).
- Ibrahim, Şukriye Resul (1987). Edebî Folklorî Kurdi, Hewlêr: Zankoyê Salahaddin.
- Kalayci, Bircan (2016). "Halk Bilimi/Folklor-Tarihsel Süreç",  
<http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/26.php>. 05.08.2016.
- Keskin, Necat (2015). "Navenda Lêkolînê Folklora Kurdan",  
<http://necatkeskin.blogspot.com.tr/2015/05/navenda-lekolinen-folklora-kurdan.html>. Nêrîna Dawî: 06.08.2016
- Le Utley, Francis (2005). "Folklorun Tanımı", (wer. T. S. Özkan), Milli Folklor, 2005, Yıl, 17, Sayı: 65, ss. 130-136.
- Nora, Pierre (2006). Hafiza Mekânları (wer. M. E. Özcan), Ankara: Dost
- Omarkhalî, Khanna & Mossaki, N. (2014). "A History of Russian Kurdology: With a Brief Literature Overview", di nav Hennerbichler, Ferdinand et al. (eds.), Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien. Die Geschichte von Kurdischen Studien und Kurdologie. Nationale Methodologien und transnationale Verflechtungen, Österreichische Gesellschaft zur Förderung der Kurdologie, Wiener Verlag für Sozialforschung, Wien, 2014, 2015, pp. 140-177.
- Örnek, Sedat Veyis (2000). Türk Halkbilimi, (2.bsk), Ankara: Kültür Bakanlığı
- Özoğlu, Hakan (2009). Osmanlı Devleti ve Kürt Milliyetçiliği (wer. Nilay Ö. Gündoğan-Azat Z. Gündoğan), 2.bsk, İstanbul: Kitap yayinevi
- Öztürkmen, Arzu (1998). Türkiye'de Folklor ve Milliyetçilik, İstanbul: İletişim.
- Pertev, Ramazan (edt.) (2015). Edebiyata Kurdi ya Gelêri-Dîrok, Teorî, Rêbaz, Literatur, Berawerdî-I, Stembol: Avesta
- Propp, Vladimir (1998). Folklor- Teori ve Tarih, (wer. N. Hasgül & T. Tanyel), İstanbul: Avesta.
- Tan, Nail (1985). Folklor (Halkbilim)-Genel Bilgiler-, İstanbul: Halk Kültürü yayınları.
- Evliyacıoğlu, Sait & Baykurt, Şerif (1988). Türk Halkbilimi, (2.bsk), Ankara.
- Weisman, Lael (1991). "Herder, Folklore, and Modern Humanism", Folklore

Forum 24:1, pp. 51-65.

- Wilson, William A. (1973). "Herder, Folklore, and Romantic Nationalism", The Journal of Popular Culture, Volume 6, Issue 4 (Spring 1973), pp. 819-835.
- Yıldırım, K; Pertev, R; Aslan, M (2013). Ji Destpêke Heta Niha Folklorâ Kurdî, Mardin: Mardin Artuklu Üniveritesi yayinlari.

**Malper:**

- <http://aregem.kulturturizm.gov.tr/TR,12689/halk-kulturubilgi-ve-belge-merkezi.html> nêrîna dawî: 03.08.2016
- <http://www.library.illinois.edu/sshel/specialcollections/folklore/definition.html> nêrîna dawî: 05.08.2016
- <http://www.afsnet.org/?page=AboutAFS>; <http://www.afsnet.org/?page=JAF> nêrîna dawî: 06.08.2016
- <http://www.khi03.com/> nêrîna dawî: 18.01.2017





## CELADET ALÎ BEDIR-XAN: DANERÊ TERMÎNOLOJIYA (ZARAVENASIYA) FOLKLORA KURDÎ

Ramazan PERTEV\*

### KURTE

Ev gotar, xebatê Celadet Alî Bedir-Xan dinirxîne yên ku naverokên wan pabendî keresteyên folklorâ kurdî ne. Rewşenbirê kurd Celadet Alî Bedir-Xan pêşengê nifşê Hawarê (1932-1946) ye ku ligel xebatê xwe yên din, wî bi rîya vekolîna keresteyên folklorê amaje bi geşekirin û xurtkirina nasnameyeke kurdî ya neteweyî kirîye. Ji aliyê teşe û naverokê ve maweya xebatê rewşenbirê nifşê Hawarê di dîroka vekolînen folklorâ kurdî de serdemêke giring e. Taybetmendiya vê serdemê ew e ku di van xebat û vekolînan de bi awayekî rasterast zaraveya "folklor"ê hatîye bikaranîn û folklor weku qadeke serbixwe hatîye qebûlkirin. Hemû nivîşen rewşenbirê vê serdemê bi zimanê kurdî ne. Herweha rewşenbirê vê serdemê, gelek hêvî, daxwaz û pêşniyazên serdemâ beriya xwe bi cih anîne wek berhevkirin, tomarkirin û belavkirina keresteyên folklorî, vekolînen folklorî bi awayekî zanistî.

Celadet, yekem car pênameya zaraveya "folklor"ê kirîye, weku destan, cureyên stranên gelêrî, dab û nerît, jiyanâ eşîriyê, zanyariya gelêrî bi sedan keresteyên folklorâ kurdî berhev kirine û polîn kirine. Wi xwestiye ku hişmendiya kurdan di warê folkorê de hisyar bike. Lewma wi metodêne xebata meydânî di karê berhevkirina keresteyên folklorê de diyar kirine. Ev gotar hewl dide ku ji aliyê teşe û naverokê ve xebatê Celadet Alî Bedir-Xan binirxîne û bide nasîn.

**Peyvîn sereke:** Celadet Alî Bedir-Xan, Nifşê Hawarê, Folklorâ Kurdî, Nasnameya Kurdî ya Neteweyî.

### ABSTRACT

*"Celadet Ali Bedir-Khan: The Founder of Kurdish Terminology of Folklore"*

This article investigates the works of Ali Badr-Khan in terms of their Kurdish folklore material content. The Kurdish intellectual, Ali Badr-Khan is one of the vanguards of the Hawar's generation (1932-1946) and besides of his other activities, he points by studying of folklore materials to optimism and the encouragement of the Identity of Kurdish nationality. The form and content of the works in the Hawar's intellectual generation approach an important era based on historical researches of the folklore. One main feature of this period is that in the efforts and studies the terminology of folklore is used directly and the folklore studies were recognized as an independent field. All writings of intellectuals of this era were written in Kurdish Language. So, the intellectuals have progressed in collection, registration and distribution of the folklore materials and the folklore studies. Thus, this work increased dimensions for future studies. Celadet is the first one who made a definition of terminology of folklore. He describes terms and topics such as legends, types of folk songs, habits and traditions, tribal life, public knowledge. The material was further collected as well as classified in numerous amounts. He did his best to draw the Kurdish attention through the folklore. Therefore, he defined the practical methods by collecting the materials of the folklore. Also, this article attempts to estimate and introduce the form and content of Celadet's works.

**Key words:** Ali Badr-Khan, Hawar's Generation, Kurdish Folklore, Kurdish National Identity.

\* Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Zaxo/Kurdistan/Iraq, Beşa Ziman û Edeba Kurdi.  
e-mail: ramazanpertev@gmail.com

## DESTPÉK

Celadet Alî Bedir-Xan, di sala 1893yan de li Stenbolê ji dayik bûye û di sala 1951ê de li Şamê wefat kiriye. Celadet, neviyê Mîr Bedirxan e ku ji binemala Ezîzan in. Herweku tê zanîn, bi pêşengiya Mîr Bedirxan di navbera salên 1843-1846an de, kurdan li hember desthilatdariya Osmaniyan serî hildaye. Pişti têkçûna vê serhildanê hemû endamên vê malbatê koçberî Stenbolê bûne û ji wir jî li gelek deverên împaratoriya Osmanî belav bûne. Bedirxanî, di dîroka rewşenbîriya kurdî de yek ji malbatê pêşeng e. Wate Celadet dema ku dest bi xebatê çand, ziman û edebiyata kurdî kir, xwedî paşxaneyeke dewlemend bû û wî ji vê paşxaneyâ xwe gelek sûd wergirtine. Wî, li Zanîngeha Stenbolê beşa hiqûqê xwendiye.<sup>2</sup> Li serdema Osmaniyan, di weşanên wek *İçtihad, Türkçeye İstanbul, Serbestî* de nivîsên wî weşiyane. Celadet Alî Bedir-Xan, xwedî û berpirsiyarê kovara *Hawar* û *Ronahîyê* bû. Wî, wek çand, dîrok, folklor, edebiyat, ziman, rîziman, erdnîgarî, ayîn di gelek warên kurdnasiyê de berhem nivîsîne.<sup>3</sup> Wek Husêن Hebeş jî amaje pê kiriye, ew ansîklopedîstekî kurd ê serdema xwe bû.<sup>4</sup> Gelek nîvîsên *Hawar*ê yên derbarê folklorâ kurdî de, wî bixwe amade kirine.

Celadet, di nivîsên xwe de ji bilî navê xwe, nasnavêن wek C.A.B., Herekol Ezîzan, Koçerê Botan, Çîrokbêj, Stranvan, Stranvanê Hawarê, Stranvanê Jêliyan, Ferhengyan, Nêrevan, Evîn Cîwelek, Seydayê Gerok, Mamosteyê Gerok, Pirsiyarkerê Kurdan, Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînemxan, Paşlavjok, Rastedar, Farisîxwîn, Xeberguhêz, Bişarê Segman, Nivîsanoka Hawarê, Xwediye Hawarê, Xwediye Hawar û Ronahîyê jî bi kar anîne. Nivîsên Celadet ên vê serdemê, bi kurdî û fransî ne.

## 1. FOLKLORA KURDÎ WEKU SERÇAVEYA ZIMANÊ KURDÎ YÊ STANDARD

Hewldana pêşîn a Celadet bo standardkirina zimanê kurdî bû. Herweku wî bixwe jî nivîsiye, hîn ji ciwaniya xwe de, ew bi zimanê kurdî re eleqedar bûye.<sup>5</sup> Herweha ji çend nivîsên wî yên di rojnameya *Serbestîyê* de ku derbarê

<sup>2</sup> Derbarê jiyannameya Celadet Alî Bedir-Xan de, bnr. Hazım Kılıç (amd.), *Mîr Dr. Kamiran A. Bedir-Xan, Stér, Weş. Xani&Bateyî*, Danmark, 1992, r.9-17; Husêن Hebeş, *Raperîna Çanda Kurdî Di Kovara Hawarê de*, Belavgeha Hogir, Bonn, 1996, r.37-43; Fîrat Cewerî, *Hawar 1, Hejmar 1-23 (1932-1933)*, Nûdem, Stockholm, 1998, r.19; Mehmet Kemal İskî (Torî), *Ünlü Kurt Bilgin ve Birinci Kuşak Aydînlar*, Weşanên Sorun, Stenbol, 2000, r.153-156; Hakan Özoglu, *Dewleta Osmanî û Netewepererên Kurd*, (wer. Ali Karadeniz), Weşanxaneyâ Kitap, Stenbol, 2012, r.144-146; Feqî Huseyn Sagnîç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstituya Kurdi ya Stenbolê, Stenbol, 2014, r.514-519.

<sup>3</sup> Ji bo hemû berhemên Celadet Alî Bedir-Xan, bnr. Fîrat Cewerî, *Hawar 1, Hejmar 1-23 (1932-1933)*, Nûdem, Stockholm, 1998, r.19.

<sup>4</sup> H. Hebeş, h.b., r.164.

<sup>5</sup> Xwediye Hawarê (Celadet Alî Bedir-Xan), "Sê Tarîxên Hawarê..."

*Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de weşiyane, em dizanin ku wê serdemê bi edebiyata kurdî re jî eleqedar e.<sup>6</sup>

Celadet, ji bo kurdan du warêن vekolînê giring dizane: “ziman” û “folklorâ kurdî”. Lewma xebatêن Celadet bi piranî li ser van babetan e. Jixwe yek ji armanca sereke ya weşandina kovara *Hawarê* jî ev e:

“Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ku xwe nas dike; dikare xwe bide naskirin. *Hawara* me berî her tiştî heyina zimanê me dê bide naskirin. Lewma ku ziman şerta heyînê a pêşîn e.”<sup>7</sup>

Gelo Celadet bo çi ewqas giringî daye xebatêن li ser zimanê kurdî? Bi baweriya me piştî têkçûna xebatêن çekdarî yên kurdan li Tirkîyeyê, Celadet baş pê zanîbû ku ji bilî ziman çi bendek nemaye ku kurd di nav neteweyên serdest de nehelin û winda nebin. Wate, ziman hem nişaneyâ cudabûnê, hem amûrê herî giring bû bo geşekirin û xurtkirina tevgerên siyasî:

“Ji ber ku miletê bindest, heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin: “Ol” yek, “Ziman” dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingê çek, yek bi tenê ye û bend tenê ziman e.”<sup>8</sup>

Celadet, bo hebûn û xweseriya kurdan şertên bingehî wek axaftin, hînbûn, hînkirin û parastina zimanê kurdî dizane:

“Me zanî ku xweseriya me, di zimanê me de ye û em tenê bi hînbûna xwendin û nivísandina zimanê xwe û bi parastina wî, di civata miletan de, wek miletekî xweser dikarin bijîn û payedar bibin.”<sup>9</sup>

Bi gotina Celadet, “miletékî dîl yê ku zimanê xwe winda nekiriye, dimîne wî hepsiyyê ku mifta zindana wî di destê wî de ye.”<sup>10</sup> Lewma, Celadet hewl dide da ku mifteyên kurdan di destê wan de bin. Ew bo kurdêن ku bi kurdî nizanîn, daxwaz dike ku ji Elyêzerê cihû îbretê wergirin ku wî zimanê ibranî ji mirinê rizgar kir û bi awayekî nû vejand û xiste nav jiyana qewmê cihûyan.

“...heke bi zimanê xwe nizanîn berî ewîlî hînî wî bilbin û piştre di nav mala xwe û bi zar û zêçêن xwe re herweki Elyêzer dikir bi tenê bi kurdî xeber bidin. Belê ji van kurdan re divêt, gava ji derve têne mal, herweku cilêن xwe ji xwe dikin û wan bi cilêن malê diguhêrinin, zimanê xwe jî welê biguhêrinin û bi zimanê kuçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştékî miqedes hilînin.”<sup>11</sup>

<sup>6</sup> Celadet Alî Bedir-Xan, “Kürt Edebiyatı: Zîn û Mem-1” Rojnameya *Serbestî*, j.491., 1919; Celadet Alî Bedir-Xan, “Kürt Edebiyatı: Zîn û Mem-2” *Serbestî*, j.495., 1919.

<sup>7</sup> “Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê”, *Hawar*, ,j.1., 1932.

<sup>8</sup> Nivîsanoka Hawarê (Celadet Alî Bedir-Xan), “Heyîneke Yeksalî”, *Hawar*, j.20., 1933.

<sup>9</sup> Celadet Alî Bedir-Khan, “Merhele”, *Rojâ Nû*, j.1., 1943.

<sup>10</sup> Herekol Azîzan, “Çira Zanîn”, *Ronahî*, j.28., 1945.

<sup>11</sup> Herekol Azîzan, “Zilamek û Zimanek”, *Hawar*, j.40., 1942.

Diyar e ku Celadet axaftina bi kurdî karekî pîroz dizane. Li gorî Celadet, hînbûn û nivîsîna bi zimanê dayikê, ne peywîreke şexsî ye, belku peywîreke neteweyî ye:

“Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletî êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî, lê wezîfeke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne, wezîfa xwe a milî pêk ve neanîne û bi kêrî miletê xwe nehatine.”<sup>12</sup>

Wî bi vî awayî xwestiye ku zimanê kurdî standardîze bike. Lewra wek Amir Hassanpour jî amaje pê kiriye, standardîzasyon carekê bi ser keve, êdî ziman zêdetir belav dibe û di gelek rewşenî girift ên jiyanê de bi awayekî hêsan tê bikaranîn.<sup>13</sup>

Standardîzasyonê, zimanekî wisa çê dikir ku awayê ragihandinê yê xelkê û rewşenbîran hêasantir û rîkûpêktir dibû. Pêwendiya standardîzasyona ziman û geşedana neteweyî hîn di serdema Ronesansê de hatibû famkirin. Di nîvê sedsala 19. de li beşen rojhîlatê Ewropayê (Balkan û Skandinawa jî tê de), hemandemîbûna netewe-avakirin û standardîzasyonê di lîteratûrê de hatiye belgekirin.<sup>14</sup>

Lewra, wisa hatibû famkirin ku êdî şer, şerê çandî û rewşenbîriyê bû. Li gorî Hassanpour jî “xebatê standardkirina zimanê kurdî weku parçeyek ji pevçûna di navbera netewetiya kurdî û dewletên serwer de dest pê kir û wisa jî dewam kir.”<sup>15</sup> Anthony Smith jî di wê baweriye de ye ku ji piştî Şerê Cihanê yê Yekem heta salên 1960-70yî, hemû hewlîn seferberiyê yên bo standardkirina zimanê kurdî, beşek ji têkoşîna wan a siyâsi ya neteweyî bû.<sup>16</sup> Wisa xuya dike ku Celadet jî bi vê hişmendiyê tevgeriyaye.<sup>17</sup>

Lewma Celadet serê pêşîn dest bi cîbicîkirina bernameya xwe ya bo amadekirina alfabe, rîzmanî û ferhengeke kurdî kiriye. Belam ji bo vê yekê jî serçaveya herî mezin, folklorâ kurdî ye. Di jimareya yekem a *Hawaîe* de wî bang li kurdan kiriye ku ji van berhem û keresteyan li ba kê çi hebe, ji wan re bişînin. Di nivîsa pêşî de bi awayekî aşkere ev yek xuya dibe. Di beşa “Awayê Xebatê” ya vê nivîsê de nexşerêya hin xebatê kovarê xal bi xal têrêzkirin. Xalêن wê yêñ derbarê folklorâ kurdî de bi vî awayî ne:

<sup>12</sup> Herekol Azîzan, “Zilamek û Zimanek”

<sup>13</sup> Amir Hassanpour, *Kürdistanda Dil ve Milliyetçilik (1918-1985)*, (wer. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan), Weşanên Avesta, Stenbol, 2005, 47.

<sup>14</sup> A. Hassanpour, h.b., 98.

<sup>15</sup> A. Hassanpour, h.b., 106.

<sup>16</sup> Anthony D. Smith, *Millî Kimlik*, (wer. Bahadir S. Şener), Weşanên İletişim, Stenbol, 2014, r.204.

<sup>17</sup> Bnr. Hüseñ Hebeş, di sala 1982yan de li Fakulteya Rojnamevaniyê ya Zankoya Mosko de, nameya xwe ya doktorayê li ser rola *Hawaîe* di raperîna çanda kurdî de nivîsiye. Herweha derbarê vê mijarê de bo xebateke nû, bnr. Ronayî Önen, “The Role of Language in the Discursive Construction of the Kurdish Nation: A Case Study on the Kurdish Periodical *Hawar* (1932-1943)”, Nameya Masterê ya Neçapkirî, Enstîtuya Zanistêr Civakî, Zanîngeha İstanbul Bilgi, Stenbol, 2012.

“-Berhevkirina çîrok, çîrçîrok û her texlît laje û stranê kurdî û birêve belavkirina wan.

-Sehîti ser reqs û qeydeyên stranê kurdî.

-Sehîti ser her texlît rêzikên kurdî û Kurdistanê yên zemanê borî û yên iro û senifandina wan. Sehîti ser hatinê Kurdistanê û pîş û sinhetê kurdî.”<sup>18</sup>

Ji xwendevanan tê xwestin ku ji kovarê re her cure helbest û nivîsan bişînin; çîrok, metelok û mamikên kurdî berhev bikin:

“-Ji Hawarê re her texlît şîhr û bendan nivîsandin.

-Çîrok, medhelok, mamikan berhevkirin û ji Hawarê re şandin.

-Di heqê welat, eşîr, bajar û gundê xwe de, tiştên kevn û nuh ji Hawarê re rêkirin.”<sup>19</sup>

Lewra li gorî Celadet, binemaya xebatên li ser zimanê kurdî pabendî vekolînên keresteyên folklorâ kurdî ne. Herçî folklorâ kurdî ye, ew kaniyek e ku ci caran ziwa nabe:

“Xortênu ku dixwazin xizmeta zimanê xwe bikin û hêj ji ber xwe de nikarin binivîsinin, ji wan re kaniyeke kûr, mezin û fireh heye. Ava wê kaniyê tucaran naçike: “Folklor” yanî çîrok, çîrçîrok, stran, medhelok, mamik; tiştên ku xelkê gotiye.”<sup>20</sup>

Wate, herçî kurdênu ku dixwazin li ser ziman bixebeitin divê berê xwe bidin keresteyên folklorâ gelê xwe. Celadet, gelek caran gazind jî kirine ku kurd li ser folklorâ xwe naxebitin:

“Ji û pê ve tiştekî din jî heye ku hîm û bingeha hemiyan e. Ew jî daba (edebiyata) xelkê ye, stran, çîrok hwd. Di vê babetê de xwendevanê Hawarê qet nexebitîne, herçend me ji wan re çend caran got û nivîsand jî.”<sup>21</sup>

## 2. BERHEVKIRIN, TOMARKIRIN, PÊNASEKIRIN Û POLÎNKIRINA KERESTEYÊN FOLKLORA KURDÎ LIGEL METODÊN ZANISTÎ

Celadet yekem ji wan rewşenbîrênu kurd e ku peyva “folklor”ê bi kar anîye, ew weku qadeke serbixwe dîtiye û li ser pênaße û besêne wê rawestiyaye.<sup>22</sup>

Celadet, berî ku pênaseyâ zaraveya “folklor”ê bike, amaje bi etîmoloji û bikaranîna wê li cîhanê û di nav kurdan de kiriye:

“Folklor: Ev bêje di eslê xwe de îngilîzî ye. Lê iro ketiye hemî zimanê dinyayê.

Ji lewre me jî ew xistiye zimanê xwe. Jixwe kurdênu Qefqasê beriya me ev bêje xistine zimanê xwe û kitêbek bi navê *Folklorâ Kurdmancî* belav kirine.”<sup>23</sup>

<sup>18</sup> “Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê”

<sup>19</sup> h.g.

<sup>20</sup> Hawar, “Stûna Xwendevanan”, *Hawar*, j.29., 1941.

<sup>21</sup> Hawar, “Dersxane”, *Hawar*, j.17., 1933.

<sup>22</sup> Hawar, “Buts et Caractères de la Revue *Hawar*”, *Hawar*, j.1., 1932.

<sup>23</sup> Ferhengvan, “Ferhengok”, *Hawar*, j.30., 1941.

Diyar dibe ku haya Celadet ji proseya geşekirina vê zanistê heye û wek berhema Heciyê Cindî û Emînê Evdal, ji xebatên kurdên Qefqasan jî agahdar e.

Piştî vê agahiyê, wî pênameya zaraveya folklorê kiriye. Wate, Celadet berî neh salan ku peyva “folklor”ê bi kar anîbû, îcar jî pênameya wê kiriye:

“Folklor tevayıya adet, çîrok û stranên miletikî ye. Ew adet, çîrok û stranên ku ji nav xelkê bi derkotine û di dora nîşan de bi ser ve ketine û gihaştine nîşen nû. Jixwe bêjeya folklorê bêjeyeke bihevketî ye û bi mana zanîn an zanista xelkê ye (Folklore).”<sup>24</sup>

Ji van hevokan jî xuya dike ku Celadet, folklorê weku “zanista xelkê” dizane. Herweha eger heye ku wî ev pêname ji zaravenasiya zimanê fransî wergirtibe. Ligel ku ew ne folkornas e jî, cihê herî payebilind dibe mafê Celadet Alî Bedir-Xan di dîroka folkora kurdî de ku ew bi vî karî rabûye.

Celadet, berî her tiştî karê berhevkarîyê giring dizane ku jixwe di jimareya pêşîn a *Hawarê* de bang li xwendevanan kiribû. Lewma pêşî wî bixwe karê berhevkarîyê kiriye ku bibe nimûne bo xwendevanên kovarê. Wî, wek destan, cureyên stranên gelêrî, dab û nerît, jiyana eşîriyê, zanyariya gelêrî bi sedan keresteyên folkora kurdî berhev kirine.<sup>25</sup> Berhevkirin û weşandina vegotinên kurdî yên gelêrî wek *Çîrçîroka Bingolê, Memê Alan, Mîr Miheme, Siyabend* û *Xecê* ligel fransiya wan gelekî giring bûn.<sup>26</sup> Li ser Newrozê jî nivîseke wî heye ku derbarê wate û dîroka vê cejnê de ye.<sup>27</sup> Ji bo navlêkirina zarokan a bi kurdiya resen jî nivîsek ji cureyên navan ên bo keç û kuran jî belav kiriye ku ev jî beşek ji folklorê ye.<sup>28</sup> Wate wî di gelek beşên folklorê de vekolîn kirine. Diyan dibe ku Bedirxan ji dengbêj û çîrokbejan gelekî sûd wergirtine. Kesên wek Mişoyê Bekebûr, Xidoyê Hindawî, Bijîskê Mîran, Ehmedê Fermanê Kîkî serçaveyên wî yên herî giring bûn. Di bin sernavê “Textes et Traductions” (Deq û Wergerên wan) de ji devê van dengbêjan bi dehan nimûneyên folkora kurdî hatine tomarkirin. Bo nimûne, dengbêj Ehmedê Fermanê Kîkî yê 75 salî, weku dengbêj kovarê xebitiye.<sup>29</sup>

Wate, Celadet gelek caran xebatên meydanî kiriye bo berhevkirin û tomarkirina keresteyên folkora kurdî. Celadet, di deqên folklorî yên belavkirî

<sup>24</sup> Ferhengyan, h.g.

<sup>25</sup> Ji bo nivîsên Celadet Alî Bedir-Xan ên derbarê folkora kurdî de, bnr. H. Hebeş, h.b., 1996, r.146-163; K. Yıldırım, R. Pertev, M. Aslan, h.b., r.70-85

<sup>26</sup> Herekol Azîzan, “Çîrçîroka Bingolê”, *Hawar*, j.11., 1932; Herekol Azîzan, “Siyabendê Silivî”, *Hawar*, j.13., 1932; Herekol Azîzan, “Du Guharto”, *Hawar*, j.14., 1932; Herekol Azîzan, “Lavijêñ Mîr Miheme”, *Hawar*, j.29., 1941.

<sup>27</sup> Herekol Azîzan, “Newrûz”, *Hawar*, j.42., 1942.

<sup>28</sup> Bavê Cemşîd û Sînemxanê, “Navîn Kurdmancî”, *Hawar*, j.31., 1941.

<sup>29</sup> Ji bo hin stranên ji devê Ehmedê Fermanê Kîkî, bnr. Stranvan, “Lawiko”, *Hawar*, j.19., 1933; Herekol Azîzan, “Besna”, *Hawar*, j.22., 1933; Stranvan, “Delalê Beriyê”, *Hawar*, j.24., 1934; Ji bo Bijîskê Mîran, bnr. “Strana Keleha Xurşê”, *Hawar*, j.23., 1933.

de çavkaniya xwe nîşan daye ku ev şertê sereke yê metoda zanistiyê ye. Bo nimûne, dema ku çiroka bi sernavê “Ehmedê Zeydan” nivisiye, di binê çirokê de têbinezeyeke bi vî awayâ daniye:

“Ev çiroka ha ji min re mixtarê Tilşêra Aşîtan, Hecî Hemzê kurê Hecî Silêman gotiye. Min tu tiştê wê neguhart û herweku ji devê Hecî derketiye welê ji guhastiye Hawarê...”<sup>30</sup>

Wek wî jî nivisiye, wî çawa guhdarî kiriye, her wisa nivisiye bêyî ku tiştekî jê biguherîne.

Celadet, xebatê meydanî ligel metodê zanistî ji bo xwendevanê xwe jî pêşniyaz kirine. Belam, Celadet ji xwendevanê xwe ne razî ye. Lewra li gorî wî hîn jî ew hişmendiya giringipêdana keresteyên folklorê geşe nebûye, ligel ku folklorâ kurdan ewqas xwedî dewlemendiyekê bêhempa ye:

“Herçendî me çend caran ji wan re got û nivîsand jî. Heye li xwe dananîne mirovîkî nezan, dengbêjîkî an mitribekî bibin pêşberî xwe û gotinê wî danivîsinin. Belê çêtir dîtine ku ji ber xwe binivîsinin. Lî ne welê ye. Ev texlit nivîsar ji her texlitî bêtir bi kêrî me têr û hêja ne. Ji ber ku tê de ji aliyekî awayê gotinê iro û ji milê din awayê gotin û pirsên çend sed salfîn hene ku iro di zimanê axaftinê de nînîn û yekcar winda bûne. Belê destê me de çendyek hebûn. Me ew belav kirine. Lî ew ne bes in. Ev kanî hinde kûr e ku binya wê zû bi zû naye dîtin. Kurdistan ji perçeyên holê têjî ye. Bi salan ve bête nivîsandin kuta nabin.”<sup>31</sup>

Celadet li çareyan geriyaye ka dê çawa xwendevanan han bide bo karê berhevkarîyê. Ji bo hêşankirina vê yekê carinan rîyê cuda nîşan dane. Di bersiveke xwe de li ser pirsa xwendevanekî, pêşniyazên xwe weha nivisiye:

“Xorten me dikarin van tiştan ji dengbêj, çirokbêj û ji kalan bipirsin û bêî ku tu tiştê wan biguhêrinin, weke xwe binivîsinin û ji Hawarê re rîkin. Em wan bi navêن xorten ku ew berhev kirine belav dîkin. Xorten me di dora folklorâ ku wê binivîsinin, ji me re tiştine bi ehemiyet û spehi ji dikarin bidin zanîn. Mesela, yekî stranek nivîsandiye, di dora wê stranê de gelek tişt hene ku mirov dikare wan seh bike û bide zanîn. Weku niho: heke ew stran li ser şerekî ye; ew şer di navbera kîjan eşîran de çêbûye? Ew eşîr li kû derê rûdinin? Ew eşîr berê diçûn kîjan zozanî? Xelkê wan eşîran bi ci mijûl dibin; destxetê wan ci ye? Xaliçe, mehfür an tiştine din çêdikin?”<sup>32</sup>

Van pirsên Celadet, mirov dikare wek forma anket/rapisiyê jî bihesibîne. Lewra ligel nimûneyên folklorî, amaje bi tomarkirina agahiyê li derdora wan keresteyan jî tê kirin.

Di vî warî de Celadet, naweste û xwe bêhêvî nake. Dubare dubare rîyê cuda û rîbazên hêsan, nîşanî xwendevanan dide:

<sup>30</sup> Xwediye Hawarê, “Ehmedê Zeydan”, *Hawar*, j.26., 1935.

<sup>31</sup> Hawar, “Dersxane”, *Hawar*, j.17., 1933.

<sup>32</sup> Hawar, “Stûna Xwendevanan”, *Hawar*, j.29., 1941.

“Di hejmara Hawarê a 29an de (rûpel.10) me hin awayên xebatê şanî xortan da û gotibû ku xortên me ji folklorê re bixebeitin û herçî stran, çirok, çîrcîrok, medhelok û mamik in bidin hev û belav bikin. Em dikin iro di vî warî de rêke din jî şanî wan bidin. Eşîrên Kurdistanê û her texlît adet û rêzikên wan. Ma kes heye ku eşîra xwe nas neke. Nemaze heke çend peyayên eşîrekê gihane hev ewê bikarin li ser wê eşîrê tiştekî tekûz çêbikin. Ev nivîsarên ha ku gihane hev ewê bikarin tarîx, cexrefye û jîna Kurdistanê a civakî bînin pê.”<sup>33</sup>

Qasî ku em di rûpelên *Hawarê* de dibînin, di encama van handanê xwe de, Celadet bi ser ketiye, lewra bi sedan keresteyên folklorâ kurdî di van weşanan de hatine tomarkirin ku nema ew winda dîbin.

Ligel karê berhevkirin û tomarkirinê Celadet Alî Bedir-Xan, amaje bi danasîna taybetmendiyê keresteyên folklorâ kurdî jî kiriye û ew polîn kirine weku “çirok, çîrcîrok, destan” ji bo vegotinê kurdî yên gelêrî û “lawik, şer”, ji bo muzîk û semayê kurdî yên gelêrî.<sup>34</sup> Celadet Alî Bedir-Xan vegotin û stranê kurdî yên gelêrî bi vî awayî polîn kirine:

**Çirok, çîrcîrok, destan:** Bi awayê helbestkî hatine afirandin. Ji aliyê çirokbêjan ve têr gotin an jî dengbêj û stranvan wan bi stranî dibêjin. Stranvan pêşî bi çirokî dest pê dike. Dema xwest kesêni di çirokê de bide axaftin dest bi stranê dike û axaftina qehremanan bi stranî têr derbirîn. Eger stranvan çendek bin, yek ji wan çirokê dibêje û yên din, her yek cihê qehremanekî çirokê digire û distire.

Bi nerîna Celadet, stranê kurdî yên gelêrî dişibin “lied” an wate stranê gelêrî yên almanî. Li gorî wî, gelek stranê kurdî ji aliyê jinan ve têr afirandin. Celadet li ser binemaya mayîndebûna wan stranan, ew kirine du beş. Beşa yekem demeke gelek dirêj, bêşînor hebûna xwe didomînin. Beşa duyem demeke nedirêj, carinan saleke tenê dimînin û paşê têr jibîrkirin û winda dîbin. Xuya dibe ku Celadet li vir hem pênaseya van berheman kiriye û hem karê berawirdî kiriye.

Ji bilî stranan, Celadet wek “lawik, şer, dîlok, lawij, bêrîte û beste” behsa cureyê sema û muzîka kurdî jî kiriye. Wî, stranê kurdî yên gelêrî bi vî awayî polîn kirine:

**Lawik:** Stranê evînî û lîrîk in.

**Şer:** Stran û destanê cengê ne û destanê giring in. Kurdêñ çiyayî û yên berîvanî navêna cuda li şeran dikin. Kurdêñ berîvanî dibêjin “Delal” û her eşîr xwedî delalekî ye. Bo nimûne, Delalê Berazan, Delalê Milan, Delalê Beriyê, hwd. Mijara delalan, hemû wek hev e: Ciwanekî qehreman diçe şer. Hezkirî an destgirtiya wî, bûyerên şer û qehremaniyeñ ciwan distirîne. Kurdêñ çiyayî

<sup>33</sup> Herekol Azîzan, “Ji Eşîrên Botan: Jêliyan”, *Hawar*, j.34., 1941.

<sup>34</sup> D. A. Bedir-Khan, “Le Folklore Kurde”, *Hawar*, j.3., 1932. (Ji bo wergera van beşen ji fransî bo kurdî, gelekî spas bo Dr. Mustafa Aslan.)

bo destanan dibêjin “lawikê-siwaran” ku bi awayê allegro-presto (strangotina bileyz û rîtmekebihêz) tên gotin. Beza hespan tîne ber çavênguhdaran. Di vegotina çîrokê de dema siwar dikevin nav şer, ev besênguhdaran strîn. Dema stranvan vê besênguhdaran digêhe asta herî bilind.

**Dîlok:** Stranêngovend û dîlanan e.

**Lawij, lavijok, laje:** Lawij muzîka ayînî ye. Îdî di nav gel de kêm peyde dîbin. Lawij ku ne ji ayetên Quranê pêk tên, formeke kehanetê ne, lê lavijok meş an dansa ayînî ne. Carinan ji melodiyênguhdaran xemgîniyê yên wek payîzokan re jî lavijok an laje tê gotin.

**Bêrîte, bêlîte:** Bêrîte ew melodî ne ku ji aliyê şagirtênguhdaran ve tên gotin. Ji ber helbestênguhdaran Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Batê û wd. hatine çêkirin. Şagirt dîbin du besênguhdaran dudo dudo an sisênguhdaran sisê. Beşek distirîne, dema wan qedand, beşa din dest pênguhdaran dîbin vî awayî bi dorênguhdaran.

**Beste:** Beste, stranêngovend pir giran, muzîka bêgotin in. Gotinênguhdaran besteyan, tenê çend riste ne. Peyveke taybet a her besteyê heye ku bi awayekî dirêj tê gotin. Ev peyv bi xwe navênguhdaran ye.<sup>35</sup>

Ev pêzanîn gelekgî giring in bo dîroka vekolîna folkłora kurdî ku bi awayekî zanistî û berfireh, keresteyênguhdaran edebiyata kurdî ya gelêrguhdaran pênaşekirin û li gorînguhdaran taybetmendiyênguhdaran xwe yên teşeyî û naverokînguhdaran polînkirin.

Celadet Alî Bedir-Xan, di vekolîneke xwe ya din de amaje bi danasîn û taybetmendiyênguhdaran zaraveyênguhdaran wek “dengbêj, çîrokbeh, sazbend û blûrvan” jî kiriye. Wî, dengbêj û çîrokbeh kirine beşek û li gorî wî, di serdemênguhdaran borî de mîr, beg û axa xwedînguhdaran dengbêj û çîrokbehjan bûn. Xanî ji wan re çêdikirin, ew xwedînguhdaran û hemûnguhdaran pêwistîyênguhdaran wan ên aborînguhdaran dikirin.

Li gorînguhdaran Bedir-Xan, dengbêj hunermend e û bi hunera xwe tê nguhdaran û tenê “lawik” û “şer”an distirîn, wan ci caran “dîlok” nedistiran ji ber ku dîlok layîqênguhdaran nedidît. Dibêje ku di demênguhdaran borî de dengbêj û stranbêjênguhdaran sereke li hev dicivîyan û ji her stranênguhdaran tenê çend peyv distirandin û derbasînguhdaran straneke din dibûn. Bi vî rengînguhdaran wan dixwest dewlemendiya repertuara xwe ya hunerînguhdaran bidin nasîn. Di van civînan de ku carinan bi saetan dom nguhdaran dikir, dengbêjjan bê rawestan stranînguhdaran digitin. Dengbêjênguhdaran jêhatînguhdaran karîbûn di cih de stranênguhdaran nûnguhdaran biafirîn. Carinan dengbêjjan bi rîya van stranênguhdaran nûafîrandînguhdaran diavêtin berhev heta ku yekî zora yê dînguhdaran bibira. Celadet dibêje, kesen ku ji dengbêjjan re li muzîkênguhdaran dixistin weku “sazbend” dihatin binavkirin û carinan wan bi xwe jînguhdaran distrand.

<sup>35</sup> D. A. Bedir-Khan, “Le Folklore Kurde”, *Hawar*, j.3., 1932.

Li gorî ku Celadet nivisiye, çirokbêjan jî zanibû wek dengbêjan bistirên. Lê stranê wan sivik (besît) in û di nav stranê de besen helbestî yên çirok û çîrçirokan bi peyv têngotin.

Ji bilî dengbêj û çirokbêjan Celadet, mitriban jî weku hunermendêne muzîk û hostayê dîlanan nîşan dide. Mitrib, ji boşahî û dîlanan muzîk û dîlokan diafirînin û distirîn.

Celadet, balê dikişine ser hebûna blûrvanan û hunera wan a blûrvaniyê. Hinek ji van blûrvanê zîrek şivantiyê jî dîkin, şivanêne kurdan hemû blûrvan in. Derbarê blûrvaniya şivanan de hin efsane jî têngotin. Wî, cih daye yek ji van efsaneyan ku pesnê şivanê Mîrê Botan dide.<sup>36</sup>

Di dawiya vê vekolînê de Celadet, wek *Memê Alan, Rustemê Kurd, Siyabend, Binefşa Narîn, Dêrsim, Delal, Bêmal û Xezal*, amaje bi destanê kurdî kiriye ku dê di Jimareyê bê de bide nasîn.

Herweku xuya ye, Celadet bo binavkirin û polînkirina folklora kurdî gelek zaraveyê nû peyda kirine an çêkirine ku em iro jî wan bi kar tînin. Hinek zaraveyê nû wî bixwe çêkirine wek zaraveya “guharto” di şûna “variant”ê de, zaraveya “çand”ê di şûna “cultur” a îngilîzî de bi kar anîye. Zaraveyê wek “zanista xelkê”, “edebiyata xelkê”, “berhevan”, “gelêr”, “destançirok” çêkirine.

26

Wî, gelek zarave ji çanda kurdî wergirtine, bo nimûne “payîzok”, “serêlok”, “şer”, “lawik”, “lawikê siwaran”, “lavij”, “lavje”, “lavijok”, “paşlavijok”, “heyranok”, “xerabo”, “dîlan”, “dîlok”, “bêrîte”, “bêlîte”, “beste”, “lorî”, “çirok”, “çîrçirok”, “metelok”, “mamik”, “dengbêj”, “çirokbêj”, “stranbêj”, “sazbend”, “blûrvan”, “stranvan”, “dîlokvan” û wd.

Ev karênu ku Celadet kirine, bo dîroka vekolînê folklora kurdî xwedî cihekî bêhempa ne. Wate, çawa ku Celadet binemayê zimanê kurdî li ser alfabyeke nû tekûz kirine, bi heman awayî binemayê folklora kurdî jî ligel metodêne zanistî danîne. Bi rastî ev gelekî girîng e bo dîroka vekolînê folklora kurdî ku ji aliye rewşenbîrekî kurd ve, hem peyva folklorê hatiye bikaranîn û hem keresteyê folklora kurdî hatine pênasekirin û polînkirin.

### 3. ŞAKARÊ FOLKLORA KURDÎ: *MEMÊ ALAN* WEKU İSPATA NASNAMEYA KURDÎ YA NETEWEYÎ

Celadet Alî Bedir-Xan, ci di kovara Hawarê de, ci di Ronahiyê de be, girîngiyeke mezin daye bo vekolînê li ser *Memê Alana* gelêrî û *Mem û Zîma* Ehmedê Xanî. Di vekolîna xwe ya pêşî de destana *Memê Alan* nasandiye û bal kişandiye pêwendiya wê ligel *Mem û Zîma* Ehmedê Xanî.<sup>37</sup> Wî, cara pêşîn

<sup>36</sup> D. A. Bedir-Khan, “Le Folklore Kurde (Dengbêj-Çirokbêj-Sazbend-Blûrvan)”, *Hawar*, j.4., 1932.

<sup>37</sup> D. A. Bedir-Khan, “Le Folklore Kurde (Dengbêj-Çirokbêj-Sazbend-Blûrvan)”, *Hawar*, j.4., 1932.

*Memê Alan* li gorî naveroka wê dabeş kiriye weku destpêk, 9 bes û encamek.<sup>38</sup> Di jimareyên 6, 7, 8, 10, 11, 12, 23, 27, 28an ên *Hawarê* de jî besên vê destanê bi zimanê fransî belav kirine. Herweha beşa “Lehîstika Setrencê” ya *Memê Alan* jî bi kurdî weşandiye.<sup>39</sup> Celadet, destana *Memê Alan* ji devê du dengbêjên deşta Sirucê, Mişoyê Bekebûr û Xidoyê Hindawî guhdarî kiriye.<sup>40</sup> Celadet, guhartoyeke vê destanê ya bi zimanê erekî jî ji bo rojnameyeke Qahîreyê, wergerandiye kurdî.<sup>41</sup>

Celadet li nik berhevkirina *Memê Alan*, yekem car bi tîpêñ latînî dest bi weşandina mesnewiya *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî jî kiriye ku hîn ji sala 1919an de li ser wê dixebeitî.<sup>42</sup> Wî, di jimareyên 45, 46, 47, 48, 49, 50, 51, 53, 54, 55, 56 û 57an ên *Hawarê* de ew belav kirine.

Gelo Celadet çîma ewqas giringî daye destana *Memê Alana* gelêrî û *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî?

Bersiva vê pirsê dîsa di nav nivîsên Celadet de heye. Li gorî Celadet şakarê folklorâ kurdî destana *Memê Alan* e:

“Di folklorâ me de, bêşik şaheser *Memê Alan* e. *Memê Alan* malê miletekî Ewropayî biwa Xwedê dizane di heqê wê de heta niho çend cild kitêb dihatine nivîsandin.”<sup>43</sup>

Belam ji bilî Ehmedê Xanî, kurdan heta niha nirx û buhayê vî şakarê folklorâ kurdî wate *Memê Alan*, baş nezaniye:

“Me kurdan ewçend guh ne dayê, ji şair û rîberê me ê mezin Ehmedê Xanî pê ve. Belê Xanî berî sê sed salî bi qîmeta vê destançîrokê hesiya û rabû li ser hîmê *Memê Alan* kitêba xwe a mezin û abadin *Mem û Zîn* anî wicûdê. Bi gotinê din *Memê Alan* bi navekî din bi nav kir û jê re *Mem û Zîn* got û ferqin xiste navbera çîrokiya xelkê û esera xwe.”<sup>44</sup>

Lewma cihê Xanî cuda ye li ber dilê Celadet. Lewra wî şakarê xwe li ser binemaya şakarê folklorâ kurdî nivîsiye:

“Xanî, binyanê esera xwe ji destana *Memê Alan* girtiye; lê ew weke xwe ne hiştîye û gelek tiştîn wê guhartine. Xanî bi vî awayî ji *Memê Alan* re guhartoke nû guhartoke nivîsandî saz kiriye û vê guhartoyê di hin cihêñ Kurdistanê, nemaze di cihêñ ku tê de medrese hene, li guhartoyêñ xelkê tesîr kiriye û ew kêm û zêde daye guhartin. Belê feqehêñ ku di medresan de *Memozîn* dixwendin, di civatêñ begler û axeleran de qesîdeyêñ Xanî bi saz û qeyde digotin. Dengbêjên ku di wan civatan de qesîdeyêñ Xanî seh dikirin hin birêñ wan qesîdan bi islûbêñ xwe dixistin kilam û stranêñ xwe û bi vî awayî di *Memê Alana* di wî welatî de hin tişt

<sup>38</sup> D. A. Bedir-Khan, “Memê Alan”, *Hawar*, j.5., 1932.

<sup>39</sup> Stranvanê Hawarê, “Ji Memê Alan: Lehîstika Setrencê”, *Hawar*, j.36., 1941.

<sup>40</sup> Herekol Azîzan, “Mişo û Xido”, *Hawar*, j.7., 1932.

<sup>41</sup> Evdilmesîh Wezîr, “Mem û Zîn Temâseke Kurdî e Abadin”, (wer. C.A.B.), *Ronahi*, j.23., 1944.

<sup>42</sup> Bnr. Celadet Alî Bedir-Xan, “Kürt Edebiyatı: Zîn û Mem-1” Rojnameya *Serbestî*, j.491., 1919.

<sup>43</sup> C.A.B., “Memê Alan”, *Ronahi*, j.23., 1944.

<sup>44</sup> C.A.B., “Memê Alan”

dihatin guhartin. Bivê nevê wan dengbêjan qesîdeyên Xanî xelet û li gora xwe seh dikirin û stranê xwe bi vî terzî diedilandin. Bi vî awayî *Memê Alana* xelkê ji *Memozîna* Xanî carina tiştine welê digirtin ku Xanî ew bi xwe tucaran negotibûn.”<sup>45</sup>

Celadet piştre jî dibêje jixwe mebesta me jî ew e ku em van herduyan bidin ber hev, wate Celadet amaje bi karekî berawirdiyê kiriye.

Lê belê tiştê ku Celadet lê digeriya ne tenê ev bû. Lewra li gorî baweriya wî, kurd neteweyeke dêrin û xwedî dîrokeke şanaz bûn û divê zarokênd kurdan hay ji vê yekê hebûya:

“Xorto! Tu çêlêyî miletekî kevin, nijadekî mezin î. Pêşiyêne te di rûpelên dîrokê, di gorinêne gernas û camêran de raketî ne. Tu kurê kurdan, neviyê Medan, dahatiyê Aryan î. Lê iro ne tu yî, dîl î, reben û belengaz, jar û qels, dewletek î û bindest î.”<sup>46</sup>

Lewma wî dixwest bi rêya destanên gelêrî û berhemên edebî amaje bi îspatkirina vê dîroka dêrin a şanaz bikira ku kurdan hişyar bike. Wate, wî dixwest ji van deqêne edebî manifestoyeke neteweyî peyda bike ku deriyê Xanî ji bo vê yekê heta bibêje bes vekirî bû. Li gorî wî, Xanî xwest ku bi rêya vê destanê hin peyamên neteweyî belav bike da ku neteweya xwe hişyar bike:

“Ji xwe herweku nas e, Xanî bi hênceta çîrokê deng li milete xwe kir û dil kir ku wî li nijad û qewmiyeta wî hişyar bikit. Ji hingê ve ji 300 salî bêtir wext di ser me ve çûne. Kesî guh neda *Memê Alan*, heta roja ku kurdîzanê hêja û bilindpaye Mr. “Roger Lescot” ew digel tercimeke frensizî gihande çapê.”<sup>47</sup>

Herweku baş tê zanîn, weşandina *Kalevalayê* di proseya avakirina neteweya finî de, karîgeriyeke mezin çêkiribû. Bi peydabûna vê destanê re statuya ziman û edebiyata finî yekser bilind bû. Xebateke wisa derketibû holê ku dewlemendiya zimanê finî nişan dida. Herweha baweriyek jî çêkir ku edebiyata finî jî, serdemeke xwe ya hêja ya epîkeke kevin, epîpeke neteweyî heye.<sup>48</sup> Dîsa em ji Prys Morgan wergirin, ev fantaziya sedsalê bû ji bo neteweyeke bindest wek kurdan û ne li ber çavan, ku kêm tiştê wê yên pesindanê hebûn, xemrevîniya rabirdûyeke serfiraz bû ku qet nikarîbû texeyula wê jî bikira.<sup>49</sup>

<sup>45</sup> Ehmedê Xanî, “Memozîn”, *Hawar*, j.45., 1942.

<sup>46</sup> Celadet Ali Bedir-Xan, “Xwe Binas”, *Hawar*, j.18., 1933.

<sup>47</sup> C.A.B., “Memê Alan”, *Ronahi*, j.23., 1944.

<sup>48</sup> Tina Karina Ramnarine, “Finlandiya’da Ulusal kimliğin Gelişimi ve Halk Bilimi” (Folklor and the Development of National Identity in Finland), (wer. Ali Erdoğan), *Bilim ve Kültür-Uluslararası Kültür Araştırmaları*, j.2., 2013, r.231.

<sup>49</sup> Prys Morgan, “Bir Ölümden Bir Bakış: Romantik Dönemde Gal Geçmişinin Peşinde”, dnd. (E.Hobsbawm&T. Ranger, *Gelenegin İcadı*, (wer. M.Murat Şahin), Pirtûkxaneya Agora, Stenbol, 2005.), r. 81-82.

Celadet jî wek Dr. Lonnröt li *Kalevala*yeke kurdî digeriya ku kurd xwe pê şanaz bikin. Lewma wî jî dabû rêya Xanî ku ev ne di nav pirtûkên nivîskî de, belku li ser zarêr gel peyda dibû:

“Me kurdan edebiyateke nivîskî, ji çend klasikan pê ve hesêb nîne. Lî me edebiyateke xelkê a welê heye ku ew li nik kêm miletan peyda dibe. Ji vê edebiyatê re folklor dibêjin. Belê folklorâ kurdan ewçend mezin û fireh e ku em pê dikarin îftixar bikin û di nav xelkê de serfiraz bigerin.”<sup>50</sup>

Celadet li cihekî rast li vê digeriya. Bêguman, ew *Kalevala* jî *Memê Alan* bû, ne berhemeke din. Herçî Ehmedê Xanî bû, wî jî xwe bi *Memê Alan* nemir kiribû ne bi fesaneyeke din. Lewma Celadet gelekî giringî dida Ehmedê Xanî, ew weku “mezinê kurdan”, pirtûka wî jî weku “pirtûka neteweyî” dizanî.<sup>51</sup> Çunku wî ev berhema xwe ne li ser jêdereke biyanî, belku li ser binemaya çirokeke kurdî ya resen nivîsibû.

Wate, cihê rastiyê bû ku kêm tiştên kurdan ên nivîskî hebûn bo xwe pê şanaz bikira. Belam ji bo ku kurd xwe di nav neteweyê cîhanê de kêm nebînin û serfiraz bigerin, epîka dêrin *Memê Alan* dihat hawara wan.

Wisa xuya dike ku handêrên Dr. Lonnröt û rewşenbîrên galî ci bin, ya Celadet heman tişt bû.

#### ENCAM

29

Nûnerê herî giring ê “Nifşê Hawarê” bêguman Celadet Alî Bedir-Xan e. Wî ew titşt anîne cih ku kesên wek Kurdiyê Bitlîsî, Kemal Fewzî, Law Reşîd, Memdûh Selîm Beg ên ji nifşê beriya wî, ji nebûn an kîmasiya wan gazind dikirin. Herweku xuya dike, Celadet Alî Bedir-Xan giringiyeke awarte daye bo berhevkirin, tomarkirin û polînkirina folklorâ kurdî. Weku kurdekî, yekem car ew kereste, pênase û polîn kirine. Wate Celadet, bi metodê zanistî tevgeriyaye. Peyva “folklor”ê bi kar anîye û wek “guharto”, “zanista xelkê”, “berhevan”, gelek zaraveyê nû çêkirine. Lewma em dikarin wî weku danerê zaravenasiya (termînolojiya) folklorâ kurdî qebûl bikin. Wî jî wek neteweperwerê romantîk, gel weku “saf, paqîj û resen” qebûl kirîye, lewma her dem xwestije ku berhemên gelêri ji devê dengbêj û çîrokbejê kurd tomar bike. Wî ji bo geşekirin û xurtkirina nasnameya kurdî ya neteweyî û bidestxistina mafêñ kurdan ên neteweyî, keresteyê folklorê yên herî guncav dîtine û lewma herdu weşanê xwe (*Hawar* û *Ronahî*) kirine wek embara folklorâ kurdî. Di şertên bêdewletbûniya kurdan de eger ev weşan weku arşîv û muzexaneyê kurdan werin hesibandin, hingê ew jî damezirînê û rêveberê vê arşîv û muzexaneyê ye.

<sup>50</sup> C.A.B., “Memê Alan”, *Ronahî*, j.23., 1944.

<sup>51</sup> Ehmedê Xanî, “Memosîn”, *Hawar*, j.45., 1942.

## ÇAVKANÎ

- Bavê Cemşîd û Sînemxanê, “Navênd Kurdmancî”, *Hawar*, j.31., 1941.
- Bedir-Khan, Celadet Alî, “Merhele”, *Roja Nû*, j.1., 1943.
- Bedir-Khan, D. A., “Le Folklore Kurde (Dengbêj-Çîrokbej-Sazbend-Blûrvan)”, *Hawar*, j.4., 1932.
- Bedir-Khan, D. A., “Le Folklore Kurde”, *Hawar*, j.3., 1932.
- Bedir-Khan, D. A., “Memê Alan”, *Hawar*, j.5., 1932.
- Bedir-Xan, Celadet Alî, “Kürt Edebiyatı: Zîn û Mem-1”, *Serbestî*, j.491., 1919.
- Bedir-Xan, Celadet Alî, “Kürt Edebiyatı: Zîn û Mem-2”, *Serbestî*, j.495., 1919.
- Bedir-Xan, Celadet Alî, “Xwe Binas”, *Hawar*, j.18., 1933.
- C.A.B., “Memê Alan”, *Ronahî*, j.23., 1944.
- Cewerî, Firat, *Hawar 1, Hejmâr 1-23 (1932-1933)*, Nûdem, Stockholm, 1998.
- Ehmedê Xanî, “Memozîn”, *Hawar*, j.45., 1942.
- Evdilmesîh Wezîr., “Mem û Zîn Temaşeke Kurdî e Abadîn”, (wer. C.A.B.), *Ronahî*, j.23., 1944.
- Ferhengvan, “Ferhengok”, *Hawar*, j.30., 1941.
- 30 Hassanpour, Amir, *Kürdistanda Dil ve Milliyetçilik (1918-1985)*, (wer. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan), Weşanên Avesta, Stenbol, 2005.
- Hawar, “Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê”, *Hawar*, , j.1., 1932.
- Hawar, “Buts et Caractères de la Revue *Hawar*”, *Hawar*, j.1., 1932.
- Hawar, “Dersxane”, *Hawar*, j.17., 1933.
- Hawar, “Stûna Xwendevanan”, *Hawar*, j.29., 1941.
- Hebeş, Husêن, *Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de*, Belavgeha Hogir, Bonn, 1996.
- Herekol Azîzan, “Çira Zanînê”, *Ronahî*, j.28., 1945.
- Herekol Azîzan, “Çîrçîroka Bîngolê”, *Hawar*, j.11., 1932.
- Herekol Azîzan, “Du Guharto”, *Hawar*, j.14., 1932.
- Herekol Azîzan, “Ji Eşîrên Botan: Jêliyan”, *Hawar*, j.34., 1941.
- Herekol Azîzan, “Lavijên Mîr Miheme”, *Hawar*, j.29., 1941.
- Herekol Azîzan, “Mişo û Xido”, *Hawar*, j.7., 1932.
- Herekol Azîzan, “Newrûz”, *Hawar*, j.42., 1942.
- Herekol Azîzan, “Siyabendê Silîvî”, *Hawar*, j.13., 1932.
- Herekol Azîzan, “Zilamek û Zimanek”, *Hawar*, j.40., 1942.
- İşik, Mehmet Kemal (Torî), *Ünlü Kürt Bilgin ve Birinci Kuşak Aydinlar*, Weşanên Sorun, Stenbol, 2000.
- Kılıç, Hazim, *Mîr Dr. Kamiran A. Bedir-Xan, Stêr*, Weş. Xanî&Bateyî, Danmark, 1992.

- Morgan, Prys, "Bir Ölümden Bir Bakış: Romantik Dönemde Gal Geçmişinin Peşinde", dnd. (Eric Hobsbawm&Terence Ranger, *Geleneğin İcadı*, (wer. M.Murat Şahin), Pirtûkxaneya Agora, Stenbol, 2005).
- Nivîsanoka Hawarê (Celadet Alî Bedir-Xan), "Heyîneke Yeksalî", *Hawar*, j.20., 1933.
- Önen, Ronayi, "The Role of Language in the Discursive Construction of the Kurdish Nation: A Case Study on the Kurdish Periodical *Hawar* (1932-1943)", Nameya Masterê ya Neçapkirî, Enstîtuya Zanistên Civakî, Zanîngeha İstanbul Bilgi, Stenbol, 2012.
- Özoğlu, Hakan, *Dewleta Osmanî û Neteweperwerên Kurd*, (wer. Ali Karadeniz), Weşanxaneya Kitap, Stenbol, 2012.
- Ramnarine, Tina Karina, "Finlandiya'da Ulusal kimliğin Gelişimi ve Halk Bilimi" (Folklor and the Development of National Identity in Finland), (wer. Ali Erdoğan), *Bilim ve Kültür-Uluslar arası Kültür Araştırmaları*, j.2., 2013.
- Sagniç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdi*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2014.
- Smith, Anthony D., *Millî Kimlik*, (wer. Bahadır S. Şener), Weşanên İletişim, Stenbol, 2014.
- Stranvanê Hawarê, "Ji Memê Alan: Lehîstika Şetrencê", *Hawar*, j.36., 1941.
- Xwediyê Hawarê, "Ehmedê Zeydan", *Hawar*, j.26., 1935.
- Xwediyê Hawarê (Celadet Alî Bedir-Xan), "Sê Tarîxên Hawarê: 15 Gulan 1932, 15 Tebax 1935, 15 Nisan 1941", *Hawar*, j.27., 1941.
- Yıldırım, Kadri&Pertev, Ramazan&Aslan, Mustafa, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorâ Kurdi*, Weşanên Zanîngeha Mardin Artuklu, 2013.





## FOLKLOR Û AFIRANDINA ÇANDA NIVÎSKÎ

Avdo KARATAŞ\*

### KURTE

Civakên cihanê dikarin wek civakê xwedî çandê devkû û yên nivîski werin cudakirin. Ev herdu kategorî ne tenê di mijara çandê de alavên analîzê derdixin holê, lê li gora vê kategoriye, jiyan, ziman, wêje, têgîhiştin, mejû, pevguhazî û hwd. yên herdu cureyên civakan jî dikarin werin analîzîkirin û ji hev werin cudakirin. Dema ku mirov berê xwe dide civak(ên) Kurdan, derdikevê holê ku bi piranî heta dawiya sedsala 20an bi gelemerî xwedî ziman û çanda dengî bûn. Ev rewş her diçe tê gubertin û Kurd xwe vedigerînin ser ziman û çanda nivîski. Bi wî awayî wateya nivîs û teksîn nivîski di nav civaka Kurd de zêdetir dibe; hafizeya Kurdan xwe ji *hafizeya demekirine hafizeya demdirej*. Bi vê yekê ji pêkan dibe ku çand û zimanê Kurdi dîjitalize bibe. Ev rewş ji bo civakên sivil yên cihanê ji mêv ve hatîye girtin, lê belê li cem Kurdan hê aktuel e û pêşketinêن pir girîng di mijara nivîse de derdikevin holê. Di vê gotarê de ev mijar bir kurtasi di ber çavan re tê derbaskirin û tê angastkirin ku xebat, lêkolîn, lêgerin û berhevandanen folklorîk alîkariyek mezin di warê geskîrîna çanda nivîski de didin. Bi lêkolînen folklore çanda devkî vedigere çanda nivîski, hafizeye çandê ji dengî dibe nivîski, çand û ziman tên arşîvkirin û bi runiştina çanda nivîski civak ji bingehî ve tê gubertin. Weki mirov cudadîyên çanda devkî û nivîski dide berhev, derdikevê holê ku ne ya tê bikaranîn lê çanda hatî nivîsandin û dokumentekirin folklora geleki ye.

**Peyvîn sereke:** Çand, çanda devkî û nivîski, folklor, hafize, kurdoloji

### ABSTRACT

*"Folklore and Producing Written Culture"*

The world's societies can be distinguished between as the societies that possess a written and spoken culture. This categorisation not only offers the opportunity to analyse the culture, but also includes being able to differentiate between and analyse the two societal forms in terms of their ways of life, languages and literature, interpretative and narrative patterns, as well as their forms of communication. When observing the Kurdish population, it is apparent that until the end of the 20th century, the oral culture prevailed. This situation has constantly shifted, and the Kurds are progressing towards a written language and culture. As a result of this, the importance of writings and written works develops, and the Kurdish memory shifts from the short to the long term and provides the basis for digitalizing the Kurdish language and culture. This process has long since disappeared from civil society but is still very much applicable amongst the Kurdish population, and significant topics are appearing in the written field. This article briefly presents this topic and alleges that the work, research, investigation and collection of folklore greatly supports and stimulates the written culture. Folklore research enables oral culture to change to a written culture, and the cultural memory likewise changes from oral to written. The culture and language are archived, and the establishment of the written culture fundamentally changes the society. The comparison between oral and written cultures demonstrates that Christianised and documented culture first and foremost makes the folklore of a population, not the practised culture.

**Key Words:** Culture, oral and written culture, folklore, memory, kurdish studies

\* Xwendekarê doktorayê li Zangoya Albert-Ludwig li Freiburg (Elmanya); Mamosteyê Kurdi û Pedagog e.  
e-mail: [avdokaratas2@gmail.com](mailto:avdokaratas2@gmail.com)

## DESTPÊK

Di hemû zanistan de rîbazeke giştî heye ku ji bo mijarek baş were têghiştin bi awayekî giştî ew mijar tê kategorîzekirin. Civakên cîhanê wek çand û zimanê cîhanê ji hev cuda ne. Kategorizekirina wan civakên li ser ruyê dinê mijarek ne hesanî ye. Di warê aboriyê de ev kategorizekirin bi vî awayî ye: *civakên geşe dibin* (Entwicklungsländer), yên *bî dest pişezasiyê dikin* (Schwellenländer), yên *xwe diguherin* (Transformationsländer) û yên *pişesazî* (Industrieländer) ne (bnr. Münch 2005; Wallerstein 1999). Di mijara rîveberiya siyasi de wek demokratik, monarşik, oligarşik, federal û hwd. têb binavkirin (bnr. Wuthe 1981). Di mijara civaknasiyê de civakên segment, yên kevneşopî, yên modern û hwd. hene (bnr. Weber 1980; Mühlmann 1985). Gelek caran jî cîhan bi dualyan tê kategorizekirin; wek *civakên rojavayî* (the west) û *yên din* (the rest) an jî oksîdent û orient (bnr. Said 1995). Di mijara hilbirandine de wek *civakên hilbîran* û yên *konsument* ji hev têb cudakirin. Civak gelek caran li gora karakterê çanda wan jî têb kategorizekirin. Bi gelemerî civakên dînyayê di vê mijarê de wek, *civakên devkî* û *civakên nivîskî*<sup>2</sup> têb dabeşkirin. Her çiqas di dema postmodern de civakên dijital werin guftûgokirin jî (bnr. Anderson 1997), hê cihê xwe di mijara zanyariyê de taze negirtine. Her wiha ev cureyên civakan karin wek pêşketina civaka nivîskî werin nirxandin. Her çiqas hinek dijî derkevin jî, karakterên civakên nivîskî ji yên devkî ji bingehê ve cuda ne (bnr. Ong 1995). Dema ku mirov li van civakan dinere, peyt dike ku ev civak bi gelemerî xwedî dîrokeke nivîskî ne, di kategoriya cîhana rojava (westliche Welt) da ne, xwedî pergela demokratik in û devletên pişesazî ne (bnr. Robinson 1996; Assmann & Assmann 1998). Dîrok û rewşa pergala pêşketina civakan dide xuyakirin ku civakên bi çanda devkî bi ser çanda nivîskî de diçin, ji zimanê devkî ber bi zimanê nivîskî de diçin û proses ne vajîyê vê rewşê ye (Assmann & Assmann 1998: 26). Lê belê di demêñ dawî de dengê kesêñ vê angaşte naejirenin û wateya zimanê devkî pêşve didin, bilind dibe (bbh<sup>3</sup>. Robinson 1996; Gody û yd. 1986; Assmann & Assmann 1998). Dîsa jî ev nayê wê wateyê ku têkiliyek di navbera pêşketinê û çanda nivîskî de tune ye.

Karakterên civakan û awraza çandêñ wan bi hev ve giredayine. Ev girêdan xwe bi hafize, nasname, pevguhazî dide naskirin û cudakirin (Halbwachs 1967; Assmann & Assmann 1998). Çanda nivîskî bi dîrok, cure û bandora xwe ve afirandineke mirovatiyê ya herî muhîm e. Mirovatî bi hebûna çanda nivîskî, têghişti çanda devkî bûye. Her çiqas çanda devkî ji çanda nivîskî kevintir jî be, wateya çanda devkî bi derketina nivîsê ru daye û bûye mijara lêkolînê çanda nivîskî. Anko folklor li ser cureyên çanda devkî, wek çîrok, efsane, mîtolojî, pêkenok û hwd.

<sup>2</sup> Ji bo vê mijarê bnr. Ong 1995; Halbwachs 1967; Robinson 1996; Goody û yd. 1986; de Souza 1989; Assmann & Assmann 1998; Assmann û yd. 1983; Gumbrecht 1983; Gadamer 1983. Kurtasiya 'û yd.' di wir de tê wateya 'û yên din' ji dîvla kurtasiya latînî 'et.all' hatiye bikaranin.

<sup>3</sup> bbh wek kurtasiya 'bide ber hev' ji dîvla kurtasiya Elmanî 'vgl.' hatiye bikaranîn.

lêkolîn dike, wan arşîv dike û diweşîne û bi vî awayî civakê dike xwedî tekstên nivîskî. Tekstên nivîskî yên dîrokî yên wek Ilyada û Odessa çanda devkî ya wê demê bûn (bnr. Assmann 1983). Lêkolînen çanda devkî ku di bin zanyariya folklorê de têن kirin, pirseke bingehîn derdixê holê, gelo çi têkiliyên folklor û çanda nivîskî bi hevdu re hene? Gelo wekî gotin were nivîsandin wê bandorê bide civakê ku xwe wergerenê ser çanda nivîskî? Ji bo ku bingeha wan xalan werin guftûgokirin, pêwîst e, were diyarkirin, gelo karakterên civakên xwedî çanda devkî û nivîskî bi mijara gotin û nivîsê re çilo giredayîne, hafizeyên wan civakan çilo tên konstruktekirin û pevguhazî çilo tê kirin? Du besên zanistî di vê mijarê de derdikeyin holê ku yek jê folklor, ya din jî filolojî ye. Ev herdu bes bi gelemerî ji bo gel bi xwe ne.

Kurd hem xwedî çandeke mezin ya devkî ne û hem jî xwedî yekuneyeke mezin ya nivîskî ne. Wekî mirov wêjeya bi Kurmancî, Soranî, Hewremanî, Lûrî, Dimilkî bide berhev yekuneyeke pir gire derdikeyê holê, lê belê ev lîteraur heta niha di konteksta filolojî de nehatiye berhevkirin. Ev herdu bes jî di konteksta Kurdan de nû ne û bi gelemerî di bin navê Kurdolojî an jî Lêkolînen Kurdî (Kurdish Studies) de tên kirin. Yanî peywira filolojiya Kurdî ji aliyê Kurdolojî ve tê bicikirin. Kurd û lêkolînen zanyarî mijara arîsheke pir giriftî ye. Çiqas mirov nikaribe behsa beşek filolojiya runiştî ya Kurdan, wek Anglistik, Germanistik, bike jî, Kurdolojî hewl dide vê kêmasyiyê çareser bike. Di vir de hêjayê gotinê ye ku Kurdolojî bi filolojî re, lêkolînen çand û jiyanâ Kurdan jî digirê ser xwe û bi vî awayî jî ji sînorêñ filolojî derdikeye. Yanî Kurdolojî xwe ji aliyekî ve bi xebatêñ folklorik, û ji aliyê din ve bi yên filolojik, yên zanistiya çandî (Kulturwissenschaft) û civaknasî ve girê dide. Ji bo vê yekê mirov dikare bêje ku hemu xebatêñ lêkolînkirina çand û zimanê Kurdî di heman demê de bîhêzkirina Kurdolojî<sup>4</sup> bi xwe ye. Têkiliya Kurdolojî û folklorê jî ji vir tê. Cudatiya Kurdolojî û besên din yên wek Gelnasî (Ethnologie), Mirovnasî (Anthropologie), Civaknasî (Soziologie), folklor an Etnografya ev e ku Kurdolojî lêkolînan di warê Kurdayetî<sup>5</sup> de dike. Yanî zanyariyê ji bo Kurdan dike. Armanceke girîng ya Kurdolojî ev e ku hewl didê çanda nivîskî di nav Kurdan de bi zimanê Kurdî xurttir bibe. Ji bo vê yekê lêkolînen Kurdolojî pir girîng in. Li cem Kurdolojî, folklor jî bi bingeha xwe ya Kurdevarî arîkariyek girîng dide lêkolînkirina Kurdan. Ji xeynî wan xalan pêwîst e were gotin ku folklor li dijî asîmîlasyonê derdikeyê (bnr. Alxasî 2003) û xwenasiyê di nav gelê Kurd de xurt dike. Folklor qeydkirina çanda devkî, şenber û razber ya Kurdî ye. Bi vî aliyê xwe arîkariyê dide çanda Kurdî ya devkî ku bibe çand û zimanê nivîskî.

Di vê gotarê de têkiliyên folklor û çanda devkî û nivîskî dê li ser van angaştan were guftugokirin; 1) folklor bi lêkolînen xwe çanda nivîskî û bingeha lîteratura

<sup>4</sup> Her çiqas têgineyek sitandard ji bo Kurdolojî nebê jî, Kurdolojî beşa zanyarî ya çand, ziman, dîrok, nivîs, kevneşopî û jiyanâ Kurdi ye bnr. Bayrak (2004); Kren (2000).

<sup>5</sup> Ji bo Kurdayetî bnr. Franz (1968); Nebez (1972).

Kurdolojî xurt dike; 2) folklor ne kevneşopî an çanda devkî ya di nav gel de tê bikaranîn e, lê folklor çanda hatî nivîsîn û dokumentekirin e.

Ji bo bingeha van angaştan di serî de dê behsa peyva folklorê, bi gelempêrî di mînaka elmanan de, were kirin. Piştre dê çarçoveya peyva çandê were guftûgokirin ku di beşa din de wek ya devkî û ya nivîskî were gûftogokirin. Li ser bingeha lidarxistina wan beşan wê hinek nerîn li ser folklorâ Kurdî jî werin nîqaşkirin.

### FOLKLOR Û TÊGIHİSTINA ÇANDÊ

Peyva folklorê ji peyva "folk" (gel) û "lore" (zanîn/zanist) pêk tê. Wekî herdu peyv têne cem hev, wateyek "zanistiya gel" dide û di Kurdî de jê re gelek caran "gelêri" jî tê gotin. Folklor beşek zanyarî ye ku ne tenê li ser edebiyata gelêrî û zanistiya gel radiweste, lê her weha li ser jiyana rojane ya gelekî bi dîrokî jî lêkolînan dike (bnr. Hartmann 2001; Wiegelmann û yd. 1977).

Peyva folk pirrengî ye, *vulgaris, populus, plebs, natio, gens, ethnus, demos, laos* ji vê peyvê tê. Ji bo vê yekê pêwîst e her car *gel* û *çanda gel* werin pênasekirin. Di zanyariya folkorê de gel wek "*mirovén normal*" an ji wek mirovên di *çîna bin* an a *navîn* de yên wek *mirovén salgir* (einfache Menschen) tê fehmkirin. *Çanda gel* jî peyvek bipirsgirek e. Wek mînak, di vê angaştê de ne diyar e, gelo ev çand, ji aliye gel ve hatiye afirandin, an jî ji derêن din hatiye? Bi gelempêrî çanda gel wusa tê pênasekirin; çanda gel ev e, ya ku gel xwedî lê derdikeve an bikar têne. Lê belê di vir de *çanda rojevî* û *çanda gel*/tevlîhev dibin (Gerndt 1997: 26).

Folklor wek beşek zanyarî ji aliye Ewrupiyan ve ji bo 'lêkolînkirina gelên xwe' hatiye afirandin. Di destpêka xwe de vê beşê li Ewrupa bi gelempêrî *çîna navîn* û ya *bin* lêkolîn dikir (Wiegelmann û yd. 1977: 9). Balkeşîyeke vê beşê ev e ku bi gelempêrî ne ji aliye zanyarêni biyanî ve lê ji aliye zanyarêni "xwecilî" ve tê bikaranîn; wekî ji aliye zanyarêni biyanî ve tê kirin, ev yek bi gelempêrî wek gelnasî (etnoloji) tê binavkirin.

Her çiqas were gotin ku ev peyv bi wateya *zanistiya gel* cara yekemin ji aliye William Thomasî (1803-1885) ve di sala 1846'an de di kovara *Athenaeum* de hatiye bikaranîn jî, destpêka folklorê dirêtir e. Gelek zanyar dîroka folklorê heta *serdema navîn* (Mittelalter) bi gelempêrî heta salên 1500'î paşve dibin (bnr. Wiegelmann û yd. 1977: 9). Li Elmanya di serî de ji 1750 heta 1870'yî lêkolînen folklorê di beşa *Zanyariya Dewletê* (Staatswissenschaft) de hatine kirin. Mesela di dema xwe de bijşkan lêkolîn li derdora xwe dikirin û wusa *nexşa nexweşiyê* derdixistin (Wiegelmann û yd. 1977: 15). Lêkolînen vê demê ji bo vê yeke bi heman rîbazê, heman encamê, bi heman *pîvangîn hilbijartînê* (Auswahlkriterien) dihatin kirin (Wiegelmann û yd. 1977: 10). Beşa folklorê di daviya sedsala 19an de xwe bi tewahî sazîdar kir. Êdî bûbû zanisteke bingehîn.

Wek li jor hatiye gotin, zanyarên folklorê bi gelemerî lêkolina gelê xwe bi xwe dîkin û ji bo vê yekê folklor gelemerî bi ramana *emîk*<sup>6</sup> tê kirin. Ji bo vê yekê dewlet pir qiymet didin lêkolînê folklorî. Wek mînak, hê jî li herema zimanê Elmanî de di 23 zanîngehan de besê folklorê (Volkskunde) bi navê cuda yên wek Gelnasiya Ewrupî (Europäische Ethnologie), Mirovnaşıya Çandê (Kulturanthropologie), Zanyariya Çandê ya Empîrîk (Empirische Kulturwissenschaft) hene. Perspektîfa beşa gelnasî û folklor heman bû, tenê cudatî di mijarê de dihat danîn. Wekî lêkolîn li derveyî Ewrupa dihatin kirin, xebatên gelnasî bûn, lê wekî li Ewrupa dihatin kirin, folklor bû. Ji bo vê yekê bi dema nû re navê folklorê bû Gelnasiya Ewrupî (Europäische Ethnologie) (Kaschuba 1999; Wiegelmann û yd. 1977). Pişti yekuneyek lêkolînê li derveyî Ewrupa hatin kirin, zanyaran dît ku bi hatina modernîzmê çanda kevneşopî ya gelên wan ji erdê radibe û dest pê kirin ku bala xwe bidin ser gelê xwe û bi wî şeklî jî folklor derket holê. Hingî mijara folklorê fereh e, pêgav mane binbeş werin afirandin, yên wek *Lêkolînerên Malê* (Hausforscher), *Lêkolînerên Zargotinê* (Erzählforscher), *Lêkolînerên Bastaniyê* (Brauchforscher) (bnr. Baumhauer 2001; Wiegelmann û yd. 1977: 10). Folklor ji aliyê dêrê ve jî hatiye kirin û endamên dêrê di berhevkirina kevneşopîyan û arşîvkirina gotinê devkî de rolekî girîng liyîstine.

Folklor her dem li ser wan tiştên ku mirov li ser pir nafikire, bala mirovan nakişîne, lê belê di jiyana wan de her dem cih digire, lêkolînê xwe dike. Folklor her demî dipirse, gelo çîma ev awraza (form) çandî û ne awrazeke din derketiye holê? Gelo mirov di demê xweş û di demê nexweş, wek deme xelayê, de çi dîkin? Ji bo vê yekê folkora xelayê heye. Folklor dipirse, gelo çîma mirov îro jiyana xwe wusa bi rê ve dibin û berî 100 salî çilo bi rê ve dibirin? Mirovên mêt, jin, hêjar, dewlemend di rojê kar, yên betlanê de, li gund, li bajêr çi dîkin û dikirin? Çilo û ji bo çi kar dîkin, berê çilo kar dikirin, xwe çilo têr dîkin (Ernährung) û çi li xwe dîkin, çi dibêjin, kijan sitranan dibêjin, çilo bicîh dibin, çilo bawer dîkin? Pirsgirekên şer û zextan çilo sererast dîkin, kijan şahiyan dîkin û jiyana bi hevdu re çilo derdikeve holê? (Gerndt 1997: 25). Yanî folklorê çand û jiyana kevneşopî kiribû mijara lêkolînê xwe.

Hê di destpêka 1930î de hinek zanyar li dijî pêvajoya folklorê wek beşek zanistî derdiketin û rîbazên wê guftûgo û rexne dikirin. Li gorî wan zanyaran folklor herdemî bi ramana kevnî dihat kirin, nerîna xwe tenê berdide ser çanda kevin. Li himberî vê yekê wan zanyaran daxwaza folklorâ dema nû kirin (Wiegelmann û yd. 1977: 30-31). Bi wan rexneyan di beşa folklorê de nerînê nû derketin holê û daxwaz kirin ku divê ne xanî lê *rûniştin*, ne cil lê *lîxwekirin*, ne çîrok lê *gotin* werin lêkolînkirin (bnr. Wiegelmann û yd. 1977: 30). Vê perspektifê nerîna lêkolînê

<sup>6</sup> Di lêkolînan da du cureyên nerînê lêkolînê hene. Wekî zanyarek mijarek an civakek biyanî lêkolîn bike, nerîna wî *etîk* (etische Betrachtung) e. Wekî zanyar li ser mijareke ji çand û civaka xwe bi xwe lêkolînê bike, jê re *emîk* (emische Betrachtung) tê gotin.

folklorê fereh û kurtir kir. Ji ber vê yekê xebatêni di bin mijara lêkolînên jiyana gel (folklife studies) de têni kirin jî wek xebatêni folklorê têni dîtin. Di beşa folklorê de teoriyêni herî behtir hatine bikaranîn *ketinêni jîndarêni çandî* (Gesunkene Kulturgut), *lêkolîna wargehêni çandî* (Kulturraumforschung) û *teoriya du-çînî* (Zweischichtentheorie) ne.<sup>7</sup> Lê belê sistematika rîbazeke ku ji bo herkesî be, tune ye. Cureyêni rîbaza li gorî cureyêni pîrsîrîna mijarî (Fragestellung) têni bikaranîn. Ji bo vê yekê her rîbaza nikare li her pîrsa mijarî were bikaranîn. *Rîbazbeş* (Fachmetodik) her demî bi teybetiya beşa xwe ve giredayiye. Ev prensîp li gora mantikê tê hilbijartin û bikaranîn (Gerndt 1997: 40).

Ji hinga ku tê îddiakirin ku di cihanê de; pergala civakî, zanistî, çand û jiyan a dema moderne bi davî hatiye û pişî salêni 1960î pergaleke nû bi navê *postmodernîzm*, an *moderna didoyê* (Zweite Moderne) (Beck 1996; 2010) derketiye holê, folklor jî di nav de, hemu besen zanistî xwe ji nû ve terif kirin, rîz, azîne û mijarêni lêkolînên xwe jî ji nû ve sererast kirin (Bachmann-Medick 2007). Ji hingî ve di folklorê de jî, wek hemû besen giyanî, civakî, mirovî yêni zanistî de, rîbaza curbecur têni bikaranîn û ne weke dema lêkolînên di bin zanyariya dewletê de dihatin kirin, bi yek rîbazi têni kirin.

Çawa têkiliye di navbera gelnasî û kolonyalizmê de hebe, têkiliye di navbera netewebûn û folklorê de jî heye. Folklorê li ser ramana netewî ya îdeolojiya gelbûna germaniyan bandor kiriye û her weha vê yekê jî bandor li ser folklorê bi xwe kiriye (bnr. Wiegelmann û yd. 1977). Ev bandora romantîzmê heta destpêka sedsala 20an li Elmanya di Volkskunde (folklor) de raser bû. Vê bandorê beş bi qiyimet kir, nêrin û armancêni folklorê berfereh kir, jêderk bi ramanake rexneyî bi kar anî, berhevdanek mezin û sîstematiq ya kevneşopiyan pêk anî, rîbaza bi bingeha liberhevdan bi kar anî (Wiegelmann û yd. 1977: 19-20).

Ji ber ku folklor ji aliyê ewrupiyan ve hatiye afirandin, zimanê folklorê jî li cihanê zimanê Ewrupî, yêni Fransî, Îngilîzî, Elmanî û Rusî ye (Wiegelmann û yd. 1977). Li Elmanya Birayêni Grimm, li Îngilîstanê James George Frazer, li Fransa Arnold Van Genep, li Italya Giuseppe Pitré; li Danîmarka Hans Cristian Anderson (bi Elmanî nivîsiye), li Emerîkaya Bakur Franz Boas di wî warî de zanyarêni bi nav û deng in. Gelêni cihanê yê ji derveyî Ewrupa, teorî, rîbaza, azîn û nerînêni wan zanyariyan bi kar tênin.

Folklor her demî di navbera *çanda bilind* (Hochkultur) û *çanda gel* de bû. Îro di navbera çanda gel û ya populer de ye. Gelek caran têkiliye di navbera *gelên pirhijmar* (Mehrheitsgesellschaft) û *gelên kemhijmar* (Minderheit) jî dîbin mijara lêkolînên folklorensan.

<sup>7</sup> Ev tezê zanyarê Elman, yê Naumann e. Li gorî ve teoriyê *çîna navîn* ji bo xwe alavêni çandî diafirîne û wekî pişî demekî yeke din ya nû afirand, ya kevin dide *çîna bin*. Bi wî awayî çand di nav gel de belav dibe (bnr. Wiegelmann û yd. 1977: 39).

Di sala 1974an de li Elmanya di mijara pirsgirekên folklorê de nêvenga lêkolînên folklorê berfireh kirin (Gerndt 1997: 26). Babetê wek *pêvajoya çandî* (Kulturprozess) û *çanda aborî* (Kulturökonomie); *serdestî û çand* (Herrschaft und Kultur); *kevneşopî û guhertin* (Tradition und Wandel); *cihwara çandî û nasname* (Kulturraum und Identität); *çanda cemawer û çanda jêrî* (Massenkultur und Subkultur); *pîsesaziya çandî û behredariya afîrandinê* (Kulturindustrie und Kreativität); *navbeynkarî û pevguhazî* (Vermittlung und Kommunikation); *kom û takekes* (Gruppe und Individuum); *norm û tewger* (Norm und Verhalten); *enkulturasyon û akkulturasyon* derketin holê û rê ji bo şirovekirina çandê hate wekirin.

Berî ku mirov mijara çanda devkî û nivîskî bide berhev, pêwîst e, peyva çandê were guftûgokirin. Têghiştina têbinya çandê, ramana li ser folklorê bersînor dike, ji bo vê yekê jî pir girîng e were vegotin, gelo peyva çandê ci têne zimên.

## ÇAND Û CUREYÊN WÊ

Ji aliyê pênasekirin û ji aliyê naverokê ve têgeha çandê berfireh e û dikare were gotin ku hinekî jî girift e. Lê belê pêwîst e çarçoveya vê peyvê were danîn ku girîngiya vê hem di folklor, Kurdolojî hem jî di beşen zanistî yên giyanî, çandi û mirovî de were dîtîn. Peyva çand ji peyva latînî *cultura* û ji bingeha lêkera *colere* tê û wateya wê (erd)çandin e. Peyva Kurdi *çand* (Kultur) û ya Tirkî *ekin* (Kultur) ji vê wateyê tê. Kengî di cîhanê de ev peyv cara yekemîn hatibe bikaranîn tam ne zelal e, lê belê tê zanîn ku di vextê xwe de Cicero gotina *cultura animi* (*lêmeyzandina giyanî* – Pflege des Geistes) bi kar anije (Beer 2006: 61). Lê belê ev peyv bi wateya îro di sedsala 18emîn de li Ewrupa cih girtiye. Pêşî li Elmanya û piştre gihaye Îngîlistan û Fransa yê. Îdeolojiya Elman ya romantîzm bi vê peyvê ve pir xurt girêdayî ye. Filosofê Elman Johann Gottfried Herder (1744-1803) ev peyv bi pêşketina civakan ve girêdaye û di wî warî de anije zimên û bi wî awayî têkiliya çand û nijad bi hevdu re girê daye. Nerînê Herder li ser çandê wusa ne, qaşo çand tiştek girtî ye û nayê guhertin.

Çand peyvek wusa ye ku her demî, ji aliyê herkesî ve hatiye pênasekirin. Ev rewş mijara pênasekirineke sitandartkirinê ye û kategorîzekirina wê zehmet dike. Antropolog Alfred Kroeber û Clyde Kluckhohn di sala 1952an de di pirtûka xwe ya bi navê “Culture” de 160 pênaseyên cuda yên çandê dane hev (Kroeber & Kluckhohn 1952). Gelemeperiya wan pênaseyan digihê pênaseya gelnasê Brîtanî Edward B. Tylor, yê ku di pirtûka xwe ya bi navê “Primitive Cultur” de di sala 1871 de pênasekiriye (Kohl 2000: 131) û ev pênase wek pênaseya peyva çand ya klasîk tê dîtîn. Tylor di sala 1871 û de çand wusa pênase kiriye:

“Çand an sivîlîzasyon – bi wateyeke fereh ya etnolojî ya peyvê – (...) ew yekîneyên girîftî, zanebûn, bawerî, huner, ehlaq, dadwarî, orf, adet û hemû jêhatî û hînbûnên din yêñ ku mirov wek endamê civakekî distênenê, digre ser xwe”<sup>8</sup>

Îro ev pênaseye peyvê wek kevn tê dîtin û pênaseyê din tê bikaranîn. Lê belê wekî mirov li wan pênaseyan dinerê, dibîne ku hemû hindik an gelek ji vê pênaseyâ klasîk tê. Çand wek peyv di hemu besen jiyanê de bi wateyêne curbecur tê bikaranîn.

Freise (2005: 17) modeleke ji bo kategoriyê çandê li gorî dema nû pêşniyar kiriye. Ji vê modelê re *modela çiyayê cemed* (Eisbergmodel) tê gotin û çand kiriye çar cure. Di bine vê şemayê de *çanda navxwekirî* (internalisierte Kultur) heye. Ev tiştêne wek ramana pakijiyê, awrazêne pergalê, rolêne zayendî, têgihiştina dem û mekanê, mîmîk û hwd. in. Kategoriya di ser vê re *çanda sazikirin* (institutionalisierte Kultur) e û babeten wek ziman, zagon, zewac, sexualîtet, hilberandin û hwd. digire ser xwe. Kategoriya din *çanda rojanê* (Alltagskultur) ye û ev şahîkirin, cilûberg, cîbicîkirin, xwarin û hwd. nîşan dike. Ya di ser vê re ji *çanda bilind* (Hochkultur) e, yên wek huner, şano, muzîk, wênesazî, peykertraşî, literatur û hwd. diyar dike.

Di wê modelê de mirov dikarê mijarêne folklorê ji *çanda navxwekirî* heta bi *çanda rojanê* wek mijarêne folklorê bibîne. Kategoriya çanda bilind bi gelempêrî têgihiştina civakêne modern e û çanda nivîskî herî behtir di vir de rû dide. Lê belê ji bo ku civakek bigihe çanda bilind, pêwîst e, çanda xwe ya kevneşopî nas bike. Çanda bilind bi gelempêrî di rojnameyan de, di rupela “Feuilleton” de tê lidarxistin. Wekî mirov li dîroka besen zanistêne civakî, mirovî û giyanî dinêre, dibîne ku ev peyva çand babeta etnolojiyê ye û besen din yên zanistî ev ji etnolojiyê girtine. Têgihiştina folklorê ya çandê, têgîna çand ya etnolojiyê ye. Mijara çand di lêkolînkirina zanyarî de xwe ji nivîsene din cuda dike. Di zanyarî de *pêvajoyek sistematik* (systemische Vorgehen) raser e. Di vir de divê *rastîfî* (Genauigkeit), *ewleyî* (Verlässlichkeit) û *hevgorî* (Folgerichtigkeit) hebin (Gerndt 1997: 16). Wekî mirov li xebatêne folklorâ Kurdan dinêre, dibîne ku gelek xebat ji van pîvanan bêpar in.

Çiqas kategorî û pênaseyê çandê ji hev cuda ji bin, gelempêriya zanyaran di babeta karakterêne têgîna çandê de hemfikir in. Beer (2006: 66) heft karakterê têgîna çandê tîne zimêne. Ev; 1- çand tê fêrkirin, 2- çand ser takekesî re ye, 3- çand dîrokî ye û tê guhertin, 4- çand wek yekuneyeke binyadkirî ji hînbûn û fêrbûnê pêk tê, 5- sînorêne çandê ne zelal in, 6- çand ne homojen e, 7- çand mijarek abstraksiyonê ye. Beer wan karekteran li gorî têgihiştina peyva çand ya *dema nû* bikar tîne.<sup>9</sup>

<sup>8</sup> Werger ji aliye nivîskar ve ji vê pênasekirinê hatiye çekirin: „Kultur oder Zivilisation – im weitesten ethnographischen Sinne des Wortes – (...) ist jenes komplexe Ganze, das Wissen, Glaube, Kunst, Moral, Recht, Sitte, Brauch und alle anderen Fähigkeiten und Gewohnheiten umfaßt, die der Mensch als Mitglied einer Gesellschaft erworben hat“ (Tylor 1871, ji aliye Kroeber & Kluckhohn 1952: 81).

<sup>9</sup> Ji bo karakteren peyva çandî di xebatek Tirkî de bnr. Güvenç (1991)

Wek tê dîtin, çand li gorî têgihiştina xwe dikare wek sivilîzasyon an jî wek kevneşopî were dîtin. Di vê dîtinê de çanda nivîskî wek çanda pêşketî tê têgihiştin, anko nivîs bingeha pevguhazî ye û pevguhazî bingeha civaka nûjen e (bnr. Assmann û yd. 1983). Civaka nûjen kategoriye demkî ye û karakterekê sivilîzasyonê ye. Her demî sivilîzasyonê cuda rû dane û hinek ji erdê rabûne û hinekên din cihê wan girtiye. Sivilîzasyonê berê nayê wê wateyê ku di dema nûjên a iro de jî wek sivilîzasyon werin dîtin. Wek mînak, Misir di vextê xwe de sivilîzasyonek mezin bû û berî niha bi 5000 salan xwedî nivîsê bûn, lê piştre ev nivîs bi kar neanîne (Robinson 1996: 215). Cudatiya sivilîzasyona nûjen ev e ku nivîs di pevguhaziye de bûye raser û nivîs ne tenê, wek li cem Misirî, Yunanî, Aztekî, taybetiyeke çînî ye (bnr. Assmann & Assmann 1998: 42), lê herkesê ku karibe binivîse, dikare nivîsê di pevguhaziye de bi kar bîne. Civakênu berî niha sivilîzasyonê mezin afirandî û xweyî çanda nivîskî bûn, pêkan e ku iro civakeke xweyî çanda devkî û kevneşopî bin. Alavêne pevguhazî –devkî an nivîskî- sitandartê civakênu nûjen nîşan didin. Çand di ser zîmêne dimeşe û ziman çandan ji hev cuda û nîşan dike. Yanî ziman rengê çandê dide û ziman li gorî deng an nivîs pêwîstiyêneva cuda derdixe holê. Ji bo vê yekê pêwîst e kategoriye devkî û nivîskî di mijara çandê de werin dahûrandin.

## ÇANDA DEVKÎ Û NIVÎSKÎ

Ziman di bingeha xwe de du cure ne. Ev *zimanê dengî* (Lautsprache) û *zimanê nivîskî* (Schriftsprache) ne. Ev herdu ziman ji hev gelekî cuda ne û çandênu cuda nîşan didin, xwediyê wêjeyêneva cuda ne. Pergala pevguhaziye, axaftinê, gotin û têgihiştina *dem* û *cîh* di van herdu cureyan de ji hev cuda ne. Hafizeya kollektif û kesayatî li cem herdu cureyêneva civakan cuda têne qeydkirin (bnr. Assmann 1992; Assmann & Assmann 1998; Halbwachs 1967). Berî niha bi 200 salî gelemperevi civakênu cîhanê tenê xwedî zimanê dengî bûn û ji zimanê nivîskî bêpar bûn. Hejmara wan civakan gelekî kêm bûbe jî, hê jî hene<sup>10</sup>. Guftûgoyen li jérin werin kirin, wê hewl bidin cudatiya di navbera civakênu xwedî zimanê dengî û yên xwedî zimanê nivîskî de bi kurtasî amaje bikin.

Nivîs, kodkirina dengê bi tipen şenber e (bnr. Scharlau 1989). Gotin tenê bi '*hiskirin*' ê wate distene. Gotinê devkî tenê di dema gotina xwe de hene û pişti hat gotin, bi dawî tê. Ya nivîskî bêdemkî ye û li ser *cîh* (Raum) û *demê* (Zeit) re ye. Wekî iro tekstek li Amedê hatibe nivîsandin, kare pişti 100 salen din li Uganda bi heman şeklî were xwendin. Lî belê axaftineke di dema em tê de were kirin, di dema xwe de dest pê dike û di heman demê de bi dawî tê û tu carênu din ne pêkan e bi heman şeklî were dubarekirin (bnr. Gumbert 1983; Gadamer 1983). Li gorî vê

<sup>10</sup> Ji bo mînaka serêrastkirina demêne borî, iro û pêşeroj li cem gelê Chiriguano-Guaranî yên ku heta niha di jiyana xwe de nivîs bi kar neanîne bnr. de Souza (1989).

kategoriyê jî du cureyê wêjeyê derdikevin holê. Yek jê wêjeya zimanê dengî yanî *wêjeya devkî* (Orale Literatur) ye û ya din jî ya zimanê nivîskî yanî *wêjeya nivîskî* (Schriftliche Literatur) ye (bnr. Ong 1995).

Wekî mirov li dîroka nivîsê dinêre, *pîjnivîsên*<sup>11</sup> (Keilschrift) Mezopotamya, hiyeroglîfên Misrê heta pirtûkên pîroz ên olan û belavbûna rojname û romanen tîne ber cavên xwe, wusa xuya dike ku nivîs bi gelempêrî destketiyek olî ye.<sup>12</sup> Di dîroka mirovatiyê de hinek şoreşen nivîsê rû dane. Ya yekemîn ji baweriya bi felaketên xwezayê tê. Kasta oldara, wê demê dîtinên xwezayê, yên wek baran, berf, tofan û hwd. dînivîsin ji bo ku berî werin holê, wek berbêj (Hellseher) nîşanî gel bikin. Ji bo vê yekê li rewşa xwezayê dinêrin û qeyd dikirin. Ev wek şoreşa yekemîn ya nivîsê xuya dike. Ya didoyan qeydkirina malên dihatin perestgehê (Gebetstätte) ye û bi vê şoresê re nivîs û bazirganî bi hev re hatin girêdan. Şoreşa sêyemîn bi Pexember Musa re dest pê dike.<sup>13</sup> Wekî pexemberan dest pê kirin pirtûkên pîroz binivîsin, awrazeke zimanê nivîskî sitandard kirin û şoreşekê pir muhîm derxistin holê. Şoreşa dawî bi belavbûna kapîtalîzmê cîbîcî bû û şoreşa herî mezîn di dîroka nivîsê de derxistin holê, anko nivîs cara yekemîn li nav gel belav bû (Anderson 1995). Ev jî bi afirandina çapsaziyê (Druckerei) rû da. Bi afirandina çapsaziyê û belavbûna nivîsê di nav gel de, Ewrupa xwe bi hemû cîhanê wek sivîlîzasyon da naskirin. Ji bo wê yekê têkiliya nivîs û sivîlîzasyona vê demê mijareke Ewrupî û ya modernizmê ye.<sup>14</sup>

42

Di vir de pirsek pir muhîm derdikeve holê, gelo di jiyana wan civakan de, ya ku nivîsa wan nebû, rola nivîsê çilo dihate cih? Ev rola nivîsê jî ji aliyê zimanê dengî ve hatiye dîtin û di jiyana wan de wêjeyek mezîn ya devkî peyda bûye. Ji bo vê yekê di jiyana hinek gelan de cihê zimanê dengî pir fereh e. Her çiqasî Kurdan di dîrokê de rituel û baweriya xwe di pirtûkên pîroz de, yên wek Zend Avesta, Meshafa Reş, Serencam û Zeburê Heqîqetê de, nivîsi bin jî û di demên nû de pergala kapîtalîzm di nav wan de belav bûbê jî, hê jî li gorî sivîlîzasyona iro bi gelempêrî xwedî çand, pevguhaz û wêjeya devkî û zimanê dengî ne.

Gelek kes bawer dikin ku zimanê nivîskî xwedî rêz, rêzman û binyad (Struktur) e, lê yê devkî ji wan karakteran bêpar e. Li gora *zanyariya ziman* (Sprachwissenschaft) ne wusa ye. Her çiqas zimanê nivîskî ji zimanê devkî giriftir were dîtin jî, zimanê devkî ne zimanekî be rêz û binyad e. *Teoriya konduît* (Conduit-Theory) ya ku ji aliyê Linda Dégh û Andrew Vaszony ve di sala 1975an

<sup>11</sup> Pij bi Kurdi, tişten serê wan tûj tîne zimên, nivîsa bi pijan hatiye nivîsandin, kare wek pîjnivîs were gotin.

<sup>12</sup> Li gorî Assmann û Assman (1998: 20) nivîs cara yekemîn ji bo karûbarê aborî hatiye bikaranin.

<sup>13</sup> Pirtûka cihûyan ya pîroz tewrat e û ev pirtûk bi nivîsen Homer ê Yewnanî yên bi navên İlliada û Odesa ji bo dîroka nivîsê pir girîng in.

<sup>14</sup> Ev têkilî ji filozofên wek Immanuel Kant, René Descartes, Thomas Hobbes heta teoriya rexneyê (Kritische Theorie) ya Theodor W. Adorno û Herbert Marcuse û teoriya diskurs (Diskurstheorie) ya Faucault, dekonstruktivizm (Dekonstruktivismus) ya Jacques Derrida heta Ferdinand de Saussure bi mijara ziman û sivilizasyon ve hatiye giredean, lê belê ev mijar nikarê li vir were guftûgokirin.

de hatiye pêşniyazkirin vê babetê tîne zimên (Turgut 2010: 222f). Li gorî Dégh û Vaszony gotinêñ devkî ne bêrêz in. Binyadeke van gotinan di zimên û civakê de heye û ji vê binyadê re dibêjin *konduût* (conduit). Ev konduût di navbera van mirovan de tê bikaranîn; yên xwedî sosyalîzasyoneke wekhev, yên hev fehm dikin û zanibin wateya bingeha gotinan çi ye, çi ji bo çi dibêjin û bi wan gotinan kîjan rastiyê tînin zimên (bnr. Turgut 2010: 222f). Wusa didin xuyakirin ku her çand zimanê xwe li gorî binyadekê ava dike û ev binyad bi binyada civakî ve girêdayî ne.

Nîşana cudakirina civakêñ xwedî zimanê dengî û yên xwedî zimanê nivîskî di serî de bi wêjeya wan têñ cudakirin. Wêjeya çanda nivîskî, wêjeya nivîskî ye. Cîh, dem û nivîskarê wê eşkere ye. Lê belê wêjeya çanda devkî ne wusa ye, ne jêderka wê, ne jî hilberînerê wê eşkere ye. Wekî mirov wan herdu wêjeyan dide berhev, cudatiyêñ bingehîn derdikevin holê.

Cudatiya herdu cureyêñ wêjeyan di serî de, di mijara arşîvkirinê de derdikeve holê. Berî alavêñ qeydkirinê werin afirandin, alava qeydkirinê yanî arşîv tenê mejîye mirov bû (bnr. Goody yd. 1986). Arşîva wêjeya devkî di nava zargotinê de, ya nivîskî di arşîvîn dewlet, pirtûkxanê, dêr, zanko, sazî, partî û hwd. de ye û nivîskî ye. Ev mijar bi aliyek girîng bi mijara hafizeyê (Gedächtnis) ve girêdayî ye (bnr. Assmann 1992; Ong 1995; Halbwachs 1967). Wek hafizeyâ mirov, hafizeyâ civakê jî heye (bnr. Assmann & Freise 1999; Assmann & Assmann 1998; Assmann û yd. 1983; Halbwachs 1967). Hafizeyêñ civakan bi wêje û zimanê nivîskî pir direj e û jê re *hafizeya demdirej* (Langzeitgedechtnis) tê gotin. Lê belê ya civakêñ bi zimanê dengî pir kurt e û jê re *hafizeya demkurt* (Kurzzeitgedechtnis) tê gotin (bnr. Assmann 1992). Civakêñ bi hafizeyâ demdirej mejûyê çandî dihêlin, xwe behtir nas dîkin, di tewgerêñ wan de pêş û paşeroja xwe behtir têñin ber cavêñ xwe, nasnameya wan ya kollektîf bîhêztir e, jibîkirin kêm e (bnr. Halbwachs 1967). Bi wêjeya nivîskî mejî behtir kar dike, bi nivîsê mirov behtir fikir dike. Roleke din ev e ku wêjeya nivîskî ramana rexneyî û ya perfektsiyonîzmê xurt dike. Pêşketina civakekî bi her alî ve bi rexneyê ve giredayîye û rexne xetayêñ hatin an têñ kirin, sererast dike, bingeha tevgeran (Handlung) rasyonalîze dike. Mirov her demî pirsan dike û dikeve pey bersivan. Ev jî nûjenkirina civakê pêş dixê û tiştêñ nû diafîrîne. Wêjeya nivîskî *hafizeya çandî* berfireh û kûr dike (bnr. Assmann 1992) û *hafizeya pevguhazî* (kommunikatives Gedächtnis) belav dike.<sup>15</sup> Ji bo vê yeke di civakêñ xwedî zimanê nivîskî de mirov dikare heta bi çend nifşan eslê xwe bîşopîne, lê di civakêñ xwedî zimanê dengî de mirov taze nizanîn kengî hatine dînyayê û rojbûna wan ne eşkere ye. Ji bo vê yekê civakêñ bi çanda devkî bi gelemerî dîroka xwe heta dido an sê nifşan zanîn, lê çandêñ nivîskî dikarin dîroka xwe heta bi destpêkê bîşopînin. Zimanê nivîskî di heman demê de zimên jî zîndî dihele, lê di zimanê

<sup>15</sup> Assmann û Assmann (1988: 29) mejûyê çandî û yên pevguhazî ji hev cuda dike. Mejûyê pevguhazî cihê lêkolînêñ dîroka devkî (Oral History) ye.

dengî de bi demê re peyv kevin (obsolet) dibil û winda dibil û mirov nikare wan peyvan careke din nûjen bike û careke din têxe nava zimê de. Lê belê di zimanê nivîskî de peyvên kevinbûyî, dikarin careke din werin nûjen kirin û bikaranîn.

Bi gelempêri mirov di vê baweriyê de ye ku fikrê civakên bi çanda nivîskî behtir razber (Abstrakt) e, felsefe cihê ol digirê, zanyarî cihê baweriyê digire, fikirkirin rasyonalize dibe. Ji bo vê yekê mirov kare bi hesanî rewşa civakên xwedî zimanê nivîskî fehm û şirove bike. Di dîrokê de cara yekemîn bi belavbûna zimanê nivîskî pêkan bû ku bi hijmarêne mezin mirov bi hevdu rê pevguhazî bikin û ev buyê sedem ku ramana netewebûn xurt bibe (wek mînak Anderson 1995), awraza civaka nûjen derbide (bnr. Berger & Luckmann 2007).

Wexta mirov van xalêñ jor tîne ber cavêñ xwe, kemasiya roman, arşîv, muzexane, biyografiya, etnografiya, çanda rexneyî, kemasiya alavêñ nivîskî yên dîrokî, pêşketina civaka sivil û hwd. di nav civaka Kurd de eşkere dibe. Ev jî dide xuyakirin ku hê jî çanda nivîskî bandor li ser civak, ziman û çanda Kurdi nekiriye. Rewşa civak û mirovên bi zimanê dengî, ji rewşa li jor hatî diyarkirin, pir cuda ye. Cudatiya yekemîn pêwîst e di warê ziman/axaftin/gotinê de were şirovekirin. Di pevguhaziya devkî de gelek tiştêñ nehatî gotin jî têñ têgihiştin; danûsitandina pevguhazî bi deng tê cîh û mirov dikare ji bo têgihiştinê ji xeynî deng û peyvan, alavêñ din yên wek mîmîk, jest, teşe û hwd. bi kar bîne ku ji wan re *alavêñ parazimanî* (parasprachliche Mittel) têñ gotin. Lê belê di nivîskî de ne wusa ye. Anko di pevguhaziya nivîskî de *dem û cih* di nebeqîna *vebêjer* (Retner) û *girtbêjer* (Empfenger) de, ne heman in, di nivîse de pêwîst e bi hunerek mezin ya zimêñ babet wusa were nivîsandin ku yên dixwîne, têbigijî. Ji bo vê yekê zimanê nivîskî bêgav e xwe pêş de bixe, berfereh bike, rêzan ji bo gotin û hevokan deynê, ji bo bikaribe rewşen curbecur û girîftî ser kaxizê bîne zimêñ. Ji ber vê babetê zimanê nivîskî behtir zehmet, girift û kêmxelet e. Ligel ku ji bo zimanê dengî tenê danûsitandina mirovan bes e, ji bo fîrbûna zimanê nivîskî pêwîstiya mirov bi rêz, bernamê, alav û saziyan heye.

Ji bo zimanê dengî tenê danûsitandina mirovan bes e. Wekî mirov ji zarokatiyê dest pê bike, dikare zimêñ bê zehmeteke mezin fîr bibê. Lê belê zimanê nivîskî ne wusa ye û mirov nikare bi serê xwe fîr bibê. Ji bo ferbûna zimanê nivîskî pêwîstiya mirov bi rêz, bernamê, alav û saziyan heye. Ji ber vê yekê jî dî dîrokê de her dem zimanê nivîskî ji zimanê dengî behtir qiyimet girtiye û dîtiye û di rêveberiyê de mirovên xwedî zimanê nivîskî cih girtine.

Wek li jor jî hate gotin, berî ku alavêñ qeyd/tomarkirinê derkevin, alava tomarkirinê tenê mejiyê mirovan bû. Civakên bi çanda devkî têne mejiyêñ xwe wek tomar (Speicher) bi kar dianîn; nikaribûn zanebûn û dîroka xwe di demêñ dirêj de tomar bikin (bnr. Robinson 1996). Ji bo ku tekstêñ mezin di aqlê xwe de bigirin, mirovan hinek azîneyêñ (teknik) *mnemo* afirandine. Bi alikariya wan *mnemo*'yan ku bi gelempêri bi dubarekirinê ve girêdayî ne, dikaribûn hafizeya civakê

veguhezin nifşen dahatûyê. Di wan çandan de *jêderkeke yekemîn* (Urtext) tune ye ku mirov wek referans bistîne. Ji ber vê yekê, ne xeletî, ne jî guhertin dikarin werin rastkirin. Wek hate gotin, pêjirandina gotinan ne eşkere ye û yên diaxive, ne li gorî nivîsekî an jêderkekî diaxive. Zanebûna wan gotinan ne di destê komekê de ye û malê herkesi ye. Herkes dikare stran, çîrok an efsaneyan bibêje. Bi alikariya wan azîneyên taybet mirov kare tekstên direj bîne bîra xwe û bi lidarxistinê mimetik dikare dubare bike (bnr. Assmann & Harth 1991). Bi gotineke din mirov dikare bibêje ku hafizeya çandê devkî kurt e û ev jî folklor e.

Tiştên dîrokî dikevîn nav *çanda gotiné* (zargotin) de, lê belê di serî de tişa ne pêwîst tê jibîkirin û bi vî rengî ya mayî wateyekî distîne (Assmann & Assmann 1998: 42b<sup>16</sup>). Yen mayî jî cihê xwe di rûdanê civakî yên nû de digirin û beyî ku mirov fehm bike, têne guhertin. Hilberandina axaftinê û *girtina peyxamê* (Rezipient) di heman demî de çêdibin. Ji ber vê yekê têgihiştin zû çêdibe û tişa hatî hilberandin naye tomarkirin û her tiş di *hafizeya demkurt* (Kurzzeitgedächtnis) de çêdibe. Tişteke rastî heye ku mirov dikare tenê gotinê nivîskî arşîv bike. Arşîva çandê devkî zargotin, dengbêjî, çîrokbejî û hwd. in. Lê belê di vê arşîvê de ne hesane mirov peyamê derxê holê.

Tiştekî din ku mirov di warê çanda nivîskî de bibêje ew e ku çanda nivîskî bi aliye çanda bilind ve diçê û çanda devkî jî bi ser çanda nivîskî ve diçe. Civaka ku nivîsê cihê xwe têde girt, ji binî ve tê guhertin, têgihiştina civakê behtir girift û razber dibe. Xwendin cihê gotinê digire, hafize karaktera demdirêj digire, çîrok êdî nayên gotin, têne xwendin, ziman sitandart dibe, nasnameya kolekfîf xurt û berfireh dibe, çanda rexneyî di nav civakê de cih digire, civak pêş dikeve û binyadêن aqlî derdi Kevin holê.

Wek li jor jî hate gotin, arşîva gelên bi zimanê dengî folklorâ wan e. Binyada civakê, têgihiştina jiyan û cihanê di nav zargotin û rîtuelan de hatiye qodkirin (bnr. Ong 1995; Scharlau 1989; Raible 1988). Angaşa vê xebatê ya yekemîn jî ji vir tê. Xebatê folklorîk dikarin tekstên devkî wergerînin tekstên nivîskî û bi vê vegerandinê binyada ramanê jî tê guhertin. Wek Halbwachs dibêje, tekstualîzekirina folklorê nifşen pêşerojê bi yên demên borî ve girê dide (bnr. Halbwachs 1967: 10). Gotinê gelî, folklorâ devkî ye û mijara folklorê ye. Lê belê wekî hate nivîsandin dibe çanda *gotinê* û hingî wek narratîf wateyeke din distîne. Wê gavê êdî dibe mijara *mirovnasîya çandî* (Kulturanthropologie) û jê û pêda ne di konteksta folklorê û çanda devkî de, lê wek mijareke çanda nivîskî tê şirovekirin. Ev peyama narratîf xwe digihîne mijara *weşanetiyê* (Publizistik) û êdî rîtuel dibe şano, lidarxistin dibe dirama, performansa dengbêjî dibe performansa muzîkvanan. Ev xal jî diyar dikan ku lêkolînê folklorîk çanda nivîskî xurt dikan, pevguhaziyê ji

<sup>16</sup> Li vir tipa 'b' bi wateya 'berdevamî' hatiye bikaranîn û rûpelên pişti rûpela hatî referekirin dide xuyakirin. Wek mînak '42b' tê wateya 'rûpela 42 û 43'. Wekî mirov '42bb' binivîse, hingî dibe 'rûpela 42 û rûpelên piştre tê'.

ya devkî dibin ser ya nivîskî; û, jêderk rû dide. Ji ber vê yekê jî pêwîst e ku di nav civaka Kurdî de, hê ku nifşen pîr nemirine, folklor were lêkolînkirin û cureyên çandî werin tomarkirin.

## DURBÛNA ROLA FOLKLORA KURDAN JI BO XURTKIRINA ÇANDA NIVÎSKÎ

Her çiqas nerîna li ser lêkolînen folklorê di nav Kurdan de di dema nû de zede bûbe jî, wekî mirov rewşa berhevdana folklorîk li cem Kurdan û li cem gelên din bide berhev, mirov kare peyt bike ku yekuneya berhevdana li cem Kurdan li cem ya wan gelên din pir kêm e.

Li cem Kurdan lêgerîn, berhevdan û lêkolînen di vî warî de têr kirin, ne tenê ji aliyê folkornas û zanyarên gelêrî ve têr kirin, lê ji aliyê gelek mamoste, xwendewan, karker, karmend û hwd. ve jî têr berhevkirin, nivîsandin û belavkirin. Ev mijar ji bo qeydkirina alavên devkî pêşketinek erenî ye, lê belê gelek berhemên derdikevin holê ne sistematîk in; ne li gorî rîbaz û azîneyên zanyarî têr/hatine kirin.

Mirov nikare di gotarekî de navê hemû folkornasên Kurd bibêje, lê belê ji bo ku fikirekî mirov çêbibe, pêwîst e, hinek mînakan bide. Berhevkarên girîng yên folkora devkî ya Kurdî, nivîskarên wekî Zeynelabidin Zînar, Ordînaxê Celîl, Celîlê Celîl, Celîla Celîl, Hecîyê Cindî, Eskerê Boyîk, Hîlmi Akyol, Rohat Alakom û hinek kesên din in. Di serî de pêwîst e mirov bibêje ku xebata kollektîf bi navê *Folkłara Kurdi – Jî Destpêkê Heta Niha* ji aliyan mamosteyan Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev û Mustafa Aslan (2013) derket û kemasiyek mezin sererastkir.<sup>17</sup>

Her çiqas di hinek besên din de bîbiliyografa hebin jî, hê di warê folklorâ Kurdan de bîbiliyografiyêne mezin nehatine afirandin.<sup>18</sup> Hinek pirtûkê populer yê kulîna Kurdi<sup>19</sup> jî derketine<sup>20</sup>. Ji 1980'î û vir de pirtûkê li ser bajar, bajarok<sup>21</sup>, gund û aşîretan<sup>22</sup> derketine ku di sîruşta xwe de folklorîk in, lê belê bi gelempêri bi zimanê Tirkî ne.<sup>23</sup> Ji aliye enstîtuyêne Kurdi ve yekuneyek xebat di vî warî de hatine kirin, lê belê bi gelempêri ev xebat bi weşanên pirtûkan ve sînorkirî ne û lêkolîn pir kêm

<sup>17</sup> Pir newin naskirin jî mirovêne wek Salihê Heydo, Ali Alxasî heman xebat kirine. Heydo nezîkî sê hezar sitran, çar hezar gotinêne pêşîyan, 900 çîrok û metelokêne zarakan kom kirine û 27 pirtûk veşane kirine bnr. Aryen (2012). Zînar di jiyana xwe de 123 pirtûk veşandine û bi gelempêri li ser folkora Kurdan e. Berhema Zînar ya bi navê Xwençê 10 cîl in û ji 710 perçeyêne folklorî ve pêk tê. Xebatên Mehmet Bayrak, Ramazan Pertev û mirovêne wusa pir girîng in.

<sup>18</sup> Ji bo nimûneyeke bibliyografiyaya folklorâ kurdi bnr. Keskin & Pertev (2015).

<sup>19</sup> Kulîn di vir de bi wateya 'aşxane' hatîye bikar anîn. Li herema serhedê ji aşxanê re kulîn tê gotin.

<sup>20</sup> Wek pirtûka Baba (2016) ya bi zimanê Elmanî.

<sup>21</sup> Wek xebata Dilo (2003).

<sup>22</sup> Wek mînak Ibrahimoglu (2016).

<sup>23</sup> Wek Mehmet Zakir Alp (2014): Siirt Halk Oyunları Giysileri ve Oyun Ezgileri, Siirt İl Kültür ve Turizm Müdürlüğü Yay.

in. Di demên nû de hinek panel, kongre an konferans di warê wêje, çand û folklorê de têr kirin û gotarêwan civînan têr weşandin.<sup>24</sup> Ev pêşketineke pir girîng e.

Anko folklorâ Kurdan bi aliyekî sîstematîk nehatîye lêkolînkin, di nav zimanê cîhanê de jî kêm tê naskirin. Wek mînak, di arşîva çîrokan ya zanîngeha Freiburg de tenê pirtûkek ya folklorâ Kurdan heye<sup>25</sup>. Di zimanê biyanî de lêkolînên li ser Kurdan pir in, lê yên li ser folklorê kêm in û Kurd gelempêri bi zimanê din yên heremê têr zimê.<sup>26</sup> Di warê muzexanê de pir jêderkêne nivîsi nehatine afirandin.<sup>27</sup> Çîrok, stran(bêj) li gorî beşen din yên folklorâ Kurdî behtir têr lêkolînkin û berhem têr weşandin.<sup>28</sup>

Mijara *lêkolîna nêvengî* (Feldforschung) bingeha rîbaza lêkolînkin folklorê ye. Folklor dikare di wî warî de xizmeteke mezin ji bo Kurdolojiyê bike. Hem folklor hem jî Kurdoloji pêwîst e, lêgerîn û lêkolînên bi *azîneyên lêkolînên nêveng* (Feldforschungstechnik) bikin, xebatê etnografîk derbixin holê, alavêz zimê, çand û jîyana Kurd bidin hev. Wekî li Elmania folklor gelempêri bi Germanistîk ve tê giredan (bnr. Wiegelmann û yd. 1977), Kurdoloji jî bi folklorâ Kurdan ve giredayî ye. Cudatiya folklor û Kurdoloji ev e ku Kurdoloji berhemê folklorê bi dîrok û zimê ve girê dide. Bingeha Kurdoloji Kurdayetî, ya folklorê Kurdevarî ye.<sup>29</sup> Wekî devok û diyalektê Kurdî newin berhevkirin, bingeha ferhenga Kurdi naye avêtin, arşîv nayê afirandin. Wekî çanda şenber newe berhevkirin, muzexane nayê avakirin. Çanda devkî newe lêkolînkin, çanda nivîskî rû nade, lîteratur û wêje zêde nabe, jêderkêne Kurdî xurt nabin.

Frazêñ navdêrî hem bi awayekî pêşnavdêrî hem jî paşnavdêrî têñ modifiyekirin ku modifiyekerên paşnavdêrî ji yêñ pêşnavdêrî gelekî komplekstir in. Di vê xebatê de modifiyekerên pêşnavdêrî û paşnavdêrî ji aliyê peyvrêziya xwe ve hatine vegolan. Modifiyekerên weke diyarker, çendiker, nîşander, rengdêr, temamker, frazêñ daçekî û risteyêñ peywendiyyê, sereyan modifiye dîkin û di hin rewşan de peyvrêziya wan ji ber sedemên pragmatik û fonksiyonî diguherin ku li ser vê guhertinê hêmanêñ weke prosodi, topikalîte û fokus tesirdar in. Bi taybeti dema ku ji yekê zêdetir rengdêr û temamker sereyekê modifiye dîkin li gor rewşa topikalîte û fokusê, hiyerarsiyekê semantik ava dîkin ku pozisyonâna nêzikbûn û dûrbûna sereyê û guhertina peyvrêziyyê yek ji stratejiya vê pêvajoyê ye. Ev rewşen peyvrêziya frazêñ navdêrî di vê xebatê de bi daneyêñ ji devoka Mêrdînê û bi perspektifeke tipolojik hatine ravekirin.

**Bêjeyen Sereke:** Fraza navdêrî, modifiyeker, sere, devoka Mêrdînê, kurmanciya Mêrdînê

### ABSTRACT

“Word Order in Noun Phrases (Mardin’s Accent)”

Noun phrases are modified both prenominally and postnominally and the postnominal modifiers are more complex than prenominal ones. This paper deals with these prenominal and postnominal modifiers in term of their word orders. The modifiers, such as determiners, quantifiers, demonstratives, complements, adpositional phrases and relative clauses, modify the head nouns due to their semantic and pragmatic situations. In that modification, there is an effect of the prosody, topicality and focus construction. Especially when more than one adjective and complement modify a head noun, they build a semantic hierarchy according to their topical and focal cases. The position of closeness/farness to a head noun and changing word order of modifiers are a part of the strategy of this process. This study analyses these cases of word order of noun phrases according to data based on Mardin’s accent from the typological point of view.

**Key Words:** Noun phrases, Modifiers, Head noun, Mardin’s accent, Mardin’s Kurmanji

\* Xwendekarê doktorayê, Zanîngeha Zaxo/ Kurdistan/Iraq, Beşa Ziman û Edeba Kurdî.  
e-mail: mikailbilbil@hotmail.com

## DESTPÊK

Modîfiyekerên ku navdêran ji gelek aliyan ve modîfiye dikan, ji aliyê pozîsyona sentaktîk ve pêşnavdêrî (prenominal) û paşnavdêrî (postnominal) ne. Lê di kurmancî de modîfiyekerên piştî sereyê (head noun) bêtir têñ bikaranîn û bêtir komplike ne. Bi taybetî dema ku ji yekê zêdetir rengdêr û temamker têñ bikaranîn û risteyêñ peywendiyê (relative clause) navdêran modîfiye dikan, rewşa modîfiyekeran bêtir komplike ne. Lewra eger ji yekê zêdetir rengdêr û temamker dema ku ji bo yek navdêre be, li gor rewşen semantîk û pragmatîk pozîsyona wan ya nêzîkbûn û dûrbûna sereyê dikare biguhere. Loma jî têkiliyek di navbera hîyerarşıya wan ya semantîk û rewşa peyvrêziya wan de çê dibe ku bi taybetiyêñ morfolojîk sentaktîk xwe nîşan didin.

Bêguman li ser modîfiyekerên ku navdêran modîfiye dikan, ji bo kurmanciya bakur, gelek xebatên rêzimanî hene. Lê ev xebat bi awayê îndîrek behsa rewşa wan ya sentaktîk dikan û bi qasî ku em zanin, li ser vê mijarê xebatek nîne ku rasterast hatiye kirin. Di vê xebatê de ev rewşa sentaktîk ya modîfiyekeran li gor daneyêñ ji devoka Mêrdînê<sup>2</sup> hatine ravekirin ku qismek dane ji xebatên sehayî ne (projeyêñ mastera bêtez ku pêşî hatine qeydkirin û dûvre jî hatine nivîsandin) û qismek jî yên nivîskarê vê xebatê bixwe ne ku axêverê zikmakî (native speaker) yê vê devokê ye.

90

## A. MODÎFİYEKERÊN KU BERÎ SEREYÊ TÊN

1. **Çendîker (quantifier):** Çendîker weke ku ji navê wê jî diyar e, ji aliyê çendîniyê ve navdêran modîfiye dikan.

a. **Çendîkera nenasayar (indefinite quantifier):**

- (1) a. *hînik* kes
- b. *gelik* zarok
- c. *hemû* zilam

b. **Çendîkera partîtîf a nenasayar (partitive indefinite quantifier):** Dema ku bêjeyêñ weke *hînik*, *gelik*, *hemû*, *qismek*, *piçik*, *çendîk* berî fraza daçekî ya "ji" yê têñ, mîna çendîkera wê frazê têñ bikaranîn:

- (2) a. *Hînik ji hevala* nehatini.
- b. *Gelik ji van zaroka*, feqîr in.
- c. *Piçik ji nan* ji bo me nehiştiyi.

<sup>2</sup> Li herêma Mêrdînê du devokêne sereke hene. Herçend ji aliyê sentaktîk zêde ne dûrî hev bin ji bi taybetî ji aliyê morfolojiya lêkeran tiştên cuda di wan de pir in. Yek jê devoka Tür Abdîn e ku hin herêmêñ navçeyêñ Nisêbin, Midyat û Stewrê dikevin ber vê devokê. Ya din jî devoka Omeriyan e ku Qoser, Dêrik, Şemrex, Mahserîte, navenda Mêrdîn û hemû beriya Mêrdînê û navçeya Serê Kaniyê ya Rihayê nêzî vê devokê diaxivin.

Ev çendîkerên weke *hînik*, *geliç*, *hemû* çawa ku berî frazên daçekî tê piştî frazên daçekî jî dikarin bê:

- (3) a. *Jî hevala hînik*, nehatini.
- b. *Jî van zaroka gelik*, feqîr in.
- c. *Jî nan piçik*, ji bo me nehiştiyi.

Lê ev pirs dikare bê pirsîn ku ci ferq di navbera wan her du bikaranînan de heye ku di yekê de (2.a.) çendîker berî fraza daçekî tê, di ya din de (3.a.) piştî fraza daçekî tê? Bersiva vê pirsê bi peyvrêzî û fonksiyonê wê ve têkildar e. Fonksiyonê pragmatîk yên peyvrêziyê hene ku tegehê topîkbûnê (topicality) û fokûsê têkildar dîkin. Weke meyleke giştî tiştên ku em dixwazin cext bikin ango derxin pêş û girîngiyê bidinê, li pêş cih digire.<sup>3</sup> Guhertina pozîsyona hêmanan ji ber rewşen pragmatîk dikare pêk bê. Di gelek zimanîn de, pozîsyona hêmanan a ber bi serê fraz û risteyê û pozîsyona ber bi dawiya fraz an risteyê, xwedî fonksiyonê semantîk in. Emma Geniušiene li ser pozîsyona ber bi pêş û ber bi paşiyê diyar dike ku pozîsyona pêşî pozîsyona herî tematîk (thematic) e û ya dawî jî ya herî rematîk (rhematic) e.<sup>4</sup> (Vê *prensîba topîkbûnê* ku pozîsyona pêş ifade dike êdî em dê weke PT bi kar bînin.) Ev PT bêtir du mijaran têkildar dike ku *tema* têkildarî topîkaliteyê ye û *rema* (thema) jî têkildarî fokûsê ye. Her wiha *topîkalîte* agahiyê kevin û fokûs agahiyê nû dide.<sup>5</sup> Di kurmancî de jî tendansa hêmanen topîk ango tematîk ku em girîngiyê bidin wan li destpêkê cih digirin, ên fokûs ku agahiyê nû ne piştî wan in.<sup>6</sup>

Piştî van agahiyê paşxaneyî eger em vegezin ser frazên di (2.a. û 3.a.)yê de em dikarin bibêjin ku dema ku em dixwazin cextê deynin ser çendîkera "hînik"ê em dê forma ku bêjeya *hînik* li pêş e, tercîh bikin. Lê eger em bixwazin *jî hevala* bêtir cext bikin em dê wê berî çendîkerê bibêjin:

*Hînik jî hevala* nehatini. (cext li ser *hînikê* ye)

*Jî hevala hînik* nehatini. (cext li ser *jî hevala* ye)

Lazim e em vêya bibêjin ku rewşa ku modîfiyekerek hem berî hem jî piştî frazekê bê û bibe sebeb ku şiroveyê semantîk biguherin îstîsnaî ye. Ji ber ku di

<sup>3</sup> Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001. r. 270.

<sup>4</sup> Geniušiene, Emma. "Passives in Lithuanian (in comparison with Russian," in *Passivization and Typology Form and Function*, Editor: Werner Abraham & Larisa Leisiö, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, (p. 29-61). 2006. r. 41.

<sup>5</sup> Halliday, M.A.K. *Language Structure And Language Function* in *On Grammar*, Edited by Jonathan Webster (2005), Continuum, London-New York, 1970. r. 192.

<sup>6</sup> Ebûzeyd, Sanya Cabar (2013). *Cihgîhorîna Kerestan Di Rîstê Da (Govara Badînî)*. Teza Doktorayê. Zankoy Soran - Fakultî Adab - Beşî Kurdi, Kurdistan/Iraq r. 138.

kurmancî de bi awayekî tîpîk (typically) modîfiyeker yan berî yan jî pişti sereyan tê. Rewşeke din a van çendîkerên partîtîf heye ku dema ku berê jî û pişti sereyan jî bêñ ji prosodiye<sup>7</sup> tê istîfadekirin. Sereyek û modîfekera wê di heman demê de yekîneyeke sentaktîk jî pêk tînin û ji ber ku yekîneyeke sentaktîk in jî dema ku têñ gotin weke yekîneyekê têñ gotin. Di navbera frazan de em piçekî disekekin dûre dewam dikin. “*Sînorêñ navbera frazan bi navbereke kurt (minor break) û yê navbera risteyan jî bi navbereke dirêj tê nîşandan. Bi xêra sînorêñ prosodîk, gotin utterance jî weke besêñ bimane saz dibin û fambarî zelal dibe.*”<sup>8</sup> Di xebatêñ lîngüîstîk de navberêñ prosodîk yêñ kurt (minor break) ku bêhnvedana navbera du frazan nîşan dide, bi yek xêzê (I) û navberêñ dirêj (major break) jî ku di navbera du risteyan de pêk tê, bi du xêzan (II) têñ nîşandayîn. Li vir ji me re *navbera kurt* lazim e û êdî em dê weke NK bi kar bînin. Eger alîkariya prosodîk nebûya ev bikaranîna çendîkeran ku hem berî hem jî pişti frazêñ daçekî têñ, dê rê li ber tevliheviyê vekira. Heke em sînorêñ frazêñ xwe yêñ jorîn bi awayekî prosodîk nîşan bidin dê wisa bin:

*Hinik ji gund* (I) çûni Mêrdînê.

*Hinik ji hevala* (I) nehatni.

92

Çima em vana dibêjin gelo? Ji ber ku ev çendîker dema ku weke yekîneyeke sentaktîk neyêñ gotin, rola wan a semantîk û sentaktîk diguhere û êdî ne çendîker in. Dema ku bi awayekî prosodîk em sînorêñ frazêñ ku me dabûn biguherin dê wisa bibin.

- (4) a. *Hinik ji gund* (I) çûni Mêrdînê.
- b. *Ji gund hinik* (I) çûni Mêrdînê.
- c. *Hinik* (I) ji gund çûni Mêrdînê.
- d. *Ji gund* (I) *hinik* çûni Mêrdînê.

Di risteyêñ (4.a.) û (4.b.)yê de çendîker û fraza daçekî bi hev re weke yekîneyeke sentaktîk çêkirine ku dema têñ gotin tu NK di navbera çendîker û fraza daçekî de tune. Lê di risteya (4.c.) û (4.d.)yê de di navbera bêjaya *hinik* û fraza daçekî de NK heye. Loma di (4.c.)yê û (4.d.)yê de *hinik* êdî ne di fonksiyona çendîkerê de ye lê ew weke cihnava nenasyar hatiye bikaranîn û rola wê ya rêzimanî jî biker e. Di (4.c.) û (4.d.)yê de, fraza daçekî *ji gund* jî fonksiyoneke hokerî (adverbial) dibîne û rewşa derketinê (ablative) nîşan dide. Jixwe dema ku di (4.c.) û (4.d.)yê de ji bo ku em erkîn rêzimanî tesbit bikin, em bipirsin ku “kî çûne?”, bersiva vê pirsê ne “*hinik ji gund*” e lê bersiva vê ku pirsiyara bikerê dike, *hînik* e. Loma

<sup>7</sup> Prosodi (prosody), di ziman de tişîn weke intonasyon, ton, navber (break), guvaş û teqla (rhythm) axaftinê ifade dike.

<sup>8</sup> Kompe, Ralf. *Prosody In Speech Understanding Sysytems*. Springer, Berlin. 1997. r. 132.

eger *hinik ji gund* di (4.c) û (4.d.)yê de yekîneyeke sentaktîk û yek fraz bûya, wê demê divê biker jî *hinik ji gund* bûya. Lê ne wisa ye û *ji gund* daçeka frazî ye ku di hevokê de roleke hokerî dilîze.

c. **Çendîkera hejmarî (numeral quantifier):** Hejmar bixwe jî navdêran modîfiye dikin û weke çendîker tên bikaranîn:

#### **Bi hejmarên resen**

Hejmarên resen berî navdêran tên û weke çendîker tên bikaranîn:

- (5)    a. *çar dar*
- b. *bîst jin*
- c. *yek zilam*

Dema bêjeyên weke *nîv* an *rib* li hejmaran zêde dibe, hejmarên resen berî navdêrê tên û bêjeyên weke *nîv* û *rib (ek)* jî bi gihaneka *û*yê ve tên girêdan û pişti navdêran tên:

- (6)    a. *du nan û nîv*
- b. *du nan û ribek*

Dema hejmara resen *yek* be, meyl ew e ku li şûna wê paşgira *-ik/-ek<sup>9</sup>* li navdêran bê zêdekîrin. Jixwe *-ik* ku ji bo nenasîriyê tê bikaranîn, weke ku Celadet & Lescot dibêjin ji bêjeya *yekê tê*<sup>10</sup>. Lê em ji bîr nekin ku *-ik* ji bo nenasîriyê jî tê bikaranîn. Loma dema ku cext li ser hejmarê hebe û hejmar girîng be *yek* bêtir maqûl (acceptable) e. Yanî li gor kontekstê bikaranîna wan dikare biguhere:

- (7)    a. Kontekst: Çend zilam hatin?
- b. *Yek* zilam hat.
- c. Kontekst: Kî hat?
- d. Zilam *ik* hat.

Her wiha hin bêje jî hene ku weke çendîker pîvana tiştan nîşan didin û bi hejmaran re jî tên bikaranîn:<sup>11</sup>

- |                      |                |
|----------------------|----------------|
| (8)    a. sîtilik av | sê sîtil av    |
| b. kûpik şerab       | pênc kûp şerab |
| c. cotik gore        | deh cot gore   |

<sup>9</sup> Li gor metnên sehayî ku li ber destê me ne, li Mêrdînê bikaranîna –ik’ê ji ya –ek’ê zêdetir xuya dike.

<sup>10</sup> Bedirxan, Emîr Celadet & Lescot, Roger. *Kürçê Grameri*, Doz Yayınları, İstanbul, r. 90

<sup>11</sup> Qanatê Kurdo. *Rêzimana Kurdi- Kurmancî - Soranî*. Ji soranî wer. Zülküf Ergün, Weşanê Nûbiharê, İstanbul. 2013. r.113.

d. **Çendîkera dijber (contrastive quantifier):** Bêjeyên weke *tenê*, *hew*, *bes* ku hemû di yek maneyê de ne, dema ku berî navdêran têr maneyeke dijber çedîkin. Her wiha ev çendîker fokûsê dikşînin ser navdêra ku ji bo wê hatine bikaranîn:

- (9) a. *Tenê* mi rahiştê. (MIN rahiştê, ne hinekên din.)  
b. *Hew* bavî wî çibû. (BAVÊ WÎ çibû, ne hinekên din.)  
c. *Bes* ti dilê mi rihet diki! (TI dilê mi rihet dikî, ne hinekên din.)

Dema çendîker berî lêkeran têr, êdî ne modîfiyekerê navdêran in lê hokerên dijber (contrastive adverb) in.

- (10) a. *Mi tenê* rahiştê. (Min bi serê xwe rahiştê.)  
b. *Bavî wî hew* çûbû. (Bavê wî carek din neçû.)

Bêjeya *tenê* dema ku piştî navdêran jî tê dîsa dikare fonksiyona modîfiyekera navdêrî bibîne. Lê bêjeyên *hew* û *bes* wisa nikarin bêr bikaranîn. Ev her du bikaranînen *tenêyê*, bi awayekî prosodîk ji hev têr cudakirin:

- (11) a. Ehmed *tenê* (I) nehatibû. (Herkes hatibû lê Ehmed nehatibû.)  
b. Ehmed (I) *tenê* nehatibû. (Hinekên din jî bi Ehmedî re hatibûn.)

94

Bikaranîna bêjeya *tenê* ya (11.a) û (11.b)yê ji aliyê têkiliya prosodî û sentaksê ve balkêş e. Dema weke ku di (11.a)yê de hatiye kirin, bêjeyên *Ehmed* û *tenê* bi hev re bêr gotin û piştî wê NK hebe, tê famkirin ku “herkes hatibû lê Ehmed nehatibû”. Lê eger weke ku di (11.b)yê hatiye kirin NK piştî bêjeya Ehmedî be û bêjeya *tenêyê* û lêker bi hev re bêr gotin, êdî bêjeya *tenêyê* hokera lêkerê ye û maneya risteyê diguhere û tê famkirin ku “hinekên din jî bi Ehmedî re hatibûn”. Yanî em dikarin bêjeya *tenêyê* bi şiklê ku bi navdêra berê xwe re yekîneyeke sentaktîk çêkiribe bibêjin û weke modîfiyekera sereyekê bi kar bînin û her wiha em dikarin bêjeya *tenêyê* bi şiklê ku bi lêkera piştî xwe re yekîneyeke sentaktîk çêkiribe bibêjin û weke hokera lêkerê bikarbînin. Ev yek jî bo têkiliya prosodî û rolêr rêzimanî balkêş e û nîşanî me dide ku prosodî çawa rolêr rêzimanî jî diguherîne. Weke ku me li jorê jî got, bêjeyên *bes* û *hew* çê nabe ku wisa bêr bikaranîn:

- (12) a. \*Ehmed *hew*, dixwend.  
b. \*Ehmed *bes*, dixwend.

## 2. Diyarker (determiner):

a. **Nîşander (demonstrative/deictic):** Nîşanderên ku berî navdêran têr û wan nîşan didin didu ne: *Ev* jî bo nîşandana nêzîk, *ew* jî bo dûr tê bikaranîn. Herçend li gor hin teoriyên rêzimanî nîşander weke rengdêr têr dîtin jî perspektifîn

fonksiyonel, ji ber ku nîşandayîn bixwe ne taybetiyeke heyberan e, nîşanderan bi serê xwe weke kategoriyekê dibînin ku bi diyarkeran ve girêdayî ye:<sup>12</sup>

- (13) **a.** ev mase
- b.** ew mase

Nîşander weke navdêran ditewin û dikevin rewşa oblîk û bi vî awayî jî hem zayend dikare bê diyarkirin hem jî yekhejmarî/pirhejmarî:

(14)	<i>nêzîk</i>	<i>dûr</i>
<b>a.</b> <i>mê</i>	<i>vê masê</i>	<i>wê masê</i>
<b>b.</b> <i>nêr</i>	<i>vî kevrî</i>	<i>wî kevrî</i>
<b>c.</b> <i>pirhejmar</i> van xwendekara		<i>wan xwendekara</i>

**b. Diyarkerên Amajenekirî (non-referential):** Diyarkerên mîna *tî*, *filan*, *her* bêyî ku referanteke diyar nîşan bidin, tên bikaranîn:

- (15) **a.** *tî heval*
- b.** *filan* roj
- c.** *bêvan* zilam
- d.** *her zarok*

95

**c. Rewşa sifirê (zero case):** Di kurmancî de dema ku bêje xwerû bin û tu gireyeke rewşî (case) nestendibin jî nasyar in. Yanî rewşa sifirê bixwe jî rewşê nîşan dide. Pêşnavdêribûna rewşa sifirê bi awayekî hîpotezî ye. Dema ku bêjeyek xwerû be mîna ku artîkela nasyariyê ya îngilîzî *the* li ber wê hebe, nasyar e:<sup>13</sup>

- (16) **a.** *Heval* hat. (*The friend* came.)
- b.** Mi *dîwar* lê dikir. (I was building *the wall*.)

Di risteya jorîn de dema ku kesek bibêje *heval* hatê wê maneyê ku:

- a.** *Heval*, ji bo kesê ku dibeje ango axêverî nasyar e û ew dizane kîjan *heval* hatiye.
- b.** Ê ku dibêje ango axêver difikire ku guhdar jî dizane ku ew behsa kîjan *heval* dike û ew *heval* ji bo guhdarî jî nasyar e. Yanî di rewşen nasyariyê de li gor axêver, guhdar dizane ew behsa çi dike.

**3. Rengdêr:** Di kurmancî de rengdêr piştî navdêran tên. Lê rengdêrên namdarî hem berî hem jî piştî sereyan dikarin bêن:

<sup>12</sup> Givón, h.b., Volume II, r. 6.

<sup>13</sup> Ji bo agahiyê berfireh binêre: Lyons, Christopher. *Definiteness*, Cambridge University Press. Cambridge, United Kingdom, 1999.

- (17) a. Xalê Ehmed  
b. Apê Mûsa  
c. Berber Elî  
d. Şêx Seîd  
e. Mele Xelîl

Îzafe weke ku li jor jî xuya ye di hinekan de tê bikaranîn, di hinekan de nayê bikaranîn. Di mînakên weke Xalê Ehmed, Apê Mûsa de dema Xal û Ap ne rengdêr lê weke navdêr bêñ bikaranîn jî dîsa bi heman awayî têñ bikaranîn. Herçend di nivîsê de eger kontekst neyê zanîn, jihevderxistina wan hinekî zahmet be jî di axaftinê de bi awayekî prosodîk cudahiya wan heye. Lewre weke mînak eger *xal* weke rengdêr hatibe bikaranîn guvaş (stress) li ser navê taybet e lê eger *xal* navdêr be guvaş li ser bêjeya *xal* ye:

- (18) a. Xalê Ehmed (guvaş li ser *Ehmed* e, *xal* rengdêr e: Ehmed bixwe xal  
b. Apê Mûsa (guvaş li ser *Mûsa* ye, *ap* rengdêr e: Mûsa bixwe ap e)  
c. Xalê Ehmed (guvaş li ser *xal* e, *xal* navdêr e: Ehmed ne xal e, *xal* Ehmedî ye)  
d. Apê Mûsa (guvaş li ser *ap* e, *ap* navdêr e: Mûsa ne ap e, ap yê Mûs ye)

Îzafeya ku di kurmancî de guvaşê nastîne jî li hin gundêñ Beriya Mêrdînê bi awayekî enteresan, guvaşê distîne: malâ min, pezê Ehmed.

## B. MODİFİYEKERÊN KU PIŞTÎ SEREYÊ TÊN

### 1. Çendîker

a. Çendîkerên nenasyar (*indefinite quantifier*): Bêjeyêñ *giş*, *hemû*, *tev*, *dîn* weke çendîkerên paşnavdêrî têñ bikaranîn:

- (19) a. *Xwendekar* *giş* (I) hatin.  
b. *Heval* *hemû* (I) nexweş in.  
c. *Mamostê* *dîn* (I) li wir maye.

Çendîkerên *giş*, *hemû*, *tev* weke hokerên mîjerî jî têñ bikaranîn. Li gor rewşa prosodîk ji hev têñ cuda kirin. Eger berî çendîkeran NK hebe êdî ne çendîkera fraza navdêrî ne, lê hoker in û bersiva pirsa *çiqas* a ji bo lêkerê ne:

- (20) a. *Xwendekar* (I) *giş* hatin. (Çiqas hatin? *Giş* hatin.)  
b. *Heval* (I) *hemû* nexweş in. (Çiqas nexweş in? *Hemû* nexweş in.)

**b. Hejmarêñ rêzîn (ordinal):** Dema ku hejmar rêza tiştekî modîfiye dikan, dibin hejmarêñ rêzîn. Bi paşgira *-a'yê* çêdibe ku ev, di eslê xwe de morfema pirhejmariyê *-an* e:

- (21) a. mala *çara*  
b. xanyê *şesa*

Bêjeyên weke *pêşîn*, *navîn*, *dawîn*, *ewilîn*, *paşîn* jî rêza sereyê ji aliyê rêtê ve modîfiye dikan<sup>14</sup>:

- (22) a. beranê *pêşî*  
b. dersa *paşî*  
c. kavira *dawî*

**2. Diyarker (determiner):** Diyarkerêñ ku sereyê diyar dikan, hinek ji wan bêje ne hinek jî morfemêñ bend (bound morpheme) in. Yanî diyarkirina sereyan hem bi awayê morfolojîk hem jî leksikolojîk çêdibe:

**a. Paşgirêñ nenasnyariyê (indefinite suffix):** Paşgirêñ ku navdêran dikan *nenasnyar* dudu ne:

1. - (*i*)*k* yan jî - (*e*)*k*: Ji bo nenasnyar û yekhejmaran tê bikaranîn. Dengdêra (vowel) wan, dema ku dawiya bêjeyê bi dengdêrekî biqedê, dikeve û “k” tenê dimîne. Herçend forma -ik û -ek’ê zêde têr bikaranîn, li mentîqeya Tor Abdînê forma - (*a*)*k’ê* jî heye:

- (23) a. Hevalîk, hostak  
b. Xwendekarek, mamostak  
c. tiştak, zanak

Dema ku navdêrêñ nenasnyar gireyên tewangê distînin, yên tewangê piştî wan têr. Wexta ku gireyên tewangê distîne, dengê “i”yê jî dikeve û “-k” tenê temsîla nenasnyariyê dike:

- (24) a. Hevalkî / hostakî  
b. Hevalkê / hostakê

Dema ku modîfiyekereke din tê bikaranîn û ew modîfiyeker û sere bi ïzafeyê ve bi hev ve têr girêdan jî dîsa dengê “i”yê dikeve û “-k” dîsa tenê dimîne. Li hin deveran jî ïzafe piştî nenasnyariyê û bi taybetî jî ya mî nayê bikaranîn:

- (25) a. Hevalîk Ehmed (hem ji bo nêr hem jî mî)  
b. Hevalkî Ehmed (nêr)

<sup>14</sup> Ciwan, Murat. *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi /Rêzimana Kurdi Bi Şirovekirina Tirkî*, Zekisan Matbaasi, Diyarbakir, r. 2014. 100-101.

2. –(i)n: Ji bo nenasyar û pirhejmaran tê bikaranîn. Dema ku piştî bêjeyeke ku bi dengderekê diqede tê, dengê “-n-”yê weke alîkar (ji bo ku du dengdêran bi hev ve girê bide) berî wê tê:

- (26) a. Hevalin  
b. hostenin

Eger îzafeya pirhejmar û nenasariyê bi hev re bêñ bikaranîn, îzafe piştî nenasariyê tê û dengê “i”yê dikeve û “n” tenê nenasariya pirhejmar temsîl dike. Ji dêvla îzafeya “ê”yê ya pirhejmar, li Beriya Merdînê gelek caran “î” tê bikaranîn:

- (27) a. Hevalnî Ehmed  
b. hostenî me

Eger paşgira tewangê ya pirhejmar -a û ya nenasyarî bi hev re bêñ bikaranîn paşgira tewangê piştî nenasariyê tê û dengê “i” dîsa dikeve û “n” tenê nenasariya pirhejmar temsîl dike.

- (28) a. Hevalna xwar.  
b. Hostena go.

98

b. Nîşander û paşgira nîşander (deictic suffix): Bêjeyêne weke ha, han, hanê bi nîşanderên pêşnavdêrî re têñ bikaranîn û rewşa nîşanê xurttir dikin:

- (29) a. Ev hevala han (ê)  
b. Ew xaniyê han (ê)  
c. Ew zarokê han (ê)

Di hin devokan de ha/han/hanê gramatikalîze bûye û bûye paşgira -a/yê.<sup>15</sup> Ev paşgir diçe dawiya navdêran û weke nîşandera paşgirî (deictic suffix) tê bikaranîn. Dema weke paşgir tê dawiya navdêran, zayenda navdêran a biyolojîk û ya rêzimanî notralîze dibe û hem ji bo nêr û hem jî mî heman form tê bikaranîn. Ji bo yekhejmaran forma -aya û ji bo pirhejmaran forma -na/ana jî berbelav in.

- (30) a. Ev hevala han (ê) ev hevala / hevalaya (mî)  
b. Ev hevalê hanê (ê) ev hevala / hevalaya (nêr)  
c. Ew zarokê han (ê) ew zarokna / zarokana (pirh.)  
d. Ew hosteyê han (ê) ew morîkna / morîkana (pirh.)

<sup>15</sup> Bedirxan& Lescot, h.b., r. 224.

c. **Paşgira banesanî (vocative suffix):** Sereyê ji aliyê rewşa bankirinê ve diyar dike. Ji ber ku li gor cinsiyeta nêr û mê ji hev cuda ne, ji aliyê cinsiyetê jî rewşa sere diyar dikan. Pişti lêkeran jî têbikaranîn:

- (31) a. Hevalê! Xwedê nehiştê!
- b. Hevalo! Xwedê nehişto!
- c. Hevalno! Xwedê nehiştno!

### 3. Rengdêr (adjectives)

Rengdêrên ku ji aliyê sentaktîk ve pişti navdêran têbikaranîn, ji aliyê semantîk ve xwedî taybetiyêne curbicur in. Talmy Givón rengdêrên ku modifiyeker in dike du grûp ku hinek ji wan taybetiyêne siruştî, şenber (concrete) û neguher (stable) in ku ew rengdêrên prototîp in û hinek jî taybetiyêne kêmşenber (less concrete) û guherbar in ku ew jî rengdêrên neprototîp in.<sup>16</sup> Eger em bi vê perspektîfa Givonî li kategoriyêne rengdêrên modifiyeker binêrin, rengdêrên modifiyeker dê wisa bin:

#### A. Yêbî Prototîp

##### a. Endaze (size)

- (32) a. *Endazeya giştî* (general size): mala mezin, mala biçük
- b. *Berfîrehiya berwarî* (horizontal extension): oda fireh, oda teng
- c. *Stûrî* (thickness): qelema stûr, qelema zirav
- d. *Berfîrehiya emûdî* (vertical extension): zilamê dirêj, zilamê kin
- e. *Bilindbûna emûdî* (vertical elevation): dîwarê bilind, dîwarê nizim
- f. *Dirêjî* (length): riya dirêj, riya kin

99

##### b. Reng (color): Rengdêrên ku asta ronibûnê an jî rengên curbicur ifade dikan:

- (33) a. *Ronibûn* (brightness): xanyê tarî, xanyê ronî, çaya tarî, çaya vekirî
- b. *Reng* (color): sola kesk, erdê şîn, çêleka zer

##### c. Taybetiyêne bîhîzyarî (auditory qualities): Rengdêrên ku têkildarî dengan û bîhîstina wan, rengdêrên bîhîzyariyê ne:

- (34) a. *Bidengbûn* (loudness): dengê bilind, dengê nerm, cihê bideng, cihê bêdeng
- b. *Bilindbûna sade* (absolute pitch): dengê bilind, dengê nizm
- c. *Bilindbûna nisbî* (relative pitch): dengê zirav, dengê stûr
- d. *Aheng* (harmony): dengê nerm, dengê hişk

<sup>16</sup> Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume I*. John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001. 81-84.

- e. *Newa (melody)*: dengê newayî, dengê bênewa
- d. **Teşe (shape)**: Li gor teşeya navdêran ku yek, du an sê rehendî (dimension) ne, teşeya wan diyar dikin. Teşeyên navdêran li gor rehendant:
- (35) a. *Yekrehend (one-dimensional)*: darê rast, darê xwar
  - b. *Durehend (two-dimensional)*: kevrê gurover, kevrê cargoşê
  - c. *Sêrehend (three-dimensional)*: kevrê gundorî, şekrê kûpikî
- e. **Çej (Taste)**: Rengdêren ku çêjên curbicur diyar dikin:
- (36) xwarina şêrîn,bihîvê tal, şekrê tîrş
- f. **Destdan (Tactile)**:
- (37) a. *Tevin (texture)*: erda zivir, erda şimatok
  - b. *Mûqavemet (resistance)*: doşeka hişk, doşeka nerm
  - c. *Tûjbûn (pointedness)*: kêra tûj, kêra ko
- g. **Jêçêbûn (substance)**: Rengdêren ku jêçêbûna navdêran diyar dikin jî hene<sup>17</sup> ku Gîvon behsa wan nake. Jêçêbûn ji ber ku taybetiyeye sereke ya rewşa wan a fizîkî ye, divê di nav rengdêren prototîp de bin:
- (38) deryê darîn, xecera zêrîn, şala hirî

100

## B. RENGDÊREN KÊM PROTOTÎP

Rengdêren kêmprototîp ji bo taybetiyê navdêran ên ne zêde şenber (less concrete) û taybetiyê rewşen ku bêtir guherbar (transitory) in, tên bikaranîn:

a. **Nirxî (Evaluative)**: Rengdêren ku fîkrîn subjektif ên mirovan ên derheqê taybetiyeye demkî de an jî fizîkî ya navdêran ifade dikin, rengdêren nirxî ne:

(39) zilamê baş/xerab, keçka xweşik/nexweşik, zarokik şêrîn, dijminê bênamûs

b. **Rewşen Bihurbar (Transitory states)**:

(40) zilamê meşxûl, ava gemarî, şîrê germ, oda sar.

Rengdêren vê grûpa heterojen, taybetmendî û rewşen derveyî, hundirî, civakî û mental ifade dikin:

<sup>17</sup> Bilbil, Mikaîl & Baran, Bahoz. *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul, 2008. r. 49.

(41) a. *Mejiyî-hundurîn* (*mental-internal*): zilamê qeherî, hevalê xemgîn/kêfxweş

b. *Tevgera derveyîn* (*external activity*): kesê meşxûl, kesê betal

c. *Rewşa derveyîn* (*external condition*): kirâsê qirêj/paqij

d. *Leza tevgerê* (*speed of motion*): xortê bilez, texsiya hêdî

e. *Germahî* (*temperature*): cihê germ/sar, ava şîrgerm/cemidî

c. **Rewşen Jiyanî (States of living)**: Rewşen cuda yên candaran ên weke emir, jiyan, tendurîstî û hwd. diyar dîkin:

(42) a. *Emîr* (*age*): jina pîr, zilamê kal, gundiyyê yextiyar/ciwan cilê nû/kevin

b. *Jiyan* (*life*): însanê sax, însanê mirî

c. *Tenduristî* (*health*): keça nesax/nexweş, keça saxlem

d. *Kar* (*business*): xortê betal, kesê bikar/bêkar

d. **Rengdêrên Namdariyê**: Ev cure rengdêr jî paye, rade, peywir û asta civakî ya navêñ taybet nîşan didin.<sup>18</sup>

(43) Nûriyê necar, Evîn Xanim, Ehmedê bijîşk

e. **Orjîna Neteweyî**: Bêjeyêñ ku nasnameya etnîkî didin diyarkirin rengdêrên orjînî ne.

(44) hunermendê *kurd*, zilamê *ereb*, keçka *swêdî*

Eger du an bêtir rengdêr ji bo yek sereyê bêñ bikaranîn gelo dê kîjan weke pozîsyon bêtir nêzîkî sereyê bin? Anglo peyvrêziya di navbera modîfiyekeran de dê çawa be û li gor ci be? Gelo tu pîverêñ hiyerarşik di navbera vê peyvrêziyê de hene yan na? Derheqê vê mijarê de gelek zimanزانan li gor tîpolojiya zimanan gelek fikrên cuda gotine. Zimanزان Gruber van pênc xalan dibêje: Rengdêr bêtir nêzîkî sereyê tê bikaranîn, eger rengdêr:<sup>19</sup>

(45) a. ji bo navdêr wateyeke bêtir bingehîn be.

b. taybetiyeke bêtir sıruştî û daîmî ya navdêr be.

c. agahiyeke (li gor agahiyeke taybet) bêtir giştî be.

d. agahiyeke (li gor agahiyeke nû) bêtir têzanîn be .

e. nesînordar (non-restrictive) be.

<sup>18</sup> Bilbil & Bahoz. h.b., r. 42.

<sup>19</sup> Endley, Martin J. *Linguistic Perspectives on English Grammar: A Guide for EFL Teacher*, Information Age Publishing, inc. Charlotte –America, 2010. r. 96.

Zimanزانekî din Lynn M. Berk jî ji bo îngilîzî, li ser pozîsyona nêzîkbûn û dûrbûna rengdêran a navdêrên ku modîfiye dîkin, diyar dike ku herçend ne teqez be jî rengdêr bêtir bi vê rêzê tên bikaranîn: Pêşî *teşe* tê û piştre jî *emir (age)*, *reng* û *jêçêbûn* (material characteristics) û *orijîna neteweyî* tê.<sup>20</sup> Martin J. Endley jî nêzîkî rêzkirina Berkî û bi awayekî tablo pozîsyon û hiyerarşıya rêzbûna rengdêran (di îngilîzî de) wisa rêz dike:<sup>21</sup>

1	2	3	4	5
nirxî (evaluation)	rehend (dimension)	rewşa emir (condition of age)	reng (color)	jêçêbûn, orijîna neteweyî (material characteristics, national origin)

Li gor tabloya Endley ya jorîn, rengdêrên ku jêçêbûn û orijîna neteweyî ifade dîkin bêtir nêzîkî navdêrân têni bikaranîn, piştre jî rengdêrên ku *reng*, *rewşa emir*, *rehend* û *nirxî* diyar dîkin têni. Yanî li gor nêzîkbûna pozîsyona navdêrân rêza 5-4-3-2-1 dişopînin:

“an old, brown, leather briefcase”<sup>22</sup>

kevin qehweyî çermîn çente (çenteyê çermîn, qehweyî, kevin)

Di vê mînakê de em dibînin ku rengdêra ku jêçêbûnê diyar dike (çermîn/leather) rengdêra herî nêzîkî navdêrê ye û piştre jî *reng* (qehweyî/brown) û *emir* (kevin/old) hatiye. Gelo di kurmancî de jî rengdêr ji aliyê rêzbûnê ve, li gor hin pîverên diyar rêz dibin an jî ji ber rewşen pragmatîk ne xwedî cihekî standard in û pozîsyon û rêza wan guherbar (flexible) e? Ango hiyerarşîyeke ku li gor hin rewşen semantîk pozîsyona wê diyar e, heye an na? Weke mînak em ji mînaka Endley îstîfâde bikin, ma şert e ku em di kurmancî de *jêçêbûnê* nêzîkê navdêrê bi kar bînin û piştre jî yên din? Ango dema ku em rêza wan sê rengdêran biguherînin gelo sentaks û peyvrêziya kurmancî rê dide an na? Herçend Peter Svenonius diyar dike ku di zimanîn de ku *teşe* û *reng* bi awayekî pêşnavdêrî berî bêjeyan têni, bi awayekî gişî, rengdêrên ku *teşeyê* diyar dîkin berî rengdêrên ku rengî diyar dîkin têni;<sup>23</sup> di kurmancî de her du jî paşnavdêrî ne û bêguman tîpolojiya kurdî û gelek zimanîn ne weke hev e. Eger em sê rengdêrên ku li jor ji

<sup>20</sup> Berk, Lynn M. *English Syntax, From Word to Discourse*, Oxford University Press, Oxford/New York, 1999. r. 180.

<sup>21</sup> Endley, h.b., 96.

<sup>22</sup> Endley, h.b., r. 96,

<sup>23</sup> Svenonius, Peter. “The Position Of Adjectives And Other Phrasal Modifiers In The Decomposition Of DP” in *Adjectives And Adverbs Syntax, Semantics, And Discourse*. Edited By Louise McNally and Christopher Kennedy. Oxford University Press, Oxford. United Kingdom. 2008. r. 34

bo zimanê îngilîzî li gorî hiyerarşiyekê rêz bûne û peyvrêziya wan hişk (rigid) e di kurmancî de biceribînin:

- (46) a. çentakî *çermîn*, *qehweyî* û *kevin*
- b. çentakî *çermîn*, *kevin* û *qehweyî*
- c. çentakî *qehweyî*, *çermîn* û *kevin*
- d. çentakî *qehweyî*, *kevin* û *çermîn*
- e. çentakî *kevin*, *qehweyî* û *çermîn*
- f. çentakî *kevin*, *çermîn* û *qehweyî*

Dema em li mînakên jorîn binêrin em dikarin bibêjin ku kurmancî rê dide her şes rêzbûnan jî. Di axaftina rojane de sê an bêtir rengdêr ji bo navdêrekê kêm caran têr bikaranîn, ji ber vêya eger em li gor du rengdêrên ku di hiyerarşiya Endleyî de yek ya herî nêzîk (jêçêbûn/orîjîn) yek jî ya herî dûrî navdêran (nirxî/evaluative) e, binêrin, xuya dibe ku bê problem cihê wan dikare bi hev biguhere:

- (47) a. Dergûşa *darîn* û *xweşik* (*the nice wooden cradle*)
- b. Dergûşa *xweşik* û *darîn* (\**the wooden nice cradle*)
- c. Hunermendê *kurd* û *meşhûr* (\**the kurdish famous artist*)
- d. Hunermendê *meşhûr* û *kurd* (*the famous kurdish artist*)

Di van mînakân de rengdêra *darîn/kurd* li gor hiyerarşiya Endley divê nêzîkê navdêrê û xweşik/meşhûr jî divê di dawî de bûya. Lê em dibînin ku kurmancî ne weke îngilîzî û hin zimanê din e û rê dide her du awayan jî. Lê ev yek nayê wê maneyê ku dema ku di kurmancî de peyvrêziya rengdêran tê guhertin, ji aliyê şîroveya semantîk ve tiştek ferq nake. Berovajî vê yekê, di navbera peyvrêzî û rewşen semantîk ên cuda de têkiliyeke xurt heye û guhertina cihê rengdêran ne keyfi lê fonksiyonî ye. Em bi mînakân rewşen pozisyonê cuda û aliyê wan ên pragmatîk îzah bikin:

- (48) a. Li Mêrdînê rojê *kin* û *tarî* hindik in.
- b. Li Mêrdînê rojê *tarî* û *kin* hindik in.

Di mînakên jorîn de *kin* û *tarî* û *tarî* û *kin* bi gihaneka û yê bi hev hatine girêdan. Dema ku di navbera du rengdêran de gihaneka û yê hebe divê em fam bikin ku her du rengdêr jî ji bo yek sereyê hatine bikaranîn û rolêwan ên sentaktîk yek in. Li jorê di navbera (48.a.) û (48.b.) yê de herçend ferzek mezin tune be jî li gor prensîba PTyê di (48.a.) yê de *kin* û di (48.b.) yê de *tarî* bêtir girîng û li pêş e. Yanî di her du bikaranînan de jî fokûsa navdêran nîne. Lê dema ku yek tê fokûskirin, wê demê li gel hêmanên morfolojîk, bi awayekî peyvrêzî jî tê kodkirin û rengdêra fokûskirî bi awayekî îcbarî diçe dawiya frazê. Di rewşen

wiha de yên ku rengdêrek ji bo navdêrekê hatibe bikaranîn û rengdêreke din jî ji bo her duyan bi hev re bê bikaranîn, fokûs li ser a dawiyê ye û êdî gihaneka *ü'yê* nayê bikaranîn lê ji ïzafeya “*î*’yê tê istifadekirin ku ji aliyê cinsiyet û hejmarê ve notralîze bûye. Di kurmanciya standard de ji formên (a, ê, ên) istifade tê kirin lê li herêma Mêrdînê (û hin herêmên din jî) ji dêvla van sê forman jî tenê “*î*” tê bikaranîn:

- (49) a. Li Mêrdînê *rojê kin i tarî*, hindik in. (rojên kin, tarî ne)
- b. Li Mêrdînê *rojê tarî yî kin*, hindik in. (rojên tarî, kin in)

Dema ku em li şiroveya semantîk (semantic interpretation) a van hevokan binîrin, em dibînin ku herçend peyvrêziya wan neguheriye jî, maneya wan ji binî ve guheriye. Di bikaranîna (48.a)yê de (*rojê kin û tarî*) *roj* hem *kurt* in hem jî *tarî* ne lê di (49.a.)yê (*rojê kin i tarî*) de *roj* ne *kin û tarî* ne lê *rojê kin*, *tarî* ne. Dîsa di (48.b)yê de *roj* hem *tarî* hem jî *kin* in lê di (49.b.)yê de *rojê tarî*, *kin* in. Bi vî awayî hiyerarşıya semantîk a navbera wan, ji binî ve guheriye û di (49.a.)yê de *tarî*, di (49.b.)yê de jî *kin* hatiye fokûskirin. Mimkun e ku ev ïzafeya “*î*’yê bi awayekî diyakronîk ji ïzafeyê resen hatibin. Lê ji wê bêtir belkî ji ber ku fonksiyonek nû lê bar bûbe guherîbe. Mesela di farisî de, dema ku risteya peywendiyê hebe, sereya frazê ji dêvla ïzafeya normal, ïzafeya “*î*’yê distîne ku Richard Larson û Hiroko Yamakido ji bo vê “*î*’yê morfema peywendiyê (relative morpheme) dibêjin û diyar dîkin ku mimkun e ku bi awayekî diyakronîk ji ïzafeyê hatibe.<sup>24</sup> ïzafe di zazakî de jî dema ku berî navdêran be cuda ye lê dema ku berî rengdêran tê û wesifdanê dike cuda ye û li gor rewşa rewşî (tewandî û rasterast) jî diguhere.<sup>25</sup> Ji bo ku rewşa fokûskirî ku bi vê ïzafeyê tê çêkirin û ya ne fokûskirî bêtir bê zelalkirin em li mînakên jêrîn binîrin:

- (50) a. Sêvê sor û buha kirîbûn. (*sêv* hem *sor* û hem *buha* ne)
- b. Sêvê buha û sor kirîbûn. (*sêv* hem *buha* hem *sor* in)
- c. Sêvê sor i BUHA kirîbûn. (*sêvên* *sor*, *buha* ne)
- d. Sêvê buha yî SOR kirîbûn. (*sêvên* *buha*, *sor* in)

Di frazên (50.a.) û (50.b.)yê de ferqa di navbera *sêvê sor û buha* û *sêvê buha* û *sor* bi mijara topîkbûnê û hiyerarşıya wê ve dikare bê ïzahkirin. Yanî eger li gor prensîba PTyê ku hêmanên topîk û girîng berê tên gotin em hereket bikin, em dê bibêjin di (50.a.)yê de rengdêra *sor* ji rengdêra *buha* bêtir li pêş e û girîngtir e. Di (50.b.)yê de jî *buha* ji *sor* pêşdetir hatiye gotin û *buha* ji aliyê maneyê ve ji *sor*

<sup>24</sup> Larson, Richard & Yamakido, Hiroko. “*Ezafe And The Deep Position Of Nominal Modifiers*” in *Adjectives And Adverbs Syntax, Semantics, And Discourse*. Edited By Louise Menally and Christopher Kennedy. Oxford University Press, Oxford, United Kingdom, 2008. r. 45.

<sup>25</sup> Malmisanij, M. *Kurmanca İle Karşılıştırmalı Kiramnicca (Zazaca) Dilbilgisi*, Weşanxaneyê Vateyi/Vate Yayinevi, İstanbul, 2015. r. 114-115.

bêtir li pêş e. Ev rewş weke ku me berê behs kiribû rewşa tematîk têkildar dike. Di (50.c.) û (50.d.)yê de jî fokûs li ser wê rengdêrê ye ku ji bo sereyeke modifiyekirî ye ji aliyê rengdêreke din ve. Yanî di (50.c.)yê de fokûs li ser *buhayê* ye ku weke modifiyekera *sêvê sor* hatiye bikaranîn û di (50.d.)yê de jî fokûs li ser *sorê* ye ku weke modifiyekera *sêvê buha* hatiye bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku di qalibeke wisa de fokûs li ser modifiyekera dawî ye û wateyeke dijber jî tê de heye. Yanî bêyî ku em ji stratejiya guvaşa emfatîk (emphatic stress) îstîfade bikin, bi awayekî sentaktîk, em fokûsa dijber (contrastive focus) pêk tînin. Dema ku em ji aliyê rewşa fokûsa dijber ve lê binêrin, ji bo (50.c.) û (50.d.)yê em dê wisa bibêjin:

- (51) a. *Sêvê buha yî sor* (*sêvên buha*, ne zer an rengeke din in lê *sor* in)
- b. *Sêvê sor û buha* (*sêvên sor*, ne *erzan* in lê *buha* ne)

Dema ku rengdêreke din lê bê zêdekîrin û fokûs li ser du rengdêran be, dîsa gihaneka û'yê tê bikaranîn:

- (52) a. *Sêvê buha yî sor û biav* kirîbûn. (*sêvên buha*, *sor* û *biav* in)
- b. *Sêvê sor û buha û xweş* kirîbûn. (*sêvên sor*, *buha* û *xweş* in)

Di (52a.)yê de *sor* û *biav* ji bo *sêvê buha* hatine bikaranîn. Di (52.b.)yê de jî *buha* û *xweş* ji bo *sêvê sor* hatine bikaranîn. Ji aliyê fokûsê em lê binêrin, em dibînin ku di (52.a.)yê de fokûs li ser *sor* û *biav* û di (52.b.)yê de jî li ser *buha* û *xweş* ê ye. Eger ew rengdêr berî ızafeyê bihatina wê demê dîsa bi gihaneka û'yê bi hev ve dihat girêdan û maneya wê jî ji binî ve diguherî:

- (53) a. *Sêvê buha û biav û sor*, kirîbûn. (*sêvên buha* û *biav*, *sor* in)
- b. *Sêvê sor û xweş û buha*, kirîbûn. (*sêvên sor* û *xweş*, *buha* ne)

Di (53.a.)yê de *sor* ji bo *sêvê buha* û *biav* hatiye bikaranîn, di (53.b.)yê de jî *buha* ji bo *sêvê sor* û *xweş* hatiye bikaranîn. Heman rewşa fokûsê ji bo van jî derbas dibe û fokûs li ser hêmana herî dawî ye. Lê lazim e mirov bibêje ku di axaftinê de gelek caran fokûs bi awayekî prosodîk, bi guvaşê (stress) tê çêkirin.

Di metnên sehayî yên herêma Mêrdînê de xuya dibe ku bi piranî rengdêrek tenê navdêran modifiye dike û bikaranîna du rengdêran ji bo navdêrekî ji ya sisîyan zêdetir jî be bi giştî hindik tên bikaranîn. Dema ku du an zêdetir rengdêr sereyekî modifiye dikin, bikaranîna gihaneka û'yê jî obsiyonel e:

- (54) a. "... zilamekî feqîr, belengaz, jiderketî ..."<sup>26</sup>
- b. "... riyek dûr, dirêj û biezîyet ..."<sup>27</sup>

<sup>26</sup> Çoban, Mehmet. *Bikaranîna Rengdêran Li Herêma Midyadê*, Projeya Lisansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn, 2014. r.13.

- c. "... qîzaka xwaşik û bi şawq û beraq ..."<sup>28</sup>  
d. "... xêlîka kesk û sor û zer..."<sup>29</sup>

Dema ku mirov li metnên herêma Mêrdinê dinêre mirov dibîne ku rengdêrên fokûskirî herî zêde dema ku peyvrêziya *sere + cihnav + rengdér* hebe tê bikaranîn. Yanî cihnav sereyekê modîfiye dike û rengdêr her duyan modîfiye dike û fokûs li ser rengdêrê ye. Em ji bîr nekin ku ev fokûsa bi vî awayî, fokûsa dijber (contrastive fokûs) e û bêyî ku pêwîstî bi stratejiya *guvaşa dijber* (contrastive stress) hebe tê çêkirin:

- (55) a. "... dewrana me yî berê ..."<sup>30</sup>  
b. "... kurê min i delal ..."<sup>31</sup>  
c. "... çêleka wa y'zer..."<sup>32</sup>  
d. "Bi serê golkê min i bes..."<sup>33</sup>

Di peyvrêziyeke wisa de eger em cihê cihnav û rengdêrê biguherînin, wê demê fokûs diçe ser cihnavê. Lê di pratîkê de, ev yek ne şaş be jî zêde nayê bikaranîn. Ji ber ku di kurmancî de çêkirina fokûsê ji stratejiyên morfolojîk û sentaktîk bêtir bi stratejiyên prosodîk çêdibe ku guvaş rêya herî berbelav e. Yanî ji dêvla ku em cihê cihnavê biguherin em dê cihnavê bi guvaş bibêjin. Ew guvaş jî ne *guvaşa nêtar* (neutral stress) lê guvaşa dijber (contrastive fokûs) e. Hinek zimanzan ji bo vê guvaşê ku dengî bilindtir dike û maneyên dijber çêdike, *guvaşa emfatîk* (emphatic stress) dibêjin.<sup>34</sup> Lê li vir weke ku Givón<sup>35</sup> bi kar tîne em dê guvaşa dijber bi kar bînin ku bi fokûsa dijber çêdibe. Eger em van bikaranînen ku cihnav

<sup>27</sup> Atış, Ali. *Di Devoka Çiyâyê Mazî de Bikaranîna Hevalnavan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindi yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn, 2016. r. 9.

<sup>28</sup> Arslan, Aydin Gulçin. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Herêma Torê de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindi yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn, 2013. r. 9.

<sup>29</sup> Alkan, Fırat, *Di Hin Dûrikên Jî Herêma Mêrdîn de Rengdêr*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindi yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn, 2014. r. 13.

<sup>30</sup> İldem, Abdulkadîr. *Dengbêj Mihemedê Xursî*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstituya Zimanê Zindi yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn, 2013. r. 8.

<sup>31</sup> Arslan, h.b., . r. 14.

<sup>32</sup> Bulgan, Bilal. *Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran) Di Devoka Herêma Kercewsê De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindi yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn, 2013. r. 16.

<sup>33</sup> Demirkaya, İslameddin. *Di Nava Eşîra Morîkan De Rêjeya Zayenda Bêjeyan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindi yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn, 2014. r. 12.

<sup>34</sup> Erguvanlı, Eser Emine. *The Function of Word Order in Turkish Grammar*. University of California Press, Berkeley-Los Angeles-London, 1984. r. 118.

<sup>35</sup> Givón, h.b., *Volume II*, r. 380.

û rengdêr di wan de hene tev li konteksta wan a semantik nîşan bidin dê çêtir bê famkirin:

1. Guvaşa nêtar (neutral stress) heye û fokûs li ser rengdêrê ye.

(56) a. *Kontekst*: Hevala te ya çawa?

b. Hevala min î bas

2. Guvaşa nêtar (neutral stress) heye û fokûs li ser cihnavê ye.

(57) a. *Kontekst*: Hevala baş a kê?

b. Hevala baş î mi. (ne hevala hinekî din lê ya min)

3. Guvaşa dijber (contrastive stress) heye û fokûs li ser cihnavê ye.

(58) a. *Kontekst*: Hevala baş a kê?

b. Hevala MIN î baş. (ne hevala hinekî din lê ya min)

Di fraza (56.b.)yê de fokûs li ser rengdêrê ye û ew fokûs bêyi ku ji guvaşeke ku cextê an maneyên dijber çêbike, bi awayekî morfo-sentaktîk hatiye çekirin. Morfo-sentaktîk e lewre “î” hatiye bikaranîn ku morfolojik e û li pozîsyona dawiya frazê cih digire ku sentaktîk e. Di fraza (57.b.)yê de jî dîsa guvaşa nêtar yanî ya normal hatiye bikaranîn û fokûs bi awayekî morfo-sentaktîk li ser cihnavê ye. Lî di fraza (58.b.)yê de cihnav, ne bi guvaşa normal ango nêtar lê bi ya dijber hatiye gotin û fokûsa dijber ava kiriye. Fokûsa ku bi guvaşê çêdibe di kurmancî de ji ya morfo-sentaktîk xurttir e. Ji ber wê jî digel ku di fraza (58.b.)yê de fokûs li ser rengdêrê ye, guvaşa dijber li ser cihnavê ye û fokûsa cihnavê ya bi riya guvaşa dijber, fokûsa rengdêrê betal kiriye. Jixwe di fraza (58.a.)yê de “baş” weke kontekst hatiye dayîn û loma jî ew êdî ne rema (rhema) lê tema ango topîk e. Her wiha lazim e mirov vêya bibêje ku guvaşa dijber dikare biçe ser rengdêrekê jî ku bi awayê morfo-sentaktîk hatiye fokûskirin. Weke mînak, di fraza (56.b.)yê de em dikarin guvaşa dijber daynin ser rengdêra ku jixwe di rewşa fokûsê de ye.

(59) a. *Kontekst*: Hevala te ya çawa?

b. Hevala min î BAŞ. (Hevala min a ne xerab lê ya BAŞ)

Em dikarin bibêjin ku di fraza (59.b.)yê de fokûs hem bi awayê morfo-sentaktîk hem jî prosodîk hatiye kodkirin. Dema ku guvaşa dijber lê zêde dibe mane jî bêtir dibe dijber. Yanî dixwaze bibêje ‘hevala min, ne ya xerab lê ya BAŞ’.

Ji bilî bikaranîna îzafeya “î”yê îzafeyen resen (ji bo nêr û pirhejmariyê -ê, ji bo mî) jî di fokûskirina rengdêran de têr bikaranîn. Lî hinek rewşen wan yên prosodîk ji hev cuda ne û ferqî di navbera rewşa guvaş û melodiya gotinê

(speech melody) wan de heye. Eger em bi mînakan sê rewşen van bikaranînan ïzah bikin:

- (60) a. Hevala min ì *BAŞ*  
b. Hevala min a *BAŞ*  
c. Hevala min (I) *A BAŞ.*

Li Mêrdînê ev her sê bikaranîn jî hene ku (60.a.) herçend forma (60.a.) zêdetir tê bikaranîn jî (60.a.) û (60.b.) ji aliyê maneyê ve li şûna hev tê bikaranîn û her du jî ji aliyên prosodîk ve weke yek yekîne tê gotin û di gotina bêjeyên wê de NK nîne. Lê di (60.c.)yê de piştî *hevala min* NK heye û piştre ïzafe û rengdêr bi hev re hatine guvaştin. Şiroveya semantîk a vê bikaranînê, ji ya (60.a.) û (60.b.)yê cudatir e lewre fokusa rengdêra wê ji yên din xurttir e. Yanî (60.a.) û (60.b.) bi awayekî monotonîk weke yek fraz tê gotin lê di (60.c.)ê de ew rîtma (rythem) wê diguhere û piştî ku NK berî rengêrê tê dayîn hem ïzafe hem jî rengdêr bi hev re guvaşê distînin. Bi vî awayî hem melodiya axaftinê bêtir harmonîk dibe hem jî fokûs tê cextkirin.<sup>36</sup>

**4. Temamker (complement):** Dema ku navdêr an cihnavek sereyê modifiye dike, wê ji aliyê xwedîtiyê ve temam dike û maneya xwedîtiyê çêdike.

108

**1. Temamkeren ku cihnav in:** Hin cureyên cihnavan dema ku piştî sereyên navdêrî tê wan ji aliyê xwedîtiyê (possessive) ve modifiye dikin. Weke kategoriyeke serbixwe cihnavên xwedîtiyê tune ne. Mesela di îngilizî de weke kategoriyeke serbixwe (his, her, their hwd.) cihnavên xwedîtiyê hene. Cihnavên kurmancî dema ku piştî navdêran tê û bi alîkariya *izafeyê* ve, bi navdêran re têngirêdan maneya xwedîtiyê çêdikin. Em dikarin weke çar kom wan kategorize bikin ku weke temamker tê bikaranîn:

**a. cihnavên kesî (personal pronoun):** Cihnavên kesî yên forma tewandî (oblîk) *mi, te, wî, wê, me, we, wan* piştî sereyan bê, ji aliyê maneya xwedîtiyê ve sereyan modifiye dikin:

- (61) a. deftera mi/te/wî/wê/me/we/wan  
b. kitêba mi/te/wî/wê/me/we/wan

**b. Cihnavên nîşander (demonstrative pronoun):** Cihnavên nîşander eger berî navdêran bê tenê nîşanê dikin û wateya xwedîtiyê nadin. Lê dema ku piştî

<sup>36</sup> Ji bo têkiliya rîtim, melodiya axaftinê û hêmanên prosodîk li vê gotarê binêre: Nootboom, Sieb. "The The Prosody Of Speech: Melody And Rhythm". In *The Handbook Of Phonetics Sciences*. 640-673. W.J. Hardcastle and J. Laver (edit) Oxford: Blackwell, 1997.

navdêran tê hem maneya nîşanê di wan de heye hem jî maneya xwedîtiyê li wan bar dibe. Dema ku weke paşnavdêrî bêñ bikaranîn jî dîsa weke nîşanderên pêşnavdêrî li gor nêzîk/dûr, mî/nîr û yekhejmar/pirhejmar xwedî formên cuda ne:

	<i>nêzîk</i>	<i>dûr</i>
(62) a.	<i>nîr</i> deftera <i>vî</i>	deftera <i>wî</i>
b.	<i>mê</i> qelema <i>vê</i>	qelema <i>wê</i>
c.	<i>pirhejmar</i> hevalê <i>van</i>	hevalê <i>wan</i>

c. **Cihnava vegerok (reflexive pronoun):** Cihnava vegerok *xwe*, dema ku pişî navdêran tê wateya xwedîtiyê dide:

- (63) a. deftera *xwe*
- b. navê *xwe*
- c. ca *xwe*

Cihnava *xwe'yê* li hin herêmên weke Semsûr û Meletî, dema ku pişî navdêran tê maneya “*wî/wê*” dide.<sup>37</sup>

d. **Cihnava hevûdimî (reciprocal pronoun):** Cihnava hevûdinî *hev/hevdû* dema ku pişî navdêran tê maneya xwedîtiyê çêdike û wan ji aliyê xwedîtiyê ve modîfiye dike.

- (64) a. defterê *hev*
- b. malê *hev*
- c. azadya *hev*

e. **Cihnavênen nenasayar (indefinite pronoun):** Bêjeyêne weke hinek, hemû, gelek hem weke çendîker hem hoker hem jî cihnavênen nenasayariyê têñ bikaranîn. Dema ku pişî navdêran têñ, ew jî weke temamkerêñ din maneya xwedîtiyê çê dikin:

- (65) a. hevalê hemûya
- b. mala geleka
- c. azadya hinika

2. **Temamkerêñ ku navdêr in:** Temamkerêñ navdêrî bi awayekî teorîk bêşînor dikarin pişî sereyê bêñ û wê temam bikin. Du navdêrêñ ku yek modîfiyeker yek jî modîfiyekirî ye frazên herî hêsan pêk tînin.

- (66) a. nanê tenûrê
- b. pezê gundiya

<sup>37</sup> Tan, Samî. *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*, Weşanêñ Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol. 2005. r. 116-117

Sere û temamkerên wê bi çend awayan dikarin bibin yek fraz. Weke mînak, dibe ku du an zêdetir temamker ji bo yek serêyê bêñ bikaranîn. Eger sere ji bo du heb modîfiyekerêñ cuda hevbeş be, wê demê ne hewce ye her du sere jî bêñ bikaranîn û dikarin bibin yek fraz:

- (67) a. *mala koçera û mala bêkesa*  
b. *mala koçer û bêkesa*  
c. *kitêbê xwendekara û kitêbê mamosteya*  
d. *kitêbê xwendekar û mamosteya*

Di fraza (67.a.)yê de sereya *mal’ê* ji bo *koçer* û *bêkesa* hevbeş e loma ya yekem dimîne û ya duyem dikeve û forma (67.b.)yê peyda dibe. Di fraza (67.c.)yê de ji sereya *kitêb’ê* ji bo *xwendekar* û *mamosteya* hevbeş e û ji ber ku hevbeş e ya duyem dikeve û forma (67.d.)yê peyda dibe.

Di hin frazan de jî dibe ku du sere ji aliyê yek navdêrî bê temamkirin. Eger du sereyên cuda hebin û modîfiyekera wan hevbeş be, ji bo du heb sereyên cuda yek temamker tê bikaranîn û wê demê, dixin yek fraz:

- (68) a. *xwendekarê zanîngehê û mamostê zanîngehê*  
b. *xwendekar û mamostê zanîngehê*

110

Herçend bi awayekî teorîk navdêr bi awayekî bêsinor dikarin bêñ cem hev jî dema ku em li metnêñ sehayî yên herêma Mêrdînê dinêrin, xuya dibe ku herî zêde du navdêr tên cem hev, sisê hindiktir in, çar û pênc gelekî hindik in. Weke mînak, di nav metneke sehayî de (7019 bêje), frazên ku ji çar navdêran pêk dihatin *dudu bûn*, ya ku ji pênc navdêran pêk dihat jî tenê yek bû.

- (69) a. “... *devê deriyê mala bavê xwa ...*”<sup>38</sup>  
b. “... *heyra maçkirina ruwê xwa ...*”<sup>39</sup>  
c. “... *nêriyê mala bavê wê ...*”<sup>40</sup>

Di axaftina rojane de gelek caran bêjeyên têkildarî merivatî û malbatiyê weke temamker tên bikaranîn û frazên dirêj çê dikin. Weke mînak, frazên jêrîn ji gelek navdêran pêk tên û ji bo guhê kesî xerîb nayên:

- (70) a. *Daweta kurê metka ca min*  
b. *Keça xaltîka amojna bûka me*

<sup>38</sup> Kartal, Lokman. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tûr Abdûn/Torê De (Kercos/Gundê Xerabêna)*. Projeya Lisansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013. r. 19.

<sup>39</sup> Kartal, h.b., r. 13.

<sup>40</sup> Kartal, h.b., r. 15.

Dema ku rengdêr li sere û temamkeran zêde dibin li gor rewşa wan a fokûsê ïzafeya “*îyê an jî yên resen ê/a têb bikaranîn*. Weke ku berî jî me got, forma ‘*îyê* pir berbelav e. Dîsa dema ku navbera prosodik ango NK hebe, *a/ê têb* tercihkirin û fokûs xurttir e.

- (71) a. “... *lî ser diranekî wî nî kursiya ...*”<sup>41</sup>
- b. “... *a xwe yî dinê ...*”<sup>42</sup>
- c. “... *lawê apê keçikê (I) yê heq ...*”<sup>43</sup>

Frazên daçekî jî dema ku weke modîfiyeker têb bikaranîn û dikevin ber fokûsê dîsa heman rewş diqewime. Yanî bi ‘*îyê* dibin hêmana fokûskirî û dema ku NK û ïzafeyên *a/ê* bêb bikaranîn jî fokûsa xurt çêdibe. Em ji bîr nekin ku her du awayên fokûsê jî maneyên dijber çêdikin. Lî ya ku bi ïzafeyên *a/êyê* çêdibe xurttir e û bêtir maneyeke dijber dide:

- (72) a. mala Ehmed û li gund (ne ya li bajêr an cihekî din lê ya gund)
- b. mala Ehmed (I) a li gund (ne ya li bajêr an cihekî din lê ya li gund)
- c. arvanê me yî li eş (ne yê li embar an cihekî din lê yê li eş)
- d. arvanê me (I) yê li eş (ne yê li embar an cihekî din lê yê li eş)
- e. kurê Eyşe yî li Stenbolê (ne yê li Mêrdîn an bajarekî din lê yê Stenbolê)
- f. kurê Eyşe (I) yê li Stenbolê (ne yê li Mêrdîn an bajarekî din lê yê Stenbolê)

Bikaranîna hêmanên prosodik di hin rewşan de, ne tenê ji bo çêkirina fokûsê ye lê maneya hin frazên ku bi du şiklan dikarin bêb famkirin jî ji hev cuda û zelal dike. Ji ber ku di hinek forman de ew tevlihevî dikare çêbibe. Weke mînak em li her du formên li jêrîn binêrin, xuya dibe ku ne alîkariya prosodik be zelalî çenabe:

- (73) a. *lawê birê min î mezin*
- b. *lawê birê min ê mezin*

Her du frazên jorîn, dema ku alîkariya prosodik nebûya me ji hev dergedixist. Ji ber ku em dikarin ji bo frazên (73.a.) û (73.b.) yê dikarin bipirsin ku gelo rengdêra *mezin* modîfiyekera *birê min* e an jî ya bêjeya *lawê* ye? Bi gotineke din, gelo yê *mezin*, *bira* ye an jî *law e*? An jî eger çawa be rengdêr ji bo

<sup>41</sup> Koşar, Fikret. *Bikaranîna Rengdêran di Çirokên Devoka Qoserê (Mêrdînê) de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn. 2014. r.18.

<sup>42</sup> Demirkaya, h.b., r. 9.

<sup>43</sup> Ayta, Ramazan. *Çirok û Çırçirokên Kaniya Xezalan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn. 2013. r.12.

modîfiyekirina *law* e û çawa be ji bo *bira* ye? Dema ku em li bikaranînê binêrin, em dibînin ku bi awayekî prosodîk ji hev têن cihêkirin:

- (74) a. *lawê birê min î mezin*  
b. *lawê(I) birê min î mezin*  
c. \**lawê birê min(I) î mezin*  
d. *lawê birê min ê mezin*  
e. *lawê(I) birê min ê mezin*  
f. *lawê birê min(I) ê mezin*

Di fraza (74.a.)yê de NK nehatiye bikaranîn loma jî yê *mezin*, *law* e. Di fraza (74.b.)yê de NK pişti *law*'ê hatiye bikaranîn û *birê min î mezin* weke yekîneyeke sentaktîk hatiye parastin û ji ber ku rengdêra *mezin*'ê di nav sînorêن wê yekîneyê de maye, *mezin* ji bo *bira*'yî ye. Di fraza (74.c.)yê de ji ber ku berî ızafeya “î”yê NK nikare bê bikaranîn rewşeyeke nerêzimanî çêbûye. Di fraza (74.d.)yê de jî rewş, weke ya fraza (74.a.)yê ye. Weke ku me berê jî gotibû, herçend ne bi qasî forma ızafeya “î”yê jî be ev form jî heye û (74.d.) û (74.a.) li şûna hev dikarin bên bikaranîn. Di fraza (74.e.)yê de NK pişti *law*'ê ye û *birê min ê mezin* yekîneyeke sentaktîk pêk anije ku rengdêra *mezin*'ê di nav sînorêن wê de maye û loma jî rengdêra *mezin* ji bo *law*'ê hatiye bikaranîn. Di fraza (74.f.)yê de jî NK pişti *lawê birê min* hatiye bikaranîn ku di vir de *lawê birê min* weke yekîneya sentaktîk hatiye bikaranîn û em fam dîkin ku *mezin* ji bo *law*'ê hatiye bikaranîn. Baş e, li vir pirseke wisa em dikarin bipirsin: Eger di (74.a) û (74.f.)yê de *law*, *mezin* be û rengdêra *mezin* jî ji bo *law*'ê be, çima em rengdêre nêzîkî navdêra wê bikarnaynin û nabêjin:

- (75) a. *lawê mezin î birê mi*  
b. *lawê mezin ê birê mi*

Belê, ev bikaranîn jî hene lê bi awayekî pragmatîk di maneyê de cudahî heye: Di frazên di (74.a) û (74.f.)yê de fokûs li ser *mezin* e. Lê di (75.a) û (75.b.)yê de fokûs ne li ser *mezin* e lê li ser *birê min* e. Weke me berê jî got, dema ku em ji guvaş û NK îstîfade bikin wê demê di frazeke weke ya (75.b.)yê de fokûsa xurt çêdibe:

- (76) b. *lawê mezin(I) È BIRÊ MI*

**5. Risteya peywendiyê (relative clause):** Dema ku sereya frazê ji aliyê risteyekê tê modîfiyekirin ku bingihaneka (subordinator) “ku”yê, peywendiyê di navbera sere û risteyê de çêdike, ew riste dibe risteya peywendiyê. Bikaranîna *ku*'yê herçend di kurmanciya standart de tendanseke xurt be û di asta îcbariyê

(obligatory) de be jî, di devokên kurmancî de obsiyonel e. Lê li hin herêman herçend dîsa obsiyonel be jî bi awayekî xurt tê bikaranîn:

- (77) a. “... *tiştê gî digot* ...”<sup>44</sup>
- b. “*Gava ku pîrê di xew re diçû* ...”<sup>45</sup>
- c. “... *jinika kû merê wê çûya hecê*”<sup>46</sup>
- d. “*Tiştê mi gotiyi* ...”<sup>47</sup>

**7. Frazên daçekî:** Dema ku daçek bi navdêran re bêñ bikaranîn, frazên daçekî çêdikin. Ew frazên daçekî bixwe jî weke modifiyekera navdêrekî dikarin bêñ bikaranîn.

- (78) a. “... *eskerê li ber derî* ...”<sup>48</sup>
- b. “... *ava li ber bêrma* ...”<sup>49</sup>
- c. “... *marê ser devê kaniyê* ...”<sup>50</sup>
- d. “... *hevalek ji yê we* ...”<sup>51</sup>

### ENCAM

Modifiyekerên sereyên frazekê dibe ku pêşnavdêrî (prenomina) yan jî paşnavdêrî (postnominal) bin û ev tiştekî tîpolojik e. Di kurmancî de û her wiha di devoka Mêrdînê de jî gelek cure modifiyekerên paşnavdêrî hene û ji yên pêşnavdêrî gelekî kompliketir in. Di peyvrêziya frazên navdêrî de ev xalêñ jêrîn tesîdar in û rewşen sentaktîk ên cuda derdixin holê:

1. Topîkalîte, di hinek rewşan de tesîrê li peyvrêziya frazan dike. Ji ber ku di topîkbûnê de hêmana girîng li gor yên din bêtir li pêş cih digire. Çendîkerên partîtif yên weke *hînik*, *gelik* hwd. ji ber rewşa hiyerarşıya topîkbûnê, hem berî hem jî piştî sereyan dikarin bêñ bikaranîn. Lewre di hin rewşan de rolên semantîk yên peyvrêziyê (semantic role of the word order) hene.

<sup>44</sup> Akbaş, Mehmet Şerif. *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn. 2013. r. 13.

<sup>45</sup> Şimşek, Ahmet. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Kercosê De (Wek Minak Şeş Çîrokên Herêma Kercosê)*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn. 2013. r. 15.

<sup>46</sup> Derin, İpek. *Frekansa Tipê Kurdi Devoka Nisêbinê da (Mêrdîn)-Rêjeya Bikaranîna Dengan* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn. 2014. r. 3.

<sup>47</sup> Baş, Abdulhekim. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Qoserê De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn. 2013. r. 11.

<sup>48</sup> Coban, h.b., r. 13.

<sup>49</sup> Coban, h.b., r.15.

<sup>50</sup> Kartal, h.b., r. 19.

<sup>51</sup> Güneş, Mehmet Bakır. *Rêjeya Bikartanîna Dengan Di Di Devoka Tor Abdîn De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstituya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdi, Mêrdîn. 2013. r. 19.

2. Weke hêmanek prosodîk, guvaş di hin rewşan de fonksiyona bêjeyê diyar dike. Weke mînak, dema ku *xalê Ehmed* tê gotin, eger guvaş li ser *Ehmedî* be, wê demê *xal* modifiyeker Ehmed jî sere ye lê eger guvaş li ser *xal* be *xal* sere û *Ehmedjî* modifiyeker e.
3. Prosodî alîkariya diyarkirina sînorê frazan dike. Bi taybetî navbera kurt (minor break) dide zelalkirin ku sînorê frazê heta ku ye û kîjan modifiyeker di nav wê yekîneya sentaktîk de maye. Weke mînak, dema ku “*xwendekar giş (I) hatin*”û “*xwendekar (I) giş hatin*”tê gotin, bi xêra navbera kurt tê famkirin ku di ya pêşî de *giş* modifiyeker e û beşek ji frazê ye lê di ya dawî de hokera lêkerê ye.
4. Di kurmancî de dema ku ji yekê bêtir rengdêr sereyekê modifiye dikin, pozîsyona nêzîkbûn û dûrbûna wan û ya sereyê weke îngilîzî û hin zimanên din ne xwedî cihekî standard in lê rêza wan guherbar (flexible) e. Yanî sentaks û peyvrêziya kurmancî rê dide ku bi hev biguherin û ev guherîna wan jî bi fonksyonen pragmatîk ve girêdayî ye ku tesîrê li şiroveya wan a semantîk dike. Weke mînak, di îngilîzî de dergûşa *xweşik û darîn* bê gotin divê *darîn* nêzîkî dergûşê bê bikaranîn û ev yek li gor hiyerarşıya navbera rengdêran diqewime. Lê di kurmancî de hiyerarşîyeke standard a bi vî awayî di navbera rengdêran de tune, peyvrêziya wan guherbar e û guherîna peyvrêziya wan jî bi rewşa wan a topîkbûn û fokûsê ve girêdayî ye. Ji ber topîkbûn û fokûsê peyvrêziya wan dikare biguhere ku pozîsyona nêzî sereyê topîkbûnê û ya ber bi dawî jî fokûsê nîşan dide. Yanî dema ku fokûs li ser rengdêrê be berî izafeyê tê bikaranîn û rengdêr diçe dawî.
5. Ladana (deletion) pêkhênen hevbeş, çi sere çi jî modifiyeker, tesîrê li peyvrêziya frazan dike. Weke mînak, di fraza *mala koçera û mala bêkesa* de ji sereyên hevbeş yek dikeve û di *xwendekarê zanîngehê û mamosî zanîngehê* de jî modifiyekera hevbeş *zanîngeh* dikeve.
6. Dema ku ji yekê zêdetir temamker û rengdêr ji bo yek sereyê tê bikaranîn, pozîsyona pêşî pozîsyona herî tematîk (thematic) e û ya dawî jî ya herî rematîk (rhematic) e. Loma kîjan modifiyeker bê fokûskirin, diçe dawiyê û ji izafeyê tê istîfadekirin. Weke mînak, dema ku *keça Ehmed û mezin* tê gotin fokûs li ser *mezinê* ye lê dema ku em dibêjin *keça mezin û Ehmed* fokûs li ser bêjeya *Ehmedê* ye.
7. Risteyên peywendiyê ku bi awayekî obsiyonel bi “*gi/go/ku/kû*”yê çêdibin weke modifiyekerên navdêran her dem paşnavdêrî ne û hemû taybetiyên risteyeke normal nîşan didin.
8. Frazên daçekî jî weke modifiyekerên navdêran tê bikaranîn û pozîsyona wan hişk e û ji bilî rewşa çendîkerên partîtîf tu carî berî navdêran nayêñ û modifiyekerên paşnavdêrî ne.

## ÇAVKANÎ

- Akbaş, Mehmet Şerif. *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Alkan, Fırat, *Di Hin Dûrikên Ji Herêma Mêrdîn de Rengdêr*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Arslan Aydîn, Gulçin. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Herêma Torê de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Atış, Ali. *Di Devoka Çiyayê Mazî de Bikaranîna Hevalnavan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2016.
- Ayta, Ramazan. *Çirok û Çîrcîrokên Kaniya Xezalan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Baş, Abdulhekim. *Rêjaya Bikaranîna Dengan Di Devoka Qoserê De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Bilbil, Mikail&Baran, Bahoz. *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul, 2008.
- Bulgan, Bilal. *Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran) Di Devoka Herêma Kercewse De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Ciwan, Murat. *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi / Rêzimana Kurdfî Bi Şîrovekirina Tirkî*, Zekisan Matbaası, Diyarbakır, 2014.
- Çoban, Mehmet. *Bikaranîna Rengdêran Li Herêma Midyadê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Demirkaya, İslameddin. *Di Nava Eşîra Morîkan De Rêjeya Zayenda Bêjeyan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya

- Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Derin, İpek. *Frekansa Tipê Kurdi Devoka Nisêbînê da (Mêrdîn)-Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Ebûzeyd, Sanya Cabar. *Cihgîhorîna Kerestan Di Ristê Da (Govara Badînî)*. Teza Doktorayê, Zankoy Soran - Fakultî Adab - Beşî Kurdî, Kurdistan/Iraq, 2013.
- Bedirxan, Emîr Celadet & Lescot, Roger. *Kürtçe Grameri*, Doz Yayıncıları, İstanbul (sal nehatîye diyarkirin).
- Endley, Martin J. *Linguistic Perspectives on English Grammar: A Guide for EFL Teacher*, Information Age Publishing, inc. Charlotte -America. 2010.
- Erguvanlı, Eser Emine. *The Function of Word Order in Turkish Grammar*, University of California Press, Berkeley-Los Angeles-London, 1984.
- Geniušiene, Emma. "Passives in Lithuanian (in comparison with Russian)" in *Passivization and Typology Form and Function*. Editor: Werner Abraham & Larisa Leisiö, (p. 29-61), John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2006.
- Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume I*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia. 2001.
- Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia. 2001.
- Güneş, Mehmet Bakır. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Di Devoka Tor Abdîn De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Halliday, M.A.K. *Language Structure And Language Function in On Grammar*, Edited by Jonathan Webster (2005), Continuum, London-New York, 1970.
- Hopper, Paul J. "Some Principles of Grammaticalization" in *Approaches To Grammaticalization*, John Benjamins Publishing Company Amsterdam/Philadelphia, 1991.
- Îldem, Abdulkadîr. *Dengbêj Mihemedê Xursî*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Kartal, Lokman. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tûr Abdîn/Torê De (Kercos/Gundê Xerabêna)*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha

- Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Kompe, Ralf. *Prosody In Speech Understanding Sysytems*. Springer, Berlin, 1997.
- Koşar, Fikret. *Bikaranîna Rengdêran di Çirokên Devoka Qoserê (Mêrdînê) de*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2014.
- Larson, Richard & Yamakido, Hiroko. “*Ezafe And The Deep Position Of Nominal Modifiers*” in *Adjectives And Adverbs Syntax, Semantics, And Discourse*. Edited By Louise Mcnally and Christopher Kennedy. Oxford University Press, Oxford. United Kingdom, 2008.
- Lyons, Christopher. *Definiteness*, Cambridge University Press. Cambridge, United Kingdom, 1999.
- Makas, Hugo. *Kurdische Texte im Kurmänji – Dialekte Aus Der Gegend Von Märdîn & Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gâwar; Jezidengebete Apa* – Philo Press /Amsterdam,1979.
- Malmîsanij. M. *Kurmancca Île Karşılaştırmalı Kiramncca (Zazaca) Dilbilgisi*, Weşanxaneyê Vateyî/Vate Yayinevi, İstanbul, 2015.
- Nooteboom, Sieb. “*The Prosody Of Speech: Melody And Rhythm*”. in *The Handbook of Phonetics Sciences. 640-673. W.J. Hardcastle and J. Laver (edit) Oxford: Blackwell*, 1997.
- Qanatê Kurdo. *Rêzimana Kurdî-Kurmancî-Sorani*, ji soranî wer. Zulküf Ergün, Weşanê Nûbiharê, İstanbul, 2013.
- Svenonius, Peter. “*The Position Of Adjectives And Other Phrasal Modifiers In The Decomposition of DP*” in *Adjectives And Adverbs Syntax, Semantics, And Discourse*, Editor: Louise Mcnally and Christopher Kennedy, Oxford University Press, Oxford-United Kingdom, 2008.
- Şimşek, Ahmet, *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Kercosê De (Wek Mînak Şeş Çirokên Herêma Kercosê*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn. 2013.
- Tan, Samî. *Rêzman û Rastnîvîsa Zaravayê Kurmancî*, Weşanê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2005.





## BİBLİYOGRAFYAYA TEZÊN BEŞÊN KURDOLOJIYÊ YÊN LI TIRKIYEYÊ (2011-2016)

Yakup AYKAÇ \*

### KURTE

Ev nivîsar li ser tezên beşen kurdolojiyê yên li Tirkiyeyê nîrxandineke bîbiliyografiik e. Armanca vê nîvîsarê; ji destpêkê heta roja iro ci tez hatîbin nîvîsin digel nîrxandineke gîşti amadekirina bîbiliyografyaya wan e. Ji ber ku di rewşa hazir de li Tirkiyeyê hê tezên doktorayê tune ne, ev bîbiliyografa tenê tezên lisansa bilind di nav xwe de dihewîne. Herwiha sînorêv vê xebatê ew tez in ku, di navbera 2011 û 2016an di beşen *Ziman û Edebiyata Kurdi* û *Ziman û Çanda Kurdi* de hatîne amadekirin. Digel vê bi saya vê nîvîsarê em ê pê bidine zanîn ku li kurdolojiyê zêdetir di kîjan zanîngehê de ci mijar hatîne xebitîn, di kîjan sehayê de xebat hatîne kîrin, bi ci ziman an jî zaravayê hatîne nîvîsin. Li gorî wan agahîyan çarçoveyeke gîşti hatîye danîn.

**Peyvîn Sereke:** bîbiliyograyfa, kurdoloji, bîbiliyografyaya tezên kurdolojiyê, tezên kurdî, kurdolojiyên Tirkiyeyê.

### ABSTRACT

*"The Bibliography of the Theses in the Departments of Kurdishology in Turkey  
(2011-2016)"*

This article is a bibliographical evaluation on the theses of the departments of kurdology in Turkey. The purpose of this article is to prepare a bibliography and is a general evaluation of the theses written from the beginning to the present day. This bibliography covers only master theses since there are no doctoral theses in Turkey at present. In addition, the limits of this study include the theses of the departments of *Kurdish Language and Culture* and *Kurdish Language and Literature* between 2011 and 2016. Furthermore, we will enlighten the readers about these questions: in which universities which subjects were studied; which fields were studied; which languages and dialects were preferred. A general framework has been drawn around this information.

**Key Words:** bibliography, kurdology, bibliography of theses of kurdology, theses of kurdology, kurdologies in Turkey.

\* Lîkolîner, Zanîngeha Mardin Artuklu, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdi. (Research Assistant, Mardin Artuklu University, Department of Kurdish Language and Literature, Mardin, Turkey)  
e-mail: [yakupaykac@artuklu.edu.tr](mailto:yakupaykac@artuklu.edu.tr)

## DESTPÊK

Bîbliyografa peyveke hevedudanî ye û di zimanê grekî de ji peyvên *biblion=pirtûk* û *graphein=nivîsîn* çêbûye, lê dûre di wateya xwe ya îro de anku *repertuara navêن pirtûkan* hatiye bikaranîn. Cara yekem di sedeya II. de hekîmekî yewnanî Klavdios Galenos di kitêba xwe ya *De Libris Propriis* de hizra bîbliyografyayê di wateya *listeya berheman* de vegotkiye. Piştre gelek keşîş û dîroknaş berhemên bîbliyografik nivîsîne (Malclés & Lhèriter & Acaroglu, 2003:15). Ji ber zêdebûna pirtûk û xebatê nivîskî girîngiya bîbliyografyayê her çûye zêde bûye û vê jî di zanistê de bîbliyografa kiriye şaxeke serbixwe.

Sedema çêkirina bîbliyografyayê ya ewil ew e ku di hemû welatan de û di hemû çaxan de ci berhemên çapkirî hebin bi xêra wê tê zanîn. Gava lêkolînerek di warê zanistekî de dixebite; eger berî wî di eynî warî de xebat hatibin kirin ew ê ji wan ıstifade bike û pê, ew ê lêkolîna xwe pêş bixe, fîkr û tesbîtên nû bîne pê. Ji ber vê hindê xebatê literaturê di xebatê akademîk de gelekî girîng in, loma bîbliyografa di proseya lêkolînan de cihekî girîng digire (Keskin & Pertev, 2015:102).

Herwiha di sehaya kurdolojiyê de jî bi vê mebestê, her çiqas kêm bin jî, çend bîbliyografa hatine amadekirin. Bo nimûne em dikarin navên çend xebatan li vir bidin: *Bîbliografiy Kitêbî Folklorî Kurdfî (1860 - 2004)*, *A Brief Bibliography of Kurdistan and the Kurds, Kurd and Kurdistan's Bibliography, The Kurds and Kurdistan: A Selective and Annotated Bibliography, Kurdish Culture and Society: An Annotated Bibliography*.<sup>2</sup>

Kurdolojî wekî zanistekê ziman, edebiyat û çanda kurdî dihewîne û ji bo têgeha kurdolojiyê gelek pênase hatine kirin. Bo nimûne Alakom vê wiha pênase dike;

“Kurdolojî şaxeke zanistê ye ku bi rîbazeke zanistî li ser ziman, edebiyat, dîrok, folklor û hwd. dixebite. Peyva “kurdolojî” yê ji du peyvan pêk tê ku ev jî “kurd” û “logos” in. Logos (λόγος) peyveke yewnanî ye û di wateya “peyv, zanîn”ê de ye lê belê ev peyv ji zimanê fransî ketiye nav kurdî. Herwiha di kurdî de ji bo vê zanistê *kurdzanî* û *kurdnasî* jî tê bikaranîn” (Alakom, 1991:9).

Digel vê di îngîlîzî de *Kurdish Studies*, di almanî de *Kurdische Studien*, di fransî de *Etudes Kurdes*, di erekî de *Dirasat Kurdiyye* tê bikaranîn (Yıldırımcakar, 2016).

<sup>2</sup> Derheqê wan bîbliyografyayan de ji bo agahiyêن zêdetir bnr. Necat Keskin – Ramazan Pertev, “Bîbliyografyayeke Weşanêن bi Îngîlîzî li ser Folklorâ Kurdan”, *Nûbihar Akademi*, c: 1, j: 3, r. 101-116.

Li Tirkiyeyê xebatên Kurdolojiyê yên akademîk bi awayekî fermî bi beşên Ziman û Çanda Kurdî dest pê kirin. Beşa Ziman û Çanda Kurdî cara yekem li Tirkiyeyê di sala 2009an de bi qanûn û birtyara lijneya wezîran a Tirkiyeyê di binê Enstîtuya Zimanê Zindî yên Tirkiyeyê de digel beşa Ziman û Çanda Suryanî û Erebî li Zanîngeha Mardin Artukluyê vebû.<sup>3</sup> Ev beş bi vekirina xwe ve di sala 2010an de dest bi perwerdehiya lîsansa bitez û bêtez kir û ji wê demê heta roja îro gelek kesan xebatê xwe yên akademîk li vir kirin. Dûre heman beş di sala 2012an de li Zanîngeha Çewlîg, Mûş, Wan û Diyarbekirê jî vebû.<sup>4</sup>

Beşa Ziman û Çanda Kurdî li Mêrdîn û Wanê di bin banê Enstîtuya Zimanê Zindî yên Tirkiyeyê de vebûn. Herwiha ya Çewlîgê jî wisa bû lê beş ne bi navê çandê, bi navê Ziman û Edebiyata Kurdî vebû. Dîsa zanîngehêن Diyarbekir û Mûşê jî beşên xwe di bin banê Enstîtuya Zanistêن Civakî de vekirin. Ji ber vê hindê, di vê xebatê de ji bo ku wan zanîngehan hemûyan di nav xwe de bihewîne, me ew giş wek "kurdolojî" qebûl kirin.<sup>5</sup> Di van zanîngehêن navborî de pêşî li ser navê Enstîtuyê Zimanê Zindî bernameyêن mastirê vebûn û ji beşên curbicur tezên mastirê hatin amadekirin. Piştre di her sê zanîngehêن Mardin Artuklu, Bingöl û Muşê de beşên lîsansê jî vebûn. Herwiha niha li Zanîngeha Dicle û wekî bernameya hevpar li her du zanîngehêن Bingöl û Muş Alparslanê programê doktorayê jî vebûne.

Piştî ku ev beş vebûn û wan xebatên akademîk kirin, ji ber zêdebûna tezên lîsansa bilind û nebûna arşîveke gişî, diviya ku xebateke bibliyografik bê kirin. Em hêvî dikan bi xêra vê xebatê kesên ku di vê qadê de dixebeitin û lêkolîn dikan dê agahdar bibin ka li pêşîya wan di vî warî de çi xebat çêbûne. Dîsa ew ê di diyarkirina mijara tezan de jî rîyekê bide pêşîya xwendekarêن lîsansa bilind.

Di vê xebatê de me hewl da ku bîbliyografyayeke tezên beşên kurdolojiyê berhev bikin. Me rîyeke wiha di metoda lêgerîna xwe de şopand; ji ber neaktîfbûna malperêن beşên kurdî û nebûna lîsteyêن tezan em mecbûr man ku dakevin qadê û di nav arşîvê zanîngehan de wan tezan tespît bikin.<sup>6</sup> Ji bili wê me hin tez jî ji malpera tezan a YÖKê wergirt û xiste nav lîsteya

<sup>3</sup> Di 01/12/2009an de bi hejmara 2009/15597ê, ev qanûn di *Resmi Gazeteyê* de hatiye weşandin.

<sup>4</sup> Di Zanîngeha Tunceli (Dersim) de tenê lîsansa Ziman û Edebiyata Zazakî heye, anku lîsansa bilind tuneye. Herwiha li Zanîngeha Sêrtê wekî enstîtuya zimanê zindî vebûye û li Batmanê jî vekirina wê hatiye pejirandin lêbelê hê aktif nînin û xwendekaran nagirin. Ji ber vê di vê xebatê de wan zanîngehan cih negirtine.

<sup>5</sup> Di bin banê Enstîtuya Zimanê Zindî yên Tirkiyeyê de digel kurdî, zimanê wek erebî, farisî û suryanî jî hene. Lî di vê xebatê de me tenê tezên bi ziman û çanda kurdî re têkildar in hildan.

<sup>6</sup> Di tespîtkirina tezan de ji bo alîkariya Recep Öpentin, Şerif Güzel, Sinan Çakar û Zikrullah Aykaç spasdar im.

xwe.<sup>7</sup> Piştî ku me tezên beşên kurdolojiyê tesbît kirin û lîsteya wan derxistin me agahî û istatistikên wan li gorî zanîngeh, zarave û şaxezanistên kurdolojiyê diyar kirin û ew tesnîf kirin.

Li gorî vê bîbliyografiyê tê dîtin ku li Zanîngeha Bingölê 26 tez, li Zanîngeha Dicleyê 3 tez, li Zanîngeha Mardin Artukluyê 72 tez, li Zanîngeha Muş Alparslanê 8 tez û li Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê 12 tez hatine amadekirin. Di kîjan zanîngehê de xwendevanan çend lib tez nivîsîne wek tablo li jêr hatiye dayîn:<sup>8</sup>

	2012	2013	2014	2015	2016
Zanîngeha Bingöl	-	-	8	14	4
Zanîngeha Dicle	-	-	-	-	3
Zanîngeha Mardin Artuklu	3	15	18	17	19
Zanîngeha Muş Alparslan	-	-	-	4	4
Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl	-	-	-	1	11

Tablo 1: Hejmara tezên kurdolojiyê li gorî salan

Dîsa me dît ku di nivîsandina tezên kurdolojiyê de zimanê kurdî (109 tez) û tirkî (12 tez) hatine tercîhkirin. Di kurdî de jî bi sê zaravayan -kurmançî, kirmancî/zazakî û soranî-nimûne têr dîtin. Di nav wan tezan de bi kurdiya kurmançî 89 tez, bi kurdiya kirmancî/zazakî 14 tez û bi kurdiya soranî jî 3 tez hatine nivîsîn. Tabloya li gorî ziman û zaravayan wekî li jêr e:

	Zanîngeha Bingöl	Zanîngeha Dicle	Zanîngeha Mardin Artuklu	Zanîngeha Muş Alparslan	Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl
Kurdî/Kurmançî	10	-	61	8	12
Kurdî/Kirmancî	7	-	8	-	-
Kurdî/Soranî	-	-	3	-	-
Tirkî	9	3	-	-	-

Tablo 2: Tezên kurdolojiyê li gorî ziman û zaravayan

<sup>7</sup> Dema me ev bîbliyografiya amade kir me hemî tezên ku hatine pejirandin û teslîmkirin hildan. Heye ku hin tez niha qediyabin lê nehatibin pejirandin an jî li ber çapê bin û em negîhişibin wan.

<sup>8</sup> Li van beşan ji bili zaravayên kurdî (soranî, kurmançî, kirmancî/zazakî) bi zimanê tirkî jî hinek tez hatine amadekirin.

me. Me ew wek; dîrok/jînenîgarî, edebiyata klasîk, edebiyata modern, folklor, perwerdehî, wergernasî û zimannasî diyar kirin û tez li gorî wan şaxan parve kirin. Li gorî van şaxan di dabeşkirina van tezan de beşa ku zêdetir hatiye tercîhkîrin edebiyata modern (25%) e. Dûre li gor sedeya wan edebiyata klasîk (22%), folklor (21%), zimannasî (21%), dîrok/jînenîgarî (7%), perwerdehî (4%) û wergernasî (1%) tê. Di tabloya jêrê de li gorî şaxên beşan û zanîngehan hejmara tezan wiha hatine dabeşkirin:

	Zanîngeha Bingöl	Zanîngeha Dicle	Zanîngeha Mardin Artuklu	Zanîngeha Muş Alparslan	Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl
Dîrok/ Jînenîgarî	-	-	6	-	2
Folklor	6	-	14	5	-
Edebiyata Klasîk	9	-	14	2	2
Edebiyata Modern	2	-	21	1	6
Perwerdehî	-	1	3	-	1
Wergernasî	-	-	1	-	-
Zimannasî	9	2	13	-	1

Tablo 3: Tezêñ kurdolojiyê li gorî şaxên zanistan

Li gorî rêza alfabetîk lîsteya tezan wiha ye:

### LÎSTEYA TEZÊN LÎSANSÂ BILIND

Abdolqader, Shivan Mohammed, *Rola Gîreyan di Polguherîna Peyvê de di Kurmanciya Serî Devoka Behdînan da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 213.

Abo, Reber Hussein, *Çîroka Gelek Kurt di Edebê Kurdî da li Başûrê Kurdistanê (1991-2013)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 159.

Açar, Zafer, *Devoka Devera Filistanê*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Çewlîg, 2015, r. 129.

Adak, Reşat, *Di Serdema Meşrûtiyetê de Zanyarekî Kurd: Seîdê Kurdî û Hîzr û Xîtabêñ Wî Derheqê Hîsmendiya Gelê Kurd de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 156.

Adsay, Fahriye, *Romana Kurdî (Kurmancî) ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 131.

Ahmed, M. Araz, *Berawirdiyek di Navbera Morfimên Rêzimaniyêñ Karî di Kurmanciya Bakûr a Stander û Devoka Duhokê da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 141.

Ahmed, Omar Saiwan, *Edebiyatî Enfal le Govare Kurdiyekanî Nawçeyî Germiyan da (1992-2012)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 321.

Ali, Sarhang Omar, *Bingehê Karakter di Romana Hesar û Segêñ Bavê Min ya Şêrzad Hesen de*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 102.

Akboğa, Hasan, *Xelîfe Yûsif û Teqrîza Wî (Metn û Lêkolîn)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2016, r. 150.

Altınlıç, Ümrان, *Xwendineke Baxtînyen di Sê Romanêndi Kurdî de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 108.

Anuk, Nevzat, *Behsê Tirkkerdişê Kurdan de Merkezêk: Enstîtuyê Cigerayışê Kulturê Tirk*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 122.

Apuhan, Danyal, *Vistunikunî Zazakîye Çewlîg di Bawerî Bêbinî de*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 117.

Arslan, Mesut, *Di Dewra Osmaniyan de Weşangeriya Kitêbêndi Kurdî (1844-1923)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 191.

Aslanoğulları, Mehmet, *Lerch'in Zazaki Derlemelerinin Çevrimiyazımı ve Türlerine Göre Sözcüklerin Tahlili*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2014, r. 164.

Asna, Burçin, *Bingöl'de Zazaca Atasözlerinin Tahlili*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2014, r. 135.

Attı, Hikmettin, *Lêkolîneke Folklorî li ser Destana Mem û Zîn*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 313.

Aydoğdu, Yusuf, *Modern Zaza Hikâyeciliği (Tespit-Tahlil)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 65.

Aygün, Muhsin, *Bingöl Yöresinde Kullanılan Zazaca Hayvancılık Kavramları*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 123.

Aykaç, Seyfettin, *Mela Mehmûdê Tiruwayî û Ferhenga Wî ya Menzûm (Metn û Lêkolîn)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2016, r. 159.

- Aykaç, Yakup, *Dîwana Hezîn* (Metn, Lêkolîn û Ferheng), Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 604.
- Babayıgit, Mehmet Veysi, *Íngilizce, Kürte ve Türkçede Zamanların Sözdizimsel Karşılaştırılması*, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistêñ Civakî, Diyarbekir, 2016, r. 101.
- Başaran, Cahit, *Kürt Dilinde Sözlükler*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2014, r. 85.
- Beğik, Mahmut, *Dengbêj Resoyê Gopala* (Jîyan û Berhem), Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 125.
- Beyter, Önder, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî* (Metn û Lêkolîn), Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 242.
- Bilge, Evin, *Jî Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 120.
- Bingöl, İbrahim, *Kîrmancî (Zazakî) de Pêveronayışê Fekê Çewlîgî û Gingimî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 110.
- Bor, Abdulkerim, *Bingöl Yöresi Zazaca Halk Türküleri*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2014, r. 170.
- Bozkoyun, Mehmet, *Çend Çîrokên Herêma Şêxan* (Metn û Analiz), Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 194.
- Bülbül, Mikail, *Di Helbestêñ Cegerxwîn de Rengvedanê Têkiliyên Îqtîdarî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 111.
- Çalıştıran Karabat, Ruken, *Lêkolîneke Giştî li ser Çîrokên Kurdi yêñ Gelêri* (Bi Nimûneyêñ di Weşanêñ Ekola Şamê de) (Vekolîn-Senifandin), Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 305.
- Çeçen, Ramazan, *Di Edebiyata Kurdi de Folklor û Roman li dor Texeyyulêñ Berê Rêçêñ Îroyîn*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 138.
- Çelik, Murat, ‘*Adat û Rusûmatname*’ê Tewayifê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bazîdî, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 230.
- Çeper, Fatime Janez Sar, *Lêkolînek li ser Helbesta Qedrî Can*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 127.
- Çetin, Süleyman, *Kovara Hawarê û Bandora Wê ya li ser Zimanê Kurdi*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 220.

Çiftçi, Metin, *Eqtîdenameyo Zazakî yê Mela Mehemedê Hezanîyî* (*Metno Transkribekerde, Wekenîş û Açarnayîş*), Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 75.

Çiftçi, Tekin, *Di Kilamên Evînî yêng Dengbêjan de Temaya Jinê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2012, r. 187.

Delikaya, Ömer, *Peyvsazî di Kurmancî de: Nêrîneke Giştî*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2016, r. 104.

Demir, Bünyamin, *Çirokên Kurdî li gorî Motîf Îndeksa Stith Thompson (Bi Nîmûneyên Çirokên Mî ze Mihemed)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 286.

Demir, Perihan, *Zazakî de Derheqê Awanî û Antişî yê Karî Ser Yew Cîgêrayîş*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 155.

Deniz, Muhammed İkbal, *Dîwana Seyîd 'Eliyê Findikî (Lêkolîn û Ferheng)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2016, r. 150.

Dolgun, Rıdvan, *Mintiqaya Darahêni-Zikte deTermê Hacetan û Manayanê Hacetanê ke Cuya Rojane de Şuxulyenê*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 128.

Ekici, Abdullah, *Zeynelabidînê Amidî:Jîyan Berhem û Xebatê Wî yêng Destnîvîsî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 235.

Ekinci, Muzaffer, *Lêkolîneke li ser Motifên Lawiran ên ku di Berhema M. Emin Bozarslan ya Rêzeçirokên Lawiran a bi Navê "Meselokên Lawiran" de Cih Digirin*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistêن Civakî, Mûş, 2016, r. 176.

Eminoğlu, Nevzat, *Nêrînek Gelempêri li Mîrektiya Hîzanê: Îlm û Edebiyat*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 133.

Erdoğan, Hatip, *Meselîyê Dormalê Darahêni (Wasif-Metnê)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2014, r. 116.

Ergün, Zülküf, *Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvaniyê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2012, r. 197.

Ersoy, Turgut, *Veracêkerdana Gramerê Zazakî û Kirmancî: Diyalekt Alfabe û Fonetîk Morfolojî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 174.

Eyer, Ahmet, *Kurdêñ Merwanî di Tarîxu 'l-Meyafarqîn a Íbnu 'l-Ezraq de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 145.

Filiz, Mehmet Şirin, *Xebatek li ser Destana Dewrêşê Evdî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 228.

Geyik, Resul, *Hînkirina Kurdi Wekî Zimanê Yekem (Ewil)*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 149.

Gezer, Semih, *Dîwana Mela Yasîn Yusîr (Metin û Lêkolîn)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 262.

Gören, Ebubekir, *Di Romanêñ Erebê Şemo de Folklora Kurdi*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 184.

Gözeten, İbrahim, *Mele Xelîlê Sérîf û Berhema Wî ya Nehcul-Enam (Metin û Lêkolîn)*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistêñ Civakî, Mûş, 2015, r. 191.

Güntaş Aldatmaz, Nadire, *Folklorê Kirmancan (Kirdan/Dimiliyan) Ser o Cîgêrayışê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 248.

Gürür, Zeki, *Dengbêjî di Peywenda Patronajê de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 133.

Hami, Bangen Ibrahim, *Rexneya Civakî di Romanêñ Hesenê Metê da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 130.

Hussein, Hlbeen Mohammad, *Pêkhateyên Diramayê di Hozanêñ Bedîrxan Sindî da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 147.

Hussein, Shreen Jaafar, *Wêne Jinê di Hozana Hevçerxa Kurdi da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 90.

Hussain, Hunar M., *Rollî Rageyandin le Nêzîkkirdnewey Diyalêkte Kurdyekan, Torî Mîdyayî Rudawû be Nimûne*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 165.

Ibrahim, Ibrahim, *Rengvedana Dîroka Kurdi di Helbestêñ Cegerxwîn de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 321.

İlhan, Ziver, *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metin û Lêkolîn)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 178.

Ismael, Abid Camel, *Rengvedana Geşbîniyê di Helbesta Nû ya Kurdi li Devera Behdîman da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 137.

İşik, Burhan, *Berhema Mehmed Uzun a bi Navê Hawara Dîcleyê de Jiyana Kurdan a Civakî*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2015, r. 143.

Jahany, Parviz, *Leyla û Mecnûna Sewadî (Metin-Lêkolin-Şîrove)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 399.

Kan, Ahmet, *Di Zimannasiyê de Morfoloji û Wekî Minak Morfolojiya Kurmancî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 173.

Kan, Güneş, *Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yên Sovyeta Berê de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 177.

Kaplan, Yaşar, *Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzérîn (Lêkolîneke Edebî û Dîrokî)*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2015, r. 184.

Karaaslan, Mehmet Salih, *'Hedersmord' li Swêdê 'Kuştina Namûsi'* *li Kurdistanê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 119.

Karagöz, Naci, *Seçmeli Kürtçe Dersine Karşı Veli Tutumları*, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civakî, Diyarbekir, 2016, r. 77.

Khudhur, Nali Abdullah, *Rexneyên Civakî di Helbestên Abdullah Paşêw de*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 114.

Khudhur, Shemal Khamo, *Praktîzekirna Tiyûra Wergirtinê di Edebiyata Olî ya Ezdiyan da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 255.

Kılıç, Özlem, *Gramerê Zazakî de Derheqê Negatîfîye Yew Cîgêrayış*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 130.

Kırkan, Ahmet, *Mewlîdê Usman Esad Efendiyo Babijî 'Bîyîşa Pêxemberî'* (*Metn û Wekenîtîş*), Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 155.

Kocher, Jasim Mehemed, *Rehendên Derûnî di Hozanêن Rojen Barnasî da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 149.

Koyuncu, Hüseyin, *Di Hin Dîwanêن Kurmancî de Bandora Tesewûfê*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2014, r. 115.

Kurt, Şehmuz, *Nirxandina Pirtûka Hînkirina Kurdî: Hînker -Li gorî Nêrinêن Xwendekar û Mamosteyan-*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 187.

Mahmoud, Barzo Omar, *Şîrovekîrîneke Dêngsazî û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 225.

Mangurî, Rasool Aba Baker, *Bingeħa Wêneyêñ Hunerî di Helbestêñ Hêmin de*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 179.

Moghadam, Shatav Naderi, *Şî'rêñ Şairêñ Yarsan û Hizrê Yarı*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 171.

Mohammed Ghaffar, Nergiz, *Îstatîka Cihî di Romanêñ Sebrî Silêvanî da*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 151.

Orak Reşitoğlu, Sevda, *Helbestvanêñ Jin di Edebiyata Yarsanan de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 141.

Orkin, Şeyhmuś, *Di Berhemêñ Feqîyê Teyran de Hêmanêñ Tesewufî*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistêñ Civakî, Mûş, 2015, r. 176.

Othman, Hayder Mohammed, *Di Helbestêñ Melayê Bateyî da Binyada Hizr û Rûxsarê*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 123.

Öçal, Serdar, *Awayê Lêkirina Navan li Herêma Dêrikê (Lêkolîneke Onomastîk-Sosyolojîk)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 265.

Öztürk, İrfan, *Hîmêñ Helbesta Kovara Tîrêjê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 95.

Öztürk, Serdar, *Di Tradisyonâ Dengbêjiya Kurdî de Şakiro (Jîyan û Berhem)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 144.

Pertev, Ramazan, *Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farisî (Vekolîn-Tekst)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2012, r. 165.

Pesen, Abdurrahim, *Helbesta Arjen Arî (Naverok, Sêwe, Binyad)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015, r. 112.

Polat, Edip, *Di Çend Pexşanêñ Kurmancî de Evînêñ Efsanevi*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 161.

Qader, Zeyad Rashad, *Bi Zaravayê Soranî Helbestêñ Zarakan li Edebê Kurdî de (Zêwer, Goran, Letîf Helmet û Emîn Mehemed)*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 129.

Saadi, Sahand Safeen, *Rehendêñ Dîrokî di Romana "Xewna Zelamên Îrani"* ya Mardîn Îbrahîmê, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 115.

- Saleh, Warin Delshad, *Bekir Begê Erizî (Jîyan û Berhem)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 262.
- Sailh, Tara Mushir, *Hawwata û Firewata le Pendekanî Pîremêrdî Şâîr*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 127.
- Samur, Aziz, *Destana Zembîlfîroş û Gulxatûnê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 157.
- Sezer, Müslîh, *Dîwançeya Seyfîyê Şoşî (Metn û Lékolin)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 209.
- Söylemez, Semra, *Melekan, Gaz ve Muradan Köyleri Zazacasının Ses Değişimi Yönünden Karşılaştırılması*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2014, r. 113.
- Subaşî, Kenan, *Jî bo Zarokan dî Fêrkîrina Kurdî de Rola Mamikan*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 243.
- Tarduş, İbrahim, *Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwerdeya Zarokan de*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 158.
- Taş, Çetin, *Dengsaziya Devoka Çaldiranê*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 115.
- Tunç, Vehbi, *Gılgamış Destanında Sümerce ile Kürtçenin Sosyo-Lingüistik Bağlantısı*, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civakî, Diyarbekir, 2016, r. 143.
- Ulugana, Sedat, *Mîrektiya Bitlîsê di Éwra Evdal Xan de (1618-1664)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 83.
- Üneşi, Aydin, *Tesrîfa Teremaxî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 125.
- Varol, Murat, *Abdulaziz Bekî'nin Divani (Metin-İnceleme)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2015.
- Yaman, Raif, *Fonemên Kurdoglû Gerokên Ewrûpî û Amerîkî ji 1787an ta 1887an pê bi Kurdî Nîvîsîne*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 166.
- Yavuzer, Mehmet Nur, *Baba Tahir di Wêjeya Kurdî de*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Wan, 2016, r. 323.
- Yergin, Mehmet, *Mewlidê Mela Ehmedê Xasî “Mewlidu ‘n-Nebiju ‘l-Qureşîyyî” (Metn-Wekeitiş)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanê Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 218.
- Yeşilçınar, Fehmi, *Jîyan û Kilamên Dengbêj Ahmed Alîksan*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2016, r. 254.
- Yeşilkaya, Şahap, *Edebiyatê Kirdkî (Zazakî) de Mewlid û Mehemed ‘Elî Hunî*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Çewlîg, 2014, r. 165.

Yeşilmen, Davut, *Temaya Sirgûnê di Çar Romanên Kurdi* (*Kurmancî*) de, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 163.

Yıldırımçakar, Adil, *Bedîuzeman Seîdê Kurdi û Projeya Wî ya Medresetu Zehra*, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Wan, 2016, r. 216.

Yıldırımçakar, Mehmet, *Heyranok di Edebiyata Kurdi ya Gelêri de Mînaka Hêrêma Wanê*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistêñ Civakî, Mûş, 2016, r. 140.

Yıldırımçakar, Ziyattin, *Werger wek Kirineke Çandî, li ser Riyên Wergernasîyê ber bi Kurdolojiyê ve*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 111.

Yıldız, Ayhan, *Qewlê Hespê Reş*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 181.

Yıldız, Pınar, *Mehelî û Kîrmâncîya Înan*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 176.

Yılmaz, Abdurrahman, *Zazaca-Türkçe Sözlük (Genç-Bingöl Yöresi)*, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Çewlîg, 2015, r. 190.

Yılmaz, Ferhat, *Berawîrdkirinek li ser Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2015, r. 125.

Yılmaz, İsa, *Vekolîmek li ser Çîroka Zembîlfîros*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistêñ Civakî, Mûş, 2016, r. 217.

Yılmaz, Serdar, *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî Metin û Lêkolîn*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2013, r. 149.

Yonat, Mehmet, *Kovara Nûdemê û di Kovara Nûdemê de Sopêñ Surgunê*, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistêñ Civakî, Mûş, 2015, r. 144.

Yousif, Hajar Kamal, *Wata di Diyaloga Karîkatêrê Kurdi da (Vekolîneka Sîmantîkî û Pragmatîkiye)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2014, r. 115.

Zilan, Bilal, *Di Kitabê Muhemedê Şêx Ensarî: "Raro Raşt" û "Melûmatê Dînîye"* (Metn û Cigêrayış), Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanêñ Zindî, Mêrdîn, 2016, r. 200.

## ENCAM

Piştî ku besên kurdî li Tirkiyeyê vebûn di nava çend salan de gelek xebatê akademîk hatin kirin. Dema mirov li vê maweya kurt -5 sal- dinihêre dibine ku berhemên baş hatine dayîn. Ji van xebatan jî diyar dibe ku kurdî eger îmkanêne wê zêdetir bin ew ê berhemêne wê jî zêdetir bin.

Di vê xebata me ya bîbliyograyayê de diyar bû ku li Tirkiyeyê di besên kurdolojiyê de 121 tez hatine amadekirin. Me dît ku xwendekaran di nivîsandina wan tezan de digel kurdî, zimanê tirkî jî tercîh kirine. Di zimanê kurdî de jî xwendevanan herî zêde bi zaravayê kurmancî paşê bi kirmancî û dûre jî bi soranî tez nivîsîne.

Eger em nirxandinek li gorî şaxêne zanistan bikin sehayêne wek folklor, edebiyata klasîk, edebiyata modern û zimannasî hema qasî hev in lêbelê di sehayêne perwerdehî, dîrok û wergernasiyê de kêmter xebat çêbûne. Ev jî destnişan dike ku divê xwendekarêne lîsansa bilind di warê fêrbûn, hînkirin, kitêbêne hînkerêne kurdî; werger, teoriyên û cureyên wergerê, dîroka wergernasiyê û herwiha sehaya dîrokê de bêne kanalîzekirin.

Herwiha armanca herî mezin a vê bîbliyografyayê ew bû ku di vî warî de çi xebat hatibine kirin bêne tesbîtkirin. Me jî bi vê armancê hemû tezên kurdolojiyê yên navbera 2011-2016an berhev kirin da ku di vî warî de, kesen dixebeitin re bibe xizmetek û di heman demê de xebatê li ser heman berhem an jî mijarê neyên kirin û dubare nebin.

## ÇAVKANÎ

Alakom, Rohat (1991), *Kurdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişî (1787-1987)*, Deng Yayınları, (ç. 2.), İstanbul.

Cabolov xebata xwe bi belgeyêñ li ser du zimanê edebî yên mezin yên roja me, kurmancî û soranî û hinek varyantêñ wan yên lehçeyî, sînordar kiriye. Di rastiyê de materyalêñ wî bi kar anîne, ji xebatêñ vê dawiyê yên MacKenzie, Bakaev, Kurdoev, Bedirxan û kesêñ wekî wan hatine hilgirtin ; bi gotinek din, ji belgeyêñ derheqê kurmanciya normalizekirî ya Ermenîstan, Azerbaycan, Turkmenistan û hemî lehçeyêñ kurdî yên Iraqê hatine wergirtin. Xuya ye ku wî xwestiye agahiyêñ piştraskirî bi kar bîne û xwe ji agahiyêñ di berhemêñ kevin de ku car caran kêmas hatine bikaranîn, bide paş. Xwezî Cabolov behsa zaravayêñ kurdiya Îranê yên ku Kaj Barr li ser xebitiye jî kiribûna û hîpotezêñ wî yên nimûne li pêş çav girtibûna.

Ji aliyê din, bikaranîna formêñ avestî û kevne-farisî, û raveya daneyêñ ji diyalektolojiya îraniya kevin (d'iranien ancien) hergav qanîhker nînin. Bo nimûne, bêjeya *suwar* (Oč. fon., r.59), bêyî ku agahiyekê zelal li ser binetara wê ya rast bê dayin, bi bêjeya *\*aspâ-bâra-* (forma jinûveçêkirî) ya îraniya kevin û bi *asa-bâra-* ya farisiya kevin ve hatiye girêdan. Lê bêjeya *hesp* (neql. r. 60) baş nîşan dide ka kurdî çawa *\*kv* ya hind-ewropayî wergirtiye. Di taliye de mirov dikare bibêje ku bêjeya *suwar* ji farisî hatiye wergirtin, her wekî navê *se(k)* (soranî *sag*), çawa ku Justi jî amaje pê kiribû (r.XI).

Di taliyê de Cabolov gelek “*berhemêñ jî rêza duyem*” yên li ser zimanê kurdî ku di demeke dirêj de hatine amadekirin bi temamî îhmal kirine. Pêwîst e mirov piçekê li ser vê yekê raweste. Me di vê kurte-nexşeya xebatêñ dîrokî yên li ser zimanê kurdî de tenê behsa berhemêñ sereke yên derheqê vê mijarê de kir, lê lazim e neyê jibîrkirin ku zimanê kurdî, ji dawiya sedsala borî heta îro, di gelek berhemêñ lingüîstîk yên îranî de hatiye bikaranîn. Mirov bi hebûna gelek bêjeyêñ kurdî di berhemêñ Bartholomae, Geiger, Geldner, Hübschmann, Horn, Güntert hwd., û di vê dawiyê de di berhemêñ Bailey, Gershevitch û gelek kesêñ din de qet şas nabe. Xwezî etîmolojiyêñ di nav wan hemî berheman de berbelavbûyî, hatibûna berhevkinin.

Wekî gelek tiştêñ din, nabe ku rola zimanê kurdî di nîqaşêñ derheqê binyata zimanê Hîndo-Ewropayî de leyîstî bi rêya şêwaza bikaranîna argumana “*hêtre*” (Buchenargument) ji aliyê Henning, Mayrhofer û Eilers ve, bête jibîrkirin. Ev yek, wê tesbîta ku sed sal berê ji aliyê Justi ve hatibû kirin li ser resenî û xwe-parastina terîmêñ kevin di nav lekzîka zimanê kurdî de piştrast dike.

Eger behsa xebatêñ zimannasêñ kurd yên li ser zimanê kurdî neyê kirin, ku hejmara wan roj bo roj zêdetir dibe, ev kurte-gotara me ya li ser xebatêñ dîrokî yên zimanê

\* *Di gotara resen ku di kovarê de hatiye çapkîrin de jî ev jêrenot nehatiye nivîsin (w).*

\* *Di gotara resen ku di kovarê de hatiye çapkîrin de jî ev jêrenot nehatiye nivîsin (w).*

kurdî wê kêmas bimîne. Hemî xebatên dîrokî ku bi kurmancî û bi soranî têن weşandin (çi wekî pirtûk çi jî wekî gotarêن kovarên edebî), rasterast dibin delîlê hesta kurdan, li hember dîroka zimanê wan.

Helbet ew xebat nîşanên pêşveçûneke mîsoger in. Lî dibe qet neyê jibîkirin ku pêşveçûna wan, girêdayî pêşveçûna hemdemî ya lêkolinêن zaravayî ye. Wekî em baş dizanîn, kevnariyêن (archaïsmes) morfolojîk û şopêن lezkikî dikarin bi awayekî berfireh, car caran veqetiyayî di nav hinek zaravayêن tecrîtkirî de, bi gotinek din di nav zaravayêن xwe-parêzer (conservateur) de bimînin. Bo ya pêşveçûna kurmancî, zazakî û soranî wekî zimanêن normalîzekirî ku em pê bextewar in, dikare bibe sedema windabûna delîlên berketî ji bo dîroknasêن zimanî. Ji ber vê sedemê pêwîst e ku li Îranê û li Tirkîyê li ser zaravayêن kurdî bi lez û bi rîbazeke sîstemâtîk xebat bêñ kirin.

Lêkolinêن dîrokî bivênevê rî li ber peydabûna pirsgirêkên mezintir vedikin, wekî peywendiyêن di navbera zimanê kurdî û zimanêن din yên îrani yên modern û yên kevnar de, yan jî wekî zaravakirina (dialectalisation) devokên kurdî bi xwe li ser bingeha resenî û çêbûna zimanê kurdî. Ew mijarêن berfireh in û mirov li vir tenê dikare bi bîr bîne.

Li gel hemî kêmasiyêن belgeyî, xuya ye ku birkirina zaravayêن kurdî di nav sê grubêن mezin de, bakur-navend-başûr- êdî baş rûniştiye û bi ihtimaleke mezin lêkolinêن dahatûyê wê xwe bi zarîfkirina kurmanciya dewlemend û pircure ve sînordar bikin.

Di nav çarçoveya zaravanasiyê de, pirsgirêka substrat<sup>4</sup> derdikeye pêş. Minorsky û bi taybet Kaj Barr (hb., rr., 112-113) bal kêşane li ser hebûna substrayeke guranî di nav kurdiya başûrî ya îro de ku *v*-ya kevin wekî herfa destpêkê tê de hatiye parastin; *v*-ya guranî (binêrin bêjeya *va*) di kurmancî de bûye *b*- û *va*- bûye *ba*. Li gorî vê fikra ku heta Andreas diçê, mirov dikare iddia bike ku kurd ji aliyê rojava ve hatine vê herêmê.

Ger bi wî çavî lê bête nêrîn, diyar e ku bi layîqî bal nehatiye kêşan bo ser taybetmendiya girîng ya dengnasiya kurmanciyê, ya ku xwedî sîstemeke dengdaran a ji sê rêze dengdarêن peqok (occlusive) pêk tê, ku mixabin di elîfbêya kurdî ya îro de jî nayêne nîşandan. Bo nimûne, dengdarêن bandevî (vélaire) yên bêjeyên *ker* (kař) “yê nabihîze”, *ker* (k’ar) “heywana dêya dahşikan” û *ger* (gâr) “geryan”. Bi nêrîna min, sedemêن guherîna du dengdarên nedengdayî (phoneme sourd) hêj baş nehatine destnîşankirin, her çiqas ji mînakêن jorîn ya yekem ji dengdareke peqok a nedengdayî ya kevn (di zimanê avestî de *karəna-*), ya duyem jî ji dengdareke xişok (av. *xara-*) hatibin jî. Bes li vir mijara me ne ev e.

<sup>4</sup> Terîma substrat tê wateya «hebûna şopêن kevne-zimanekî di nav zimanê hemdem yên li heman deverê têن axaftin »(nota wergêr).

Ev sîstem bi çi sedem di kurmancî de peyda bûye? Bê guman ev nûbûnek e (innovation), zîra ne di zaravayên din yên kurdî de, ne jî di zimanên îranî yên din de tiştek bi vî rengî nîne. Mirov dikare vê yekê wekî diyareyeke substratê bibîne, çinkû di zimanê ermenî de sîstemeke konsonantîk ya analog heye ku di nav wî zimanî de bi serê xwe nûbûnek e. Divê neyê jibîrkirin ku di osetî de jî, zimanekî îranî ku li Qefqasyayê tê axaftin, heman taybetmendî heye. Li vir em dikevin nav warekî linguîstîk yê “qefqasî” ku sînorêne wê digehin Anatolyaya Navîn.

Di bin ronahiya vê agahiyê de mirov dikare bibêje ku jîngeha prîmîtîf ya kurdan li vê herêma ew niha lê dijîn nîne. Bes ji aliyê din ve, ji ber ku ev sîstem li ser dijberiyêne kevin ava bûye, ne mimkun e ku ev di demeke nêz de peyda bibe. Bo ya mirov dikare îddia bike ku Kurd jî ji mêt ve, bi ihtimaleke mezin berî serdema îslamî, hatine vê herêmê.

Xebatêni ser peywendiyêni zimanê kurdî li gel zimanêni din yên modern yên îranî, perspektifîn nû derdixin pêşıya mirovî. Ev pirs çendin caran hate vekolîn, bi taybet ji aliyê Tedesco, Windfuhr, Mackenzie û çend kesen din ve. Min bi xwe bal kêşaye ser çend nûbûnen hevpar di zimanê kurdî û di zaravayêni navenda Îranê de.

Her wisa di kurdî de pêşgireke lêkerê ya dudanî heye ku di çêkirina dema niha û dema domdar de tê bikaranîn, wekî *di-kim-a* kurmancî û *de-kem-a* soranî. Heman qalib di zaravayêni kermanî (ku li navenda Îranê, li derdora Isfahan tên axaftin) de hene, bo nimûne di mahallati de *at-kirôn*, di xunsarı de *et-kerân*, û hwd. Ji aliyê din ve, di kurdî de lêkera *hatin-* di dema niha de xwedî qalibeke sosret e, *ez têm*. Xuya ye ku *t-ya* destpêkê bûye pêşgira domdariyê a ku di nav lêkerê de cih digire. Di gelek zaravayan de, ji xwe, pêşdaçeka domdirêj di nav hemî lêkeran de bi awayekî berdewamî *t- ye*. Jixwe heman fenomena tevxistinê (*incorporation*) di gelek zaravayêni kermanî de jî heye: di qohrudî de *attûn* “ez têm”, di abuzeydâbâdi de *otô*, di ardestâni de *torô* hwd., eynî fenomen di nav hinek gotinêni din de heye ku bi dengdêran dest pê dikin.

Paşê, zimanê kurdî xwedî sîstemeke paşgirêni cînavî ye ku bi rêya navê sêyem yê yekjimarî xwe ji zaravayêni din yên îranî cuda dike: -*î*(di farisî û zaravayêni din de -*es*), zîra heman paşqertaf tenê di zaravayêni kermanî de hene. Mirov dikare behsa gelek hevpariyêni din bike, bi taybetî di warê leksîkal de.<sup>5</sup>

Li gorî agahiyêni ku îro di destêni me de ne, (di vê mijarê de) gihiştina encamên piştrast gelekî zext e. Gelo mirov dikare disa jî îddia bike ku kurdî û zaravayêni kermanî, ji heman zaravayê îranî yê kevin paş-ketine? Yan jî mirov dikare şibîna wan bi rêya cîrantiyeke domdirêj rave bike? Hem di halê yek-binetarî de, hem jî di halê peywendiyêke domdirêjî de lazim e ku lêkolîn ji dîrokeke gelekî kevin bête destpêkirin.

<sup>5</sup> Mijara berawirdkirina kurdî li gel zaravayêni kermanî wê di pêşerojê de di nav xebateke din de bi awayekî taybet bête lêkolîn.

Wisa xuya ye ku zaravayêner kermanî ji mêt ve li herêma xwe ya niha têna axaftin: ci hevpariyêner wan li gel grubêner din yên zaravayî nînin; civakêner bi wan zaravayan diaxivin naşîbîne civakêner xwedî kevneşopiya koçerî û ew zarava di bajarêner geleki kevin de peyda bûne. Bo ya beraqilane ye ku mirov rojavayê rêze-bajarêner Kasan-İsfahan û Yezdê, bi gotinek din territoryaya Medyaya kevin, wekî landika kevnar (berceau primitif) ya kurdan bi nav bike.

Ev yek rê li ber lêkolîna peywendiyêner di navbera kurdî û kevne-zimanê iranî de vedike. Pêwîst e ku mirov xwe ji çêkirina peywendiyêner di navbera kurdî û zimanê avestîk de bide paş; rehêner zimanê avestîk hêj baş nehatine eşkerekirin û ew tenê bi rîya belgeyêner li Iranâ rojhîlatî, yanî li Efganîstanê peydabûyî tê nasîn. Farisiya ku bi saya kitabeyêner (inscriptions) sedsala VIan hatiye nasîn, xwedî taybetmendiyêner xweser û resen e.

Li ser zimanê medî her tişt dikare bête gotin bêyî ku tişték bête îspatkirin, bo ya pêwîst e ku mirov di vê mijarê de xwe ji nêrînen xapînok bide paş. Bi saya bêjeyêner medî yên di nav kitabeyêner akamenî de hatine tesbîtkirin, nasîna zimanê medî bi awayekî izafî mîsoger bûye, bes di heman demê de agahiyêner me yên li ser wî zimanî ji gelekî sinordar in. Ci tişt iddiaya paş-kirina zimanê kurdî ji zimanê medî pûç nake, bes ci tişt vê iddiayê piştrast ji nake, her wisa dibe neyê jibîtkirin ku ji ber sedemêner jeografîk yên teqez, ji bo zaravayêner iranî azerî û talisî ji mirov dikare heman iddiayê bike.

Dîsa ji mirov dikare, bi saya şibîna pêşveçûnenê zaravayêner din yên rojavayî, bi hişyarî hîpotezekê pêşniyar bike. Wekî Strabon ji bi gotineke xwe ya meşhûr bi derengî ev yek piştrast kiriye, xuya ye ku di serdema akameniyan de di navbera zimanêner cûda yên iranî de hevûdufamkirin (intercompréhension) mumkin bû. Bes lazim e ku pêvajoya zaravabûnenê (dialectalisation) berî hingê dest pê kiribe. Farisiya kevin, medî û avestîk vê demê ji xwe bûbûn zimanêner cuda. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku wekî gîlekî û mazenderanî û hwd., kurdî ji di vê demê de ji xwe pêk hatîbû (constituté).

Teqez ev “kurdiya kevin” xwedî cewazî bû li gel zimanê modern û mirov nikare bibêje kanê kurdiya modern di kîjan demê de peyda bûye. Ger em behsa farisiya “modern” bikin, ew di destpêka serdema îslamî de çêbûye. Bes bi nêrîneke lingüîstîk, farisiya navîn ya belgeyêner sasanî yên sedsala IIIyan, dikare wekî “farisiyeke” arkaik bête dîtin. Li gel vê, ew di nav fonetîk û morfolojiya xwe de raçandiye û bi nisbet farisiya kevin ku di dawiya sedsala IIIyan de (berî zayînê) di kitabeyêner akamenî de cih digire, nêzîktirî farisiya modern e.

Ev tê wê wateyê ku di nav pêncsedsalan de, di zimanê farisi de gelek guherînen mezîn çêbûne: ketina paşgirêner tewangê, windabûna cudatiya cinsê navan, hilwehiyana sistema lêkerê û bi awayekî giştî derbazbûna ji cureyê zimanekî

“sentetîk” bo cureyê “analîtîk”. Dibe neyê jibîrkirin ku di heman serdemê de guherîneke bi vî awayî di zimanê partî de jî çêbuye.

Di teksteke jibîrkirî ya Antoine Meillet de ku ji aliyê O. Szemerényi ve ji nû ve hatiye pêşkêşkirin (*Recherches de linguistique. Hommage a Maurice Leroy*, Bruxelles, 1980, rr. 206-2014), zanyarê berawirdker li ser sedemên wan guherînên demkurt ku li ser struktura zimanan şûn hêlayî, difikire. Li vir em nikarin bi hurgilî behsa vê mijarê bikin, bes wisa xuya ye ku ev pêvajoya kêmkerî (réducteur) ku sîstemên fonetîk hêsan dike û morfolojiyê ji hêzê têxe, bi piranî di xizmeta sentakseke bi hêzir û dewlemendkirineke idiyomatîk de, di dema belavbûna zimanekî û zêdebûna qisekerên wî zimanî li ser terîtoryayeke mezin de peyda dibe. Berevajî vê, zimanek ku di xwe de hejmareke mezin ya arkaîzman dihebîne, wekî zimanê kurdî bi nisbet farisî, li ser qisekerên xwe bêhtir îstîqrarê ferz dike. Bi gotinek din, zimanê kurdî kariye ji tevlîhevbûna mezin ya gelên li ser xaka Îranê peydabûyi, di serdema selukîyan û di dema dagirkeriya eşqaniyan de, bifilite. Bes mirov nikare tiştekî din li vê mijarê zêde bike. Eger mirov piştrast bûya ku “Kurd”ên di pirtûka pehlewî ya bi navê *Karnamag-î Ardaşêr-î Papagan* de behsa wan tê kirin, bapîrên kurdên roja me ne, wê çaxê mirov dê karîbûya bibêje ku kurd û kurdî di destpêka serdema sasanî de, li herêmeke nêzî vê herêma ku me bi rêya linguîstîk destnîşankirî, peyda bûne.

190

Gelo dikare bê iddiâkirin ku berbelavbûna kurdan di destpêka Karmeniya kevin de (ancienne Carmanie), di dema pêşveçûna partan ya di navbera sedsalên IIIyan û Ilyan de (berî zayînê) çêbûye ku di heman demê de beşek ji wan derbazî Anatolyaya Navîn bûne û beşekê jî berê xwe dane xaka guranî, herêma ku dikeve başûrê Kurdistana Îranê ya îro?

Teqez ev hemî dimînin konjonkturel û pêwîst e em hêvî bikin ku lêkolînên li ser jeografiya zaravayan, li ser topomiyê û lêkolînên nû û kûr derheqê çavkaniyênerrebî, ermenî, asûrî, bîzansî û hwd., ronahiyeke nû bêxine ser vê mijarê.


\*\*\*\*\*  
**Çend agahî li ser nivîskar :** *Akademîsyenê frensî Pierre Lecoq di sala 1939an de ji dayîk bûye. Xwedî doktoraya wêjeyê ye û heta sala 2004ê endamtiya Yekineya cîhana îranî û hindî ya CNRS ê (Navenda Neteweyî ya Lêkolînên Zanistî li Fransayê) kariye. Her wusa li Zanîngeha Sorbonneê, di beşa zanistên dîrokî û felsefî ya Ekola Pratîk ya Xwendînên Bilind (EPHE) de serperiştiya lêkolînê kiriye û li vir dersên zimannasî û filolojiyê dane. Pierre Lecoq di heman demê de li Ekola Louvreê jî dersên epîgrafiya farisiya kevin û zimanên îranî yê serdema navîn dane (y.ö).*

## Kitap Değerlendirmesi | Book Review



## NIRXANDINA PIRTÜKAN

Seyid Qedrî Haşimî, *Dîwana Irfan* (M. Nesim Doru-Edîsyon  
krîtik-amadekar), Nûbihar, Stenbol, 2016



Bêguman di xebatên edebiyata klasîk de pêngava yekem, tîpguhêzî, saxkirin û çapkirina dîwanê kurdî ye. Lewra tevahiya dîwanê klasîk ên kurdî bi alfabe ya kevin a erebî hatine nivîsîn û piraniya xwînerên iro jî nikarin ji van berheman sôd wergirin. Ji ber vê xebatên tîpguhêzî û saxkirina dîwanê kevin hem ji bo danasîn û derxistina sermiyanê edebiyata kurdî hem jî ji bo gihadina xwînerên hevçerx karekî girîng e.

Herçend her dem û dewranek xwedî çêjeke taybet a edebî be û teşe û cureyên taybet bi serdema xwe biafirîne jî ez di wê baweriye de me ku edebiyata klasîk di roja iro de jî bi çej, têgihîstîn û xeyala xwe ya taybet hêjayê xwendinê ye. Jixwe bê xwendin û nasîna edebiyata kevin û bê agahdarbûna ji nerîta edebî mirov nikare behsa çandeke pêşketî û dewle-mend a edebî bike.

Her di vê çarçoveyê de xebata M. Nesim Doru ya Dîwana Seyid Qedrî Haşimî di vî warî de mînakeke serkeftî ye, lewra navborî, bi awayekî rêkûpêk tîpguhêzî û saxkirina dîwanê dike û şâşî û kêmasyîn çapên pêşî sererast dike. Ev bixwe karekî girîng e, lewra dema dîwanê kevin li ser destê kes û dezgehêن şareza neyê amadekirin gelek caran dibin sedema belavkirina şâşî û çewtiyan û di şûna sôdê de ziyanê digihînin xwîneran.

Doru di edîsyon kritîka Dîwana ‘Irfanê de her sê destxetên Mela Ebdurrehman Erzen, Cemal Doğramacı û Mela Ebdullah Dêrgulî û her du çapên dîwanê yên Süleyman Kaya û Tehsîn Îbrahîm Doskî dinirxîne. Lê bi gotina wî destxeta Mela Ebdurrehman Erzen dike bingeha xebata xwe û ciyawaziyêñ çap û destxetên din jî bi jêrenotan berçav dike. Vekoler, piştî pêşgotinekê di destpêkê de bi kurtî behsa jiyaney Seyid Qedrî dike û paşê ji aliyê karîgerî û hizra tesewiffi li ser berawirdkirina Dîwana ‘Irfan û Dîwana Melayê Cizîrî radiweste.

Diyar e, ji ber hevbajarîbûn, hizra tesewiffi û desthilata berçav a Melayê Cizîrî li ser helbesta klasîk, Seyid Qedrî bi awayekî berbiçav ketiye bin karîgeriya Mela. Ji ber vê, ji bilî ku sê helbestêñ Mela texmîs û helbesteke wî jî tesdîs kiriye ji aliyê peyv û wêneyêñ helbestî ve jî sûd jê wergirtiye û di helbestêñ xwe de çêj û bêhna Mela bi xwîneran daye hesandin. Bo nimûne di van beytêñ jêrîn de em rastî vê diyardeyê têñ ku her xwînerekî Mela bi awayekî aşkera hest bi peyv û îmajêñ Mela dike.

Tu hebîba Hewreman î, Yûsufê dewr û zeman î  
Tole yim ser asîtanî, der rehê xunkarê ma

...

194

Şefqeya xaqan û mîran, purs bikin l' halê feqîran  
Bîn reha kin van esîran, j' silsil û zencîrê ma (r. 28)

Me sîne pêht û ateş bû me hêstir j' dîdeyê reş bû  
Me tali‘ sorgula geş bû me dî iro di falê da (r. 30)

Ev çi mescid çi kiniş in, çi cilîpa û çi dêr  
Her tu yî tu li me mehbûb me xû zennari nebest (r. 44)

Îro me dît dilber-şepal weqtê seher hatî xiram  
Zulf ji miskê daweşandî j' ‘aqil û hoşî revam (r. 98)

Ya Reb bi dîdara xwe kî, wî wasilê lutfa xwe kî  
Qedrî ji wî mehrûm nekî, (nehnu ileyhî wasîlûn) (r. 111)  
Ji bilî karîgeriya berbiçav a Melayê Cizîrî, Seyid Qedrî bêtir dûajoyê wê nerîta helbesta klasîk e ku di sedsala 19an de li dor xaneqayêñ terîqeta Neqşebendî berbelav

dibe. Ji ber vê, herwek taybetmendiya vê nerîtê di navenda helbestên Seyid Qedrî de jî motîvasyona vê terîqetê û evîna Husamedînê şêxê wî tê dîtin. Helbestvan, di çendin beytan de Şêx Husamedîn wek murşîd, şah û rîber dide zanîn û xwe jî wek şeyda, dîn û tolê evîna wî dide nasîn. Ji bilî hezkirina Şêx Husamedîn di çend beytên xwe de digel ku ne Qadirî ye jî hezkirina xwe ji bo Şêx Ebdulqadirê Geylanî jî diyar dike ku di nav pêşengêne tesewifê de xwedî cihekî bilind e.

Der sera û şehneşîna, Qedriyê şeyda û dîna  
Murşîd’im şahê emîna, ceddê şahê Kerbela

...

(La we la) wehdet-meqam im, şeyxê cinn û ins û ‘am im  
Rehberê’m şahê’m Husam im, (min tebeqati’l-‘ula) (r. 39)

Seranser neynika kesk im heqîqet  
Husamuddîn sutûr e lê ku her ez (r. 65)

Ez xulama wê şepalê bûme heyran wê cemalê  
Ez dikim daim xiyalê da xwuya bit şah Husam (r. 98)  
Qedrî tu yî tolê Husam, ey dilbera bedra temam  
Qedrî tu yî her dem xulam, j’ bo zîneta şahê xwe ye (r. 153)

Mucazê şahê sultan im, xulamê Xewsê Geylan im  
Xidamê şahê ‘irfan im, Behauddînê Faxir tê (r. 150)

(Bi hemdillahî we’l-minne) ji lutfê Heyyê subhanî  
Şodem ‘aşiq bi zikrê Hey derê erkanê Geylanî (r. 165)

Yek ji taybetmendiyêne Seyid Qedrî jî ew e ku di gelek helbestên xwe de şanazî bi seyîdbûna xwe dike û bi pesn diyar dike ku ji nesla hezretê Huseynê kurê hezretê Elî û neviyê hezretê Mihemed Mistefa ye. Ji ber vê çendê bi “nesla xwe ya ali” şanazî dike û xwe wek “ferxê şêran” dide zanîn. Diyar e, di vê pesindanê de ji hesta esaletê bêtir hesta dînî û tesewiffî li pêş e, lewra kesayetên navborî ji bilî ku bavûkalên wî ne, di heman demê de çavkaniya hizra tesewiffî ne jî ku hemû terîqêne tesewifê xwe

dighînin vê çavkaniyê.

Peyrewê Şahê ‘Elî bûm kî ew e şêrê Xuda  
Kî men em neslê Huseyn serwerê şahê şuheda (r. 40)

Ez dikim sed şukrê tame, ku ji nesla Mustefa me  
Ew resûlê xas û ‘am e, ya reb kes mehrûm nedar (r. 55)

Menal ey Qedriyê Seyyid neseb-‘al  
Bişû dil saqiyê hewda Peyemer (r. 59)

Çi perwan bû perr û dil sot, ji nasot ta heta lahot  
Îşaret da yekayek got, Hezînê ferkê şêran e (r. 129)

Namê min Qedriyê ewladê Huseynê Mustefa  
Serwerê cem ‘ê şehîdan bê bedel ender cîhan (r. 130)

---

196 Seyid Qedrî digel ku di demeke nêzîk de jî jiyaye, ji aliyê ziman ve bi tevahî li ser nerîta helbesta klasîk maye û di nav vê nerîtê de zimanekî edebî yê xurt bi kar anîye. Loma jî di hin beytên xwe de li ser vê nerîtê gotinên erebî û farisî têkelî nav kurdiya xwe kiriye û hostatiya xwe ya bikaranîna van zimanên klasîk nîşan daye.

Qewlê zahid batilest der mezhebê ma purr xilaf  
Karê se‘best ïn mu ‘emma qet nemî başed xilaf (r. 73)

Kes nemîdaned kî lewhê sîne’em çon rengireng  
Der meqamê mîr û şah im şahidê min şahê şan (r. 130)

Digel vê zimanê têkel, helbestvan, carinan di hin beytên xwe de peyvîn kurdî yên balkêş jî bi kar tîne ku ji bo zimanê edebî yê îro jî mînakêñ serkeftî ne û hêjayî wê yekê ne ku bêñ zindîkirin. Bo nimûne “hesûdê çavneyar”, “hebîba sirrveşar” û “purkar û hunervan” ji van peyvan in.

Muhbeta ‘ışqa hebîb e, dil revandî kir nehîb e  
Kor bîbit mel ‘un reqîb e, ew hesûdê çavneyar

Ew hesûdê purr le ‘în e, j’ ‘aşiqan ra her bikîn e  
Em ji yarê dûr kirîne, ka hebîba sirrveşar (r. 49)

Purkar û hunervan î, ger mestê ji Yezdan î  
Tesbîha ji kef danî, kar’im bi ci (hû hû) bûm (r. 100)

Di encamê de mirov dikare bibêje ku M. Nesîm Doru bi amadekarî û edîsyon-krîtika Dîwana ‘Irfanê berhemeyeke edebiyata klasîk kurdî gîhandiye xwînerên îro û bûye we-sîleya nasandina dîwaneke hêja ku di serdema modern de li ser ruh, naverok û ruxsara edebiyata kevin hatiye nivîsîn.

### Zülküf ERGÜN

Hindekarê Perwerdeyê, Zanîngehe Mardîn Artukluyê,  
Enstituya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê

Zülküf ERGÜN, *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*,  
Nûbihar, Stenbol, 2014.



198

Qebûleke giştî ye ku afirandin û çêbûna tiştan di nav têkiliyeke sedem û encamê de pêk tê. Yanî her tiş sedemeke wê heye ku çê dibe û encameke wê heye ku dirûv digire û dibe xwedî tesîr li gorî erka xwe. Li gorî vê qebûlê têkiliya bajar, dewlet û edebiyatê an jî li gorî rîzeke din dewlet, bajar û edebiyatê, dixin sedem û encamên hev. Her çiqas di serî de têkiliya bajar û dewletê şêlû be jî pişti avabûna bajardewletan dixuye ku sîstema dewletê li ser bajaran ava bûye û jî bo qaîmbûn û bihêzbûna xwe jî her ku çûye dewletê an jî bi gotineke din desthilatê bajar bi hêz kirine, mezin kirine û gihan-dine asta herî bilind ku jê şaristanî ava bûne. Di vê çarçoveyê de xebata bi navê "Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan" a ku ji teza lisansa bilind a mamosteyê Zanîngeha Artukluyê, Zülküf Ergün pêk hatiye, li ser têkiliya bajar, dewlet û edebiyatê xwîner derdixîne geryaneke kurdî, mîjûyî, efsûnî û edebî.

Ev xebat bi giştî ji destpêkek, çar beşan û encamekê pêk tê. Nivîskar di destpêkê de mîna her destpêkekê meram û meqsedâ xwe û rîbaza xebata

xwe û bi kurtî li dor pirsên çi, çawa û çimayê derbiriye. Di besa yekem de nivîskar li ser qonaxêن bajarvaniyê û derketina edebiyata nivîskî rawestaye ku ev beş bûye hîmê teorîk ê tezê. Di vê beşê de Ergün di sernivîsa yekem de avabûna bajaran an jî bajar-vaniyê, li ser çend qonaxan dabeş dike ku deqêñ di xebata xwe de di çarçoveya qonaxa bajarêñ islamî de dinirxîne ku sînorêñ vê qonaxê jî di navbera sedsala VIIan û XIXan de datîne. Ergün, rîbaza vegetina vê beşê bi awayekî encamgîrî(deduction) kiriye ku pişti qonaxêن bajarvaniyê di çend sernivîsê cuda de bi rîzê peywendiya bajar û dewletê, bajar û şaristaniyê, bajar û peydabûna nivîsê vekolaye. Li ser vê bingehê herî dawî behsa peydabûna edebiyata bajarî kiriye li welatê kurdan. Pêşî bi giştî dest bi vegetina mijarê kiriye û her ku çûye sînor teng kiriye û xwe gihandiye encama vê besa teorîk.

Rêbaza encamgîriyê ya ku nivîskar di nav sernivîsên beşan de şopandiye, di tevahiya xebatê de jî yanî di navbera beşan de jî vê rêtê şâş nebûye û di beşa duyem de ji welatê kurdan zêdetir, êdî xwe gihandiye babeta xwe ya spesifik ku ew jî li dor behsa bajar û dewletbûnê, Cizîra Botan û Mîrektiya Azîzan e. Di vê beşê de dîroka Cizîra Botan di sê qonaxên mêmûyî de hatiye berçavkirin. Qonaxa yekem Cizîra berî îslamê ye, ya duyem ji bi hatina îslamê heta Mîrektiya Azîzan behsa vê herêmê dike û di qonaxa sêyem de jî behsa dîroka mîrektiya Cizîra Botan dike. Ji ber ku ev xebat pêşî wek teza lîsansa bilind hatiye amadekirin, em dibînin ku nivîskar xwe ji hin aliyan ve sînordar kiriye. Em vê yekê di her du beşen ewil de bi rahetî dibînin. Lewra di beşa yekem de qala qonaxa bajarvaniya modern an jî pîşesaziyê kiriye, lêbelê nexwestiye ku Cizîra Botan li dor vê behsê binirxîne. Çimkî deq û şexsiyetên ku li ser rawestaye ew kes in ku di qonaxa bajarên îslamî de jiyan. Dîsa nivîskar di beşa yekem de di peywendiya bajar û peydabûna nivîsê û welatê kurdan de, her çiqas qala welat û deshilatê kurdan ên berê kiribe jî ji bilî mînaka Zembîlfiroşê, qala destxet û nivîsên berî hukumdariya Mîrektiya Azîzan nekiriye an jî nexwestiye bike ku em vê yekê jî wek xwesînorkirinê şîrove dîkin.

Beşa sêyem a vê xebatê, di bergeheke cuda de lêhûrbûn û vegotineke din a li ser Cizîra Botan e. Ji vî aliyê xwe ve ji bo bingehdanîna beşa çarem, beşa sêyem û ya duyem kompozîsyoneke hevpar ava dîkin. Çimkî ji bilî tarîxa avadanî û geşedana bajarekî, taybetmendiyêن bajarvaniyê û seqamgîriya siyasî ya wî bajarî jî di çarçoveya peywendiya bajar û edebiyatê de girîng in ku Ergün vê behsê di beşa sêyem de baş nîşan daye. Çimkî her çiqas ji aliyê xanî, seray, ayîngeh, sûr û kelehan ve bajarek dirûvê bajarbûnê bide jî ji aliyê aborî, bazirganî, avadanî, rêvebirî, rewşa civakî, pergala perwerdeyê û seqemgîriya siyasî ve jî divê xweserî û xwemaliyêن wî bajarî an jî desthilatê hebin. Nivîskar, beşa çarem ji bo kesayetiyêن serdema Mîrektiya Azîzan û analîza berhemên wan vejetandiye. Heya beşa çarem ji hêla teorîk ve ci gotibe, di beşa çarem bixwe de pratiqa vê teoriyê berçav kiriye. Di vê analîzê de berhemên du kesayetiyêن sereke; Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî bi qasî ku teza Ergün piştrast bikin, tije agahî û palpiş in. Her çiqas Xanî di bin desthilata Mîrektiya Azîzan de nejiyabe jî li gor peywendiya bajar û edebiyatê ji bo vê xebatê nimûneyeke serkeftî ye. Rast e, ku Cizîrî hem di bin hîmayeya vê desthilatê de û hem jî li bajarê wê jiyyate û berhemên xwe jî li gor wê rês-tine. Yanî helbestên Cizîrî, li gor peywendiya bajar-desthilat-edebiyatê nimûneyeke bêqusûr dixuye ku gelek mînakên wê di xebatê de hatine dayîn. Lê dema ku xwîner ji

xwe pirseke wiha bipirse ka çima nivîskar hewcedarî bi nirxandina berhemâ Xanî dîtiye? Ji sê aliyan ve bersiva vê mimkûn e. Yek jê, berhemâ xanî bi cûreyê mesnewiyê hatiye nivîsandin ku ev cûre ji bo sêwirandin edebî guncawtir e. Ya duyem jî di peywendiya bajar û dewletê de jî dikare bê nirxandin ku bi taybetî bajar û bajarvaniya Cizîrê di Mem û Zîna Xanî de wek senaryoya filmekê, bi kuçe kolanên xwe, bi merasîm û şahiyên xwe, bi lîstik û tevgera civata xwe ve belkî ji Mela jî baştîr hatibe berçavkirin. Qesta sêyem a nivîskar, belkî ya herî muhîm xwestiye ku nîşan bide Cizîr, wê gavê na-vendeke dahênanâ edebî ye ku ne tenê jî bo kesayetêni li Cizîrî ji bo hemû kesen li der-dora wê mîrektyîjî navenda cazîbeya afirînerîjî bû.

Di beşa çarem de behsa du kesayetê din hatiye kirin ku yek ji van Remezanê Cizîrî ye ku ew bixwe jî li Cizîrê di bin hukumdariya vê mîrektyîjî de jiyaye û berhemên xwe afirandine. Kesayetê din jî Feqiyê Teyran e ku ew jî li derveyî vê hukumdariyê bi rêya têkiliya bi Melayê Cizîrî re, di vê berhemê de cihê xwe girtiye. Lîbelê ev her du kesayet jî li gorî min di çarçoveya bajar-desthilat û edebiyatê de ku ev bingeha teorîk a xebata nivîskar e, zêde tesîrekê li xebatê nakin. Jixwe nîvîskarê vê berhemê zêdetir xwestiye ku tesîra Melayê Cizîrê ya li ser van kesayetan nîşan bide, ne ku teza xwe bi wan xurttir bike. Lê hêjayî pirsê ye ku mirov careke din bipirse gelo ev her du kesayet bi rastî jî hewce bûn bikevin nav xebatê? Çimkî heya mirov bi temamî berhemê nexwîne, mirov dibêje qey analîza berhemê van her du kesayetan jî li dor vê behsê bi heman awayî hatine kirin. Lê wisa dixuye ku ne wisa ne. Heke hewce kiriba ku ev kesayet jî cih bigirin, wê çaxê ne bi sernivîseke bi vî hawî, belkî ev kesayet di bin sernivîseke cudatir de bihatana nirxandin, dê mebest zelaltir bihata fêmkirin. Yanî ne di peywendiya bajar-dewlet û edebiyatê de, di peywendiya bajar-edebiyata serdest û tesîra wan a li ser kesayetê din de, nirxandina van herdu kesayetê navborî dê guncawtir bûya.

Ji aliyê ziman ve Ergün zimanekî rewan, sade û fêmbar bi kar anîye û ji ber zanîna xwe ya soranî, carinan ji vî zaravayî sôd wergirtiye û vê yekê jî tameke cuda daye zimanê berhemê. Ji ber rîbaza wî ya ku şopandiye, derî li pişt deriyan vedibin û xwîner diherike nav berhemê û pêl bi pêl digihije encamê. Xebata Ergün ji ber ku di eslê xwe de xebateke akademîk e, gelek jêgirtin û referans tê de cih digirin, lê şêwaza vegotin û bikaranîna van jêgirtinan zêde bel nîne û bi hevokên nivîskar re hemahengiyek çêkiriye ku ev jî xwendina berhemê hêsanter dike. Tenê kêmasiyeke biçûk heye ku ew jî hin şâşiyên rastnivîsê ne ku diyar e di mîzanpajê de xerab bûne ku ev yek jî dibe ku hişê hin xwîneran ji aliyê standardbûna rastnivîsê ve tevlihev bike.

Di bikaranîna çavkaniyan de eşkere ye ku heyâ ji nivîskar hatiye, xwestiye xwe bigihîne deryayeke fireh. Helbet ne mimkûn e haya kesekî ji her çavkaniyê hebe an jî bikaribe xwe bigihîne hemû çavkaniyan. Lê dîsa jî di vê xebatê de di hin sernivîsan de ji hin çavkaniyên sereke sûd wergirtiba dê baştir bûya. Mesela di vegotina mijara şaristaniyê de bikaribûya ji berhema sosyologê Îranî Elî Şerîfatî ya bi navê “Medeniyetler Tarihi I – II” sûd wergirtiba dê berhema xwe û vê mijarê dewlemendir kiriba. Lê bi giştî dîmeneke wiha naxuye helbet. Heta di hin deran de agahiyên ku di çavkaniyan de bera-wird kirine û bi saya vê berawirdkirin û tehlîlên xwe yên li ser wan, hin şâşiyên van çavkaniyan jî eşkere û rexne kirine ku ev yek xisûsiyeteke akademiya rexnegir e ku di berhema Ergün de dixuye. Bikaranîna çavkaniyên yekem an jî resen aliyekî din ê ser-keftî yê xebata nivîskar e.

Herî dawî mirov dikare bibêje ku di warê xwe de ev xebat, bûye paceyeke nû û herwiha mînakeke berçav ku bi vî şîklî li ser kesayetên cuda, di qonaxên cuda de, bi xwendinêñ cuda, berhemên din jî bikarin bêñ afirandin. Çawa ku nivîskar di xebata xwe de xwestiye tesîra erêñî ya bajaran û bajarvaniyê li ser nivîsê û dahêneriya edebî nîşan bide, berevajî vê tezê pîr pêkan e ku antîtezêñ vê mijarê, yanî tesîra neyînî ya bajaran û bajarvaniyê, di nivîsê û astengkirina dahêneriya edebî de bê nîşandan. Lewra li gorî fikra sereke ya vê xebatê, di bergeha erêñî de bajar û desthilat ji bo nivîsê, bûne motîvasyon. Lê wek di serdema bajarêñ modern de çawa ku nivîs û desthilat li dijî hev rabûne û nivîskaran xwestiye xwe ji sergêjiya bajaran dûr bixin û li derêñ tik û tenha geriyane ku di warê nivîsandinê de afîrinertir bin, dibe ku di serdemêñ berê yên bajar û desthilatan de jî ev pevçûn û dijayetyîn di navbera nivîs û desthilatê de bêñ dîtin û antîtezêñ vê xebata navborî jî bêñ kirin.

**Kenan SUBAŞI**

Lêkolîner, Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstituya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê

## **Yayım İlkeleri**

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü tarafından çıkarılan JMS (The Journal of Mesopotamian Studies), Kürt, Arap ve Süryani dili kültürü ve edebiyatları alanlarındaki bilimsel nitelikli çalışmalarla yer veren hakemli bir dergidir. Bahar ve Yaz sayıları olmak üzere yılda iki defa yayımlanır. Yayımlanacak yazınlarda bilimsel araştırma sonuçlarına uygunluk, alana bir yenilik getirme ve başka yerde yayımlanmamış olma şartı aranır. Bilimsel bir toplantıda sunulmuş bildiriler, yayımlanmamış olmak şartıyla kabul edilebilir.

### **Yazların Değerlendirilmesi**

- Dergimize gönderilen yazılar, öncelikli olarak yayın kurulunca dergi ilkelerine uygunluk açısından incelenir. İlkelere uygun bulunanlar, iki hakeme gönderilir. Yazalar, hakemlerin önerilerini dikkate alıp gerekli düzeltmeleri yaparlar; fakat katılmadıkları noktalara itiraz etme hakkına sahiptirler.
- Gönderilen telif makaleler, Editör Kurulu tarafından incelendikten sonra değerlendirilmek üzere “kör hakem” yöntemiyle konunun uzmanı iki hakeme gönderilir. İki hakemin görüş ayrılığı durumunda, üçüncü bir hakemin görüşüne başvurulur. Makale, en az iki hakemden olumlu rapor gelmesi halinde yayımlanır. Hakem raporları yazara gönderilerek karar bildirilir.
- Hakemlerden biri veya her ikisi, “düzeltmelerden sonra yayımlanabilir” görüşü belirtirse, gerekli düzeltmelerin yapılması için makale yazara gönderilir. Düzeltme yapıldıktan sonra hakemlerin uyarlarının dikkate alınıp alınmadığı hakem veya Editör Kurulu tarafından değerlendirilir. Ayrıca yazarların, hakemler tarafından belirtilen görüşlere itiraz etme hakkı bulunmaktadır. Yapılan itirazlar editör kurulu tarafından görüşülmüş uygun bir karar alınır.
- Yayımlanmasına karar verilen yazılar, sayfa düzenlemesi yapıldıktan sonra pdf formatında yazarlara gönderilir. Yazar son okumayı yapar ve gerekli düzeltmeleri metin üzerinde işaretleyerek dergiye geri gönderir.
- Yayımlanmayan yazılar iade edilmez ve yazılarındaki görüşlerin yasal sorumluluğu yazarlarına aittir.
- Yayımlanan yazılar için yazardan dergiye veya dergiden yazara herhangi bir ücret ödenmez.
- Yayın aşamasında yazılar üzerinde esasa yönelik olmayan küçük düzeltmeler Editör Kurulu tarafından yapılabilir.
- Yayımlanan yazıların yayım hakları MAÜ Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'ne devredilmiş sayılır. Bu devir, sanal ortamı da kapsar.

### **Yayım Dili**

- JMS'nin yayım dili Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanicidir. Ancak her sayıda, dergide yer alan çalışmaların en az yarısının Kürtçe ve onun çeşitli lehçelerinde yazılmış olması ilke olarak benimsenmiştir. Dergiye gönderilecek yazıların akademik dil kullanımıyla ilgili her türlü kusurdan arınmış olması gereklidir.

### **Yazım Kuralları ve Sayfa Düzeni**

- Yazılar A4 boyutunda kâğıda, MS Word veya uyumlu

programlarla yazılmalıdır. Yazı karakteri olarak Times New Roman kullanılmalıdır. Yazılar 12 punto ve 1.5 satır aralığıyla yazılmalı, sayfalar numaralandırılmalıdır. Makalelerin uzunluğu 5.000-6.000 sözcük arasında olmalıdır. Özel yazı karakterleri kullanılmamalı, transkripsiyon işaretleri varsa bununla ilgili dokumanlar ullaştırılmalıdır.

- Yazının adı, soyadı, unvanı, görev yaptığı kurum ve e-posta adresi mutlaka belirtilmelidir.
- Makalenin başlığı içerikle uyumlu olup koyu harflerle yazılmalı ve 15 sözcüğü geçmemelidir.
- Makalenin başında, en fazla 200 ila 250 sözcükten oluşan bir özeti yer almmalıdır. Özeti, hem makalenin orijinal dilinde hem de İngilizce olarak yazılmalıdır. İngilizce özeti kısmında makalenin ismine de yer verilmelidir. Özetlerin altında genelde özele doğru sıralanmış 5 ila 8 sözcükten oluşan anahtar sözcükler bulunmalıdır.
- Başlıklar koyu harflerle yazılmalıdır. Uzun yazınlarda ara başlıkların kullanılması okuyucu açısından yararlıdır. Ana başlıkların, 1., 2., ara başlıkların, 1.1., 1.2., 2.1., 2.2 şeklinde numaralandırılması tavsiye edilir. Ana ve ara başlıkların tümü (ana bölümler, kaynaklar ve ekler) koyu harflerle yazılmalıdır.
- Metin içindeki vurgulanması gereken ifadeler, “tırnak içinde” gösterilir, eğik veya koyu karakter kullanılmaz. Hem “tırnak içinde” hem eğik veya hem koyu hem eğik yazmak gibi çifle vurgulama yapılmaz.
- Bölüm ve paragraf başlarında girinti uygulanmaz.
- Yazınlarda kullanılan çizim, grafik, resim ve benzeri malzemeler JPEG ya da GIF formatında olmalıdır. Görsel malzeme ve ekler gerektiğiinde e-posta yoluyla ayrıca ullaştırılmalıdır.

### **Kaynak Gösterimi**

- Dipnot ve kaynakların yazımı konusunda, yöntem bakımından kendi içinde tutarlılık şarttır. Uzun yapıt (kitap, dergi, gazete vb.) adları eğik, kısa yapıt (makale, öykü, şiir vb.) adları ise “tırnak içinde” yazılır. Ayrıca dipnotların yalnızca metne alınamayan ek bilgiler için kullanılması önerilir.
- Bir yapıtin derleyeni, çevireni, yayına hazırlayıcı, editörü varsa künnyede mutlaka gösterilmelidir.
- Elektronik ortamda metinlerin kaynak olarak gösterilmesinde, yazarı, başlığı ve yayım tarihi belirtilmiş olanlar kullanılır. Ayrıca künnye bilgilerinde parantez içinde erişim tarihi belirtilmelidir.
- Ulaşılabılır kaynaklarda ikincil kaynak kullanımından kaçınılmalıdır.
- Atıf yapılmayan çalışmalara Kaynaklar kısmında kesinlikle yer verilmemelidir.
- Kaynaklar metnin sonunda, yazarların soyadına göre alfabetik olarak yazılmalıdır. Eserlerin yayınevleri açık şekilde ve makalelerin bulunduğu sayfa aralıkları belirtilmelidir.
- Alıntı yapma ve kaynak göstermede Apa ve Klasik Dipnot yöntemlerinin ikisi de kabul edilmektedir.

## Publication Principles

The Journal of Mesopotamia Studies (JMS) is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The JMS is a peer-reviewed journal which gives places to scientific researches on Kurdish, Arabic and Syriac culture, language and literature. It is published semi-annually (Spring and Summer Issues). The articles to be published should bear criteria of scientific researches, be innovative, and also should not be published anywhere else before. If an article has been presented in a scientific meeting, it will be accepted on the condition that it has not been published anywhere before.

### The Evaluation of Articles

- Articles submitted for publication are firstly examined by editorial board in accordance with the publication principles of the journal. The endorsed ones are sent to two reviewers. The authors corrected the article according to the notes by reviewers; however they have right to object to the points where they do not agree with.
- Articles submitted for publication are sent to two experts of the field via method of “blind review” after they examined by Editorial Board. In the case of split in opinion of these two reviewers, the article is sent to another reviewer. The article is published if at least two reviewers express positive opinion. The reports by reviewers are sent to the authors to pronounce the evaluation result.
- If one or both reviewers express “it could be published after certain revisions”, the article is sent to the author for the required revisions. After revisions are done, they are checked by reviewers or the Editorial Board to evaluate whether they are done in accordance with the remarks. Besides, the authors have right to object to the reviewers’ opinions. The objections are evaluated and resulted by the editorial board.
- The articles that decided to be published are sent to the author in PDF formatted after page adjustment. The author makes the last reading and shows necessary revisions on the text and sends it back.
- The unpublished articles are not returned back to the rightful owner, furthermore the authors are responsible for the opinions of the articles.
- The journal does not demand any fees to publish their articles, and likewise does not pay any fees for publishing articles.
- The Editorial Board may make small adjustments those are not on the main stage.
- It is accepted that the copyright of the published articles are transferred to The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. This transfer includes virtual platforms.

### Language(s) of Publication

- The JMS gives places to articles in Turkish, Kurdish, Arabic, English and Syriac. However, it accepts as a principle that at least half of the studies in the journal should be in Kurdish and its various dialects. The articles sent to the journal must be free from all kinds of defects related to the use of academic language.

### Writing Rules and Page Layout

- The articles must be written on MS Word or compatible

programs. Times New Roman should be used as typeface. The articles should be written in 12 font size in 1.5 ink line spacing and the pages should bear numbers. The articles should be as long as 5.000-8.000 words. The custom typefaces should not be used and if there are transcription signs, their documents should be sent with the article.

- The name, surname, title, place of work and e-mail address must be stated.
- The title of the article must be in accordance with the content and written in bold face, and also must not be longer than 15 words.
- There must be a summary of 200 or 250 words at the start of the article. The summary must be written both in the original language of the article and in English. The title of the article must be stated before the summary as well. There must be key words that are ranked from general to specific at the bottom of the summary.
- The title must be written in bold face. There should be intermediate titles in the long articles. It is recommended that the main titles numbered as 1., 2., and intermediate titles as 1.1, 1.2., 2.1., 2.2. All the main and intermediate titles (main sections, sources and appendices) should be written in bold face.
- Expressions that should be highlighted in the text, must be «in quotes», bold or italic faces must not be used. There must not be double highlighting as «in quotes» and bold or italic.
- There must not be initials at the start of section and paragraphs.
- Illustrations, graphics, images and other materials used in text must be in JPEG or GIF format. Visual material and attachments must be delivered also via e-mail if required.

### References

- Methodological consistency is essential for writing the footnotes and sources. Names of long works (books, magazines, newspapers etc.) should be written in italic face, names of short works (articles, stories, poems and so on) «in quotes». Also, it is recommended that to use footnotes only for the additional information that cannot be given in the text.
- The compiler, translator, preparer for publication, editor must be shown in the tag if exist.
- In case of citation of the text of electronic media, the name of author, title and date of publication which are specified are used. The date of access should also be noted in parentheses in catalog information.
- The secondary sources should be avoided if the primary resources are available.
- The works those have not been cited must not be shown in the sources.
- The sources should be given at the end of the text in alphabetical order. The publishing houses should be given clearly and the page ranges of the articles should be stated.
- Both APA and Classic Footnote Citation are accepted for citation and references.

